PEYAMA kurd

Hejmar 61 | 04.11.2005

Kurdish weekly newspaper

Li Almanya merasîma çilrojiya wefatkirina hunermend Merziye Ferîqî



Rûpel 6

Wê Mêrg û Çîmen careke din Kurdistan Tv bixemilîne



Rûpel 9

Bahram Qûbadî yew fîlma newe ûnceno



Rûpel 16

DEM-KURD Kongre xwe ya duwemîn pêk anî



Rûpel 10

200 çêtirîn zanîngeh Rûpel 2

Şabanî ji keran xelas dibin Rûpel 3

Zarokan pêl mayinê kir: 1 mir, 2 birîndar in Rûpel 3

Tirk ji Gena xwe ketin şikê Rûpel 6

Biryarên civîna duyemîn ya nûnerên PDK-Bakur û PSKê Rûpel 9

DEM-KURD Kongre xwe ya duwemîn pêk anî Rûpel 10

Dêra Surp Giragos li hemberî dîrokê liberxwe dide Rûpel 12

Bîranînek ji Ermenistanê -5- Rûpel 14

Silêmaniye de festîvala yewin ê peşmergeyan viraziyay Rûpel 15

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 61

Brîtanya jî statuya Kurdistanê nas kir



Rûpel 4-5

www.archivekurd.org

Şêxekî Suûdî fetvaya fûtbolê jî da



PK - Li gora nûçeya kovara Almanî Focus Şêx Evdila El Najîrî, qaîdeyên FIFA yên fûtbolê wek ku li dijî îslamê ne nirxandin û got: "Tifî fûtbolîstên ku hevdu himbêz dikin bikin". Najîrî fetvayek ji 15 xalan pêk tê eşkere kir û ji mîsilmanan daxwaz kir ku guh nedin qaîdeyên kafiran. Qaîdeyên ku Şêx Najîrî ji nûve afirandine wiha ne:

Xeta seheyê û hakim nîne.

Qertên sor û zer tunene.

Ne forma, lê cilên xwe yên sivîl an pîjama li xwe bikin.

Tifî rûyê fûtbolîstên ku piştî ku gol avêtinê hevdu himbêz dikin bikin.

Fûtbolê tenê jibo ku xizmeta Xwedê bikin bileyizin.

Bedena xwe jibo cîhadê amade bike.

Fûtbol ne leyztikek jibo derbaskirina wextê û kêfê ye.

Li gora Focusê fetvaya Şêx Najîrî li Suûdî piştgiriyeke mezin dibîne.

Temenê zarokên yekem dirêjtire

PK - Li gora zanyarên Amerîkî temenê zarokên yekem ji yên dû xwe tên dirêjtire. Jiber ku qelîteya spermên bav û hêkên dayikan herku diçe kêm dibe, genên zarokên yekem her çêtire. Qeliteya genan jî bandorê liser genan dikin û temenê mirov dirêj an kurttir dikin. Her wiha şansa zarokên yekem jibo ku heta 100 salan bijî, ji yên din du-sê caran bêtire.

Temenê zarokên ku di meha Çiriya Paşîn û Çileya Pêşîn de ji dayik dibin dirêjtire.

Hejmera nû ya BÎRNEBÛNê derket



28em hejmara Kovara hunerî, çandî û lêkolînê ya Kurdên Anatoliya Navîn BÎRNEBÛN derket. Di vê hejmarê de Bîrnebûnê ci daye cûrbecûr nivîsar û hevpeyvînên balkêş ku yek ji hevpeyvînan ya bi Ismail Beşikçi re ye.

200 çêtirîn zanîngeh

Rojnameya Brîtaniya Times di 2005an de lîsteyek liser çêtirîn 200 zanîngehên dinyê weşand. Di lîsteya ku Zanîngeha Harvard di serê rêzê de ye 54 zanîngehên Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYE) jî cî stendin.

Lîste bi alîkarî û piştgiriya 200 akademîsyenan hatiye amadekirin. Di lîsteya çêtirîn 200 zanîngehên dinyê de 31 welatan ji xwe re cî dît. Amerîka bi 54, Brîtaniya bi 24 û Avûstralya bi 17 zanîngehan li dû hevdu birêz bûn.

Çêtirîn 15 zanîngehên dinyê, Zanîngeha Harvard (DYA), Enstîtuya Teknolojî ya Massachusetts (DYA), Zanîngeha Cambridge (Brîtaniya), Zanîngeha Oxford (Brîtaniya), Zanîngeha Stanford (DYA), Zanîngeha California ya Berkeley (DYA), Zanîngeha Yale (DYA), Enstîtuya Teknolojî ya California (DYA), Zanîngeha Princeton (DYA), Ecole Polytechnique (Fransa), Zanîngeha Duke (DYA), London School of Economics (Brîtaniya), Imperial College London (Brîtaniya), Zanîngeha Cornell (DYA), Zanîngeha Pekîn (Çîn)



Li Ewrûpa bêtirîn bajarê biha: London



PK - Li gora rapora Banqeya Alman Dresdner Kleinwort Wasserstein li Ewrûpa bêtirîn bajarê biha London e. Londonê bi dorê Parîs, Frankfûrt û Bruksel dişopînin. Bêtirîn bajarê erzan jî Madrid e.

Ev lêkolîn li diwanzdeh welatên (Îrlanda, Portekîz, Îspanya, Fransa, Luksemburg, Holanda, Belçîka, Almanya, Fînlandiya, Yewnanistan, Avûstûrya û Îtalya) ku Euro bi kar tînin hat kirin.

Gava welatên ku derbasî Euro nebûnin beşdarî vê lîsteyê bibe paytextê Polonya Varşova şûna Madridê digire.

Ji aliyê din ve li gora lêkolînek ku di meha Hezîranê de li dinyê jî bihatirîn bajar, du bajarên Japonyayê Tokyo û Osaka ne.

Claudia Schiffer bedewiya xwe çawa diparêze?

Gotûbêj li ser serdestiya wê ya li cîhana modayê nabe. Ew li ber destê dîzaynerê navdar yê Alman Karl Lagerfeld mezin bûye. Ji aliyê wî ve hatiye keşifkirin û gav bi gav ber bi melîkiya modayê ve hatiye birin. Karl Lagerfeld rûdên û bedena Claudia baş nasdikir û dizanîbû bi çi awahî derxîne pêş. Ew niha yek ji modêlên herî navdar, herî dewlemend û herî bedew e.

Claudia Schiffer di sala 1970î de li Almanya bajarê Dusseldorf hatiye dinyayê. Ew li gel derhênerê Brîtanî Matthew Vaughn zewicî ye û dayika du zaroka ye.

Bêguman, bedewî ne heta bi heta misoger e. Ji ber vê yekê pêwîste ew herdem bi temamê derfetan were parastin û temenê wê were dirêjkirin.

Claudia Schiffer jî ji bo parastin û dirêjkirina temenê bedewiya xwe bi demê re dikeve nava pêşwaziyê.

- **Ji bo porên xwe :** Parastina por, yek ji karên herî zor e, bi taybetî jî porê wan kesên ku herdemê liber çav in. Ji bo vê yekê, Claudia her heftî serê porê xwe dibire û zindîbûnê didiyê. Ji bo xwedîkirina por jî ew dest davêje krêmên ku nerm dikin û hêza por zêde dikin. Dema ku ew diçe avjeniyê jî, nahêle ku porê wê ji klora hawizan ziyanê bibîne.
- **Ji bo ziraviya bedena xwe :** Pêwîste ew ji bo karê xwe gelekî guh bide ziraviya bedena xwe û giraniya xwe. Lê ew li hemberî piskewît û kekan xwe nagre û hinek caran destûra ceribandina çendekan dide xwe.
- **Ji bo çermê xwe :** Ew ji zarotiya xwe ve, guh dide çermê rûdêna xwe, nerm dike û her roj pak dike. Tê gotin ku wê ev adet ji diya xwe wergirtiye.
- **Parastina ji tavê :** Ev modêla Alman, xwe bi awayekî nedîtî ji rojê diparêze. Ew her wiha destên xwe jî bi capsûlên Vîtamîn E ji tîrêjên rojê diparêze.
- **Bedewiya hundirîn :** Ew qîmetekî mezin dide bedewiya hundirîn. Ji ber vê yekê, ew xwe di hundirê xwe de rehet dike. Ev yek ji sirên serkeftina wê ye.
- **Ji bo modayê :** Ew yek ji heyranên Chanel e. Ji tiştên zêde û beloq hez nake. Hinek caran bi kirasekî şevê û botan derdikeve, hinek caran jî bi blûzekî xetxetî û etekekî pitpitkî. Solên ku ew herî zêde bikartîne bot in, ji ber ku ew hestiyên gwîzeka wê yên derketî, vedişêrin.



Xwedî û Damezrênên Rojnamevanî Bayram Ayaz, Veysî Ese, Peyama Kurd Verlag

Redaksiyon: Fadil Özçelik, Hêvîdar Zana, Loqman Berzenci, Mansûr Sidqî, Mistafa Cwartayî, Nizar Caf, Seydxan Kurd, Silêmane Aldxan, Pîrkemal, Rezan Diyar, Vînûs Fayiq

Navnîşan: Peyama Kurd Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn/D Germany

Fon: +49 (0228) 18 00 654 +49 (0228) 18 00 655

Faks: +49 (0228) 18 00 656

www.peyama-kurd.com info@peyama-kurd.com

Têbînî: Peyama Kurd xwe mafdar dibîne, ku nivîsên jê re ten şandin, kurt bike. Ew ji aliyê rêziman û rastnivîsînê de di serrastkirinê berheman de azad e. Berhemên ku ji bo Peyama Kurdî tên şandin heke li cîyekî din hatibin weşandin, nayên çapkirin.

Şabanî ji keran xelas dibin



PK - Gundiyên gundê Şabanê yên ku ev 40 sal in ava xwe li ser pişta keran dikşînin, bi xêra Yekîtiya Ewrûpa ji vê zilmê xelas dibin. Gundiyên gundê Şabanê ava xwe ji kaniyeke ku 2 kîlometroyan dûrî gunde dikşînin.

Gundê Şabanê ji 250 malbat û 1500 kesî pêk tê. Ji ber nebûna avê, li temamiya gund zêdetirî hezar kerî hene. Piştî ku nûçeya pirbûna kerên gund di çapemeniyê de belav bû, rayedaran dest bi lêgerîna çareseriyê kirin û amûrên anîna avê kişandin gundê Şabanê.

Ev 40 sal in ku gundî ava xwe li ser pişta keran dikşînin. Li her malê bi kêmanî 3 ker hene. Zarokên gund li xebata anîna avê temaşe dikin û pê kêfxweş dibin, ji ber ku wan di temamiya temenê xwe de bi tenê dîtine ku av li ser pişta keran tê malê.

Muxtarê gund Mulazim Yurtapan, berî salekê deng li Erdogan kiribû û gotibû, "hûnê bi vî halî çawa biçin Yekîtiya Ewrûpa, ji xwe re li rewşa xelkê binerin, pirsgirêkên wan çareser bikin û piştre biçin".

Pirsgirêka gundiyan hat çareserkirin, lê ew êdî nizanin çi karî bi kerên xwe bikin.

Ruhayî roj bi roj zêde dibin



PK - Rayedarên dewleta Tirk li beramberî zêdebûna Ruhayiyan heyirîne. Ji bo ku rê li ber zêdebûna Kurdan bigrin, wan heta niha li Kurdistanê bi sedan kampanya vekirin, derziyên xerab li xelkê xistin, malzaroka gelek jinan girêdan, lê Kurd dîsa jî wek axê zêde dibin. Ruhayî serkêşiya zêdebûnê dikin. Li gora rapirsiyeke ku ji aliyê hinek saziyên dewletê ve hatiye kirin, di meha Îlonê de li Ruhayê 455 kesan jiyana xwe ji dest daye, 6650 zarok hatine dinyayê, 531 kes zewicîne û 54 kesan jî hev berdane.

Li gora rapirsiyê, zêdebûna herî mezin li navenda bajar çêbûye. Li bajar bixwe di nava mehekê de 2228 zarok hatine dinyayê. Li Sîweregê 955, li Wêranşahrê 885, li Sirûcê 716, li Akçakalê 390, li Bîrecûkê 335, li Bozovayê 321, li Ceylanpînarê244, li Xelfetî 217, li Herranê 192 û li Hilwanê jî 167 zarok hatine dinyayê.

Lê rayedarên dewletê zarokên ku çêdibin û nayên qeydkirin jibîr dikin. Heger ew jî bên hejmartin wê dewleta Tirk temamê doktorên xwe têxe seferberlikê û Kurdistaniyan ziwa bike.

Zarokan pêl mayinê kir: 1 mir, 2 birîndar in



PK - Zarokên gundê Esendere yê girêdayî Geverê, nêzîkî sînorê Îranê pêl mayinê kirin. Di encama teqînê de Ozkan Onal jiyana xwe ji dest da û Kerem Tosun û Serhan Onal jî birîndar bûn.

Leşkerên Îranî berî Tirkan gihan cihê bûyerê û Kerem Tosun ji ber giraniya birîna wî rakirin nexweşxaneyeke Îranî. Tê gotin ku Serhan Onal di bûyerê de bi sivikî birîndar bûye û ji tirsa reviyaye aliyê Îranê.

Berdana xwe xwest, mêrê wê ew xist vî halî



PK - Li Kagizmana girêdayî Qersê, Bilgi Kuruçam (31) ku dayika 3 zaroka ye, bi mêrê xwe re pev çû û berdana xwe xwest. Li ser gotina berdanê, mêrê wê Cengîz Kuruçam xwe wenda kir û xanima xwe derxist meydana taxê.

Cengîz Kuruçam li meydana taxê, xanima xwe bi lêdanê ji taqet xist. Dev û diran û serê Bilgi bi gelek ciyan ji aliyê mêrê wê ve hatin şikandin. Li gora şahidên bûyerê, Cengîz bi dengekî bilind bi ser xanima xwe hil bûye û gotiye, "berdan di adetên me de tune ye".

Tê gotin ku Cengîz Kuruçam piştî lêdanê wenda bûye û nas û dostan, xanima wî rakirine nexweşxaneya Erzeromê. Bilgî Kuruçam hîna jî dibin bandora bûyerê de ye û ji tirsa mirinê, dawe li mêrê xwe venekiriye.



Panorama

Dilbixwîn Dara

Vê penaberiyê xweşî di tiştekî de nehiştiye

Li ku ne cejnên zaroktiya min? Ew roj bûye wêneyek û di vê cejnê de hatiye ber çavên min.

Naxwazim bînim bîra xwe wan rojan... bila kor bibim û careke din piştî 15 salên li penaberiyê rojên zaroktiya xwe di şefaqên cejnan de nebînim.

Dixwazim îro her tiştî ji bir bikim, navê xwe jî ji bir bikim. Bila kor bibin hizr û bîra min di vê roja cejnê de... naxwazim ji wan rojan tiştek were bîra min, ne zaroktiya min, ne ew şekirên ku di wan rojan de me berîkên xwe pê tijî dikirin... ne jî dengê "Allah Û Ekeber"a mizgeftan, çiqas xweş bû ew deng, dema ku minareyên mizgeftên bajêr dengê tekbîran li hev vedigerandin.

Weke doh be'ew bûyer, nikarim ji bir bikim. Hîna ew solên ku bavê min ji min re bi xwe re ji Helebê anîbûn li ber çavên min in. Ew pantolonê ku li cem terzî Hecî Hesen dirûtibû, patolonekî reş bû, xetên spî têde bûn, derlingê wî pantolonî belkî 30 santîm hebû, wê demê ferehbûna derlingan weke îro moda bû, pantolonê derlingê wî ne fereh ba nedihate li xwekirin, di heman rengî de Hecî Hesen çakêtek jî ji min re dirût, pêşiyê li min fereh hat, bavê min bi îsrar xwest bi min bide qebûlkirin ku li gora qiyasa min e, lê belê ez kelogirî bûm û min qebûl nekir. Ew cara yekemîn bû ku min di wî temenê biçûk de taximek li xwe dikir.

Heya serê şefaqa cejnê kesekî xwe nêzîkî wan kincan nedikir. Em bêsebir li benda wê rojê diman. "Ka wê kengî tav bavêje der, top lê bidin, dengê tekbîrên minareyan were û em jî rabin wan kincên ku me ji rojên cejnê re hiştibûn li xwe kin..?" Hinek caran jî dema derfet peyda nebana, me kincên cejna Remezanê di cejna Qurbanê de jî li xwe dikirin.

Serê sibehê zû em ji xew radibûn, xew dibêjim, lê heya şefaqê çavên me vekirî li benda hilatina rojê diman, weke masiyan me xwe ji nava nivînan davête der.

Berî her tiştî me xwe davête kartonê sol têde bûn. "Hêdî lawo hêdî... narevin... ne solan, destpêkê pantolon li xwe ke..." diya min dibeşişî û digot.

Me destê diya xwe radimûsand, wê eniya me, me cejna hev pîroz dikir. "Îda te bumbarek e..." , "tu jî pir îdan bibînî" diya me ya dilovan ji paşila xwe xerciyek

derdixist û dida me. Em li benda bavê xwe diman, ew li mizgeftê bû, li ser nimêja cejnê bû.

Dema ku dihat, em şermokî li ber deriyê hewşê diçûn pêşwaziya wî. Me dest radimûsandin, wî jî rûyê me, destê xwe dixiste berîka xwe û em xelat dikirin.

Me zarokên taxê, bi hev re berê xwe dida bajêr. Em diçûne sînemayê. Li bajarê me yek sînema hebû. Ji serê sibê heya êvarê rêzefîlm dihatine pêşkêşkirin, em ji sînemê dernediketin, piştre me berê xwe dida sûkê û me dikir nedikir pereyên me xelas nedibûn. Em diçûn kîjan malê me destê mezinan radimûsandin wan jî em bi peran xelat dikirin.

Me bi kêf her sê rojên cejnê derbas dikirin.

Îro cejn e, şahî ye, kêf e, dawîya meha Remezanê ye. Lê ka xweşiya cejna zaroktiya min?! Vê penaberiyê xweşî di tiştekî de nehiştiye.

Brîtanya jî statuya Kurdistanê nas kir



Serokê Kurdistana Federe Meşûd Barzanî piştî serlêdana xwe ya Qesra Spî di 31ê mehê de bû mêvanê Serokwezîrê Brîtaniyayê Tony Blair.

Piştî civînekê di navbera herdu aliyan de Blair û Barzanî derketin pêşberî çapemeniyê. Blair di axaftina xwe de bixêrhatina Serok Barzanî kir û got: "Paşnîvroya we hemûyan xweş. Ez bixêrhatineke germ li Serok Barzanî dikim. Birêz, em li vê derê bi dîtina we gelekî kêfxweş in. Jibo her tiştê ku hûn niha li Iraqê dikin spas. Piştî serketina referandûma destûrê, gava pêşiyê di meha Çileya Pêşîn de biserxistina hilbijartinan e. Em hêvî dikin ku serkeftî be û encama wê Iraqek rûniştî û demokratîk be. Gelek spas jibo te û hemû hevalên te yên ku di vê prosesê de roleke girîng dilîzin".

Blair di axaftina xwe de eşkere kir ku şîddet wan li Iraqê digire û jibo piştgiriya pêvajoya siyasî ew li Iraqê ne.

Blair, xemginiya xwe jibo kuştina mirovên sivîl bilêvkir û got: "Grûbên ku xwe fedayî terorê kirine û bi zanabûn êrîşî sivîlan dikin sebebê kuştina wan in. Ger şîddet û teror bi dawî bê, hêza navnetewî (hevpeyman) wê sibê Iraqê terk bike."

Piştî Blair, Serok Barzanî axaftinek bi Kurdî kir û got: "Gelek spas Birêz Serokwezîr. Bi destûra we ez dixwazim spasî û minetdariya xwe jibo vê pêşwaziya germ bikim. Her wiha ez dixwazim jibo wê rola we ya şexsî û bi cesaret, jibo wê mêrxasiya alîkarî û rizgarkirina Iraqê spasî û minetdariya gelê Kurdistanê û ya piraniya gelê Iraqê pêşkêş bikim.

Ez dixwazim spasî û xemgîniya xwe, daxwazên xwe yên sersaxiyê pêşkêşî wan malbatên leşkerên Brîtanî bikim ewên ku jiyana xwe jibo jiyan û azadiya milletekî din, feda kirin.

Birêz Serokwezîr, bi piştgirî û alîkariya we, bi ya DYAyê û bi ya hevpeymanên din me li Iraqê dest bi qonaxek demokrasiyê kiriye.

Em bi terorîstên ku bi hemi helwesta xwe naxwazin ev qonax biserkeve, rûbirû ne. Dibe ku li vê derê, li DYAyê û li welatê me hin deng hebin ku li dijî şer bin, bes ev, bila me nexapîne. Heke di danûstendinek şer de zeîfiyek bê nîşandan wê şer bê ber derencekên deriyên me.

Birêz, min divê te pişterast bikim ku jibo encamên hilbijartinan serkeftî bin û hikûmeta ku piştî hilbijartinan bê danîn temsîlkariya hemi gelê Iraqê bike, li Kurdistanê çi ji destê me bê emê bikin. Emê her tiştî bikin ku prosesa demokrasiyê biserkeve, destûra ku piştî referandûma 15ê Çiriya Pêşîn qebûlbûyî bicîh bibe û bibe bingehê bihevrejiyana hemi gelên Iraqî.

Careke din ez spas dikim û minetdariya xwe pêşkêş dikim."

Piştî ku Barzanî axaftina xwe bi dawî anî Tony Blair spasiya xwe anî zimên.

Barzanî: Di hemû pirsgirêkan de em wek hevdu difikirin

Bi berdewamiya civîna çapameniyê Tony Blair û Mesûd Barzanî pirsên rojnamevanan bersîvandin.

Ji bo pirsa, "Tiştên herî girîng yên di navbera Barzanî û Blair de hatin gotûbêjkirin çi bûn" berê Barzanî bersîv da û got: "Bêguman me rewşa niha ya Iraqê û gavên pêşerojê gotûbêj kirin. Me hevkariya xwe di bicîhkirina gavên hundirîn de diyar kir û di hemû pirsgirêkan de em wek hevdu difikirin."

Tony Blair ev pirs wiha bersîvand: "Tiştê balkêş li Kurdistanê ewe, jiber ku firsend çêbû ku gel li wê derê di nava aştiyê de bijî û kar bike, herêm gelekî xurttir e. Ji aliyê aborî ve xurttir e, ji aliyê standardên jiyana civakî ve xurttir e. Tiştê ku li wir tê xuyakirin, ger ku teror bê rawestandin û demokrasî bê avakirin wê gelê Iraqê bi xwe jî wiha bijî. Ev ne bi tenê jibo azadiya gelê Iraqê bingeh û têkoşînek girînge, lê li herderê jibo şerê li dijî terorîzmê jibo azadiya hemû gelan e. Ew li Iraqê mirovên bêguneh dikujin, li Hindistanê jî, li Misirê jî, li vî welatî jî, li Ewrûpayê û dinyayê mirovên bêguneh dikujin. Jiber vê yekê pêwendiyên di navbera me de gelekî xurt in. Ev li himber terorîzmê rawestana demokrasiyê ye, li her quncikek dinyayê ku lê teror tê kirin amadebûna şerkirina li himberî terorîzmê ye."

Li Londonê hevdîtinên Barzanî

Serokê Kurdistana Federe Mesûd Barzanî bi şandeya ligel xwe, ku Serokê Hikûmeta Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Wezîrê Plankirinê yê Iraqê Berhem Salih jî di nav de ne, hin hevdîtên din jî kirin. Di ziyareta xwe ya jibo Serokwezîrê kevn yê Brîtaniyayê John Major de herdu aliyan liser rewşa Kurdistanê û Iraqê nîqaş kirin.

Her weha Serokê Kurdistanê Barzanî û şandeya ligel, serlêdana Parlamentoya Brîtanî kir û bi hin parlamenter, lord û komîteya piştgiriya mafê siyasî ya gelê Kurdistanê re civîya.

Serokê Kurdistanê li Wezareta Bergiriyê bi Wezîrê Bergirîiyê John Reid re jî hevdîtinek kir.

Barzanî: Dewletek serbixwe mafê gelê Kurd e

Berî hevdîtina xwe ya bi Tony Blair re Barzanî ligel Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî û Wezîrê Plankirina Iraqê Dr. Behram Salih di 30 mehê de li Londonê bi Kurdistaniyên ku li vî welatî dijîn re, civînek kir. Kurdên ku li Brîtaniya dijîn eleqeyek mezin nîşan dan. Di civînê de Barzanî liser ziyareta xwe ya Amerîkayê û hevdîtina bi Bush re beşdarvan agahdar kirin û îşaret kir ku di dîroka gelê Kurd de deriyekî nû vebûye.

Barzanî got: "Mafê suriştî yê gelê Kurd e û wek pêkhatiyek firehtir ê gelê Kurdistanê ye ku di çarçeweya dewleteke serbixwe de bijîn. Lê jibo wê divê gavên stratejîk bên avêtin û şert bên lihevanîn û gavên realîst bên avêtin."

Jiber ku em gera birêz Mesûd Barzanî wek gavek dîrokî dibînîn, me xwest di vê derbarê de nerînên siyasetmedar û rewşenbirên Kurd bigrin. Jibo wê jî me ji gelek kesan ev pirsiyara jêrin kir. Emê bersîvên wan di rojnamê de biweşînîn.

Gera birêz Mesûd Barzanî ya Amerîka û Brîtanyayê û ji aliyê George W.Bush û

Tony Blair ve wek "serok" pejirandina Barzanî, wê çi bandorê liser pirsgirêka Kurdistanê, statuya başûrê Kurdistanê, pêwendiyên Kurdistanê, dewletên cîran û rewşa Rojhelata navîn bike?



Abdulmelîk Firat (Serokê HAK-PAR)

Pirsgirêka Kurd êdî bûye pirsgirêka navnetewî

Ew gera birêz Mesûd Barzanî û qebûlkirina wî wek serok ji aliyê George Bush û Tony Blair, encama tekoşîna gelê Kurd a dûr û dirêj e. Ew tê vê manê ku dewletên hevpeyman, dewletên rojava êdî Dewleta Federasyona Kurdistan û seroktiya Mesûd Barzanî nas dikin. Vê dilê hemû Kurdên ku liser erdê dijin, bi taybetî Kurdên Kurdistana başûr, yên bakur, rojhelat, rojava, Qafqasê û yên Ewropa şad kir, kêfxweşî û hêviyek da hemû Kurdan.

Em wek partî jî û min wek şexs jî çend caran di daxuyaniyên xwe de aniye zimên ku pirsgirêka Kurd li Rojhelata navîn pirsgirêkek serekeye û îro bûye pirsgirekek navnetewî. Birayên me yên başûr pirsgirêkên xwe yên navxweyî çareser kirin û di encama vê yekîtiyê de birêz Celal Talebanî bû Serokomarê Iraqê, birêz Mesûd Barzanî jî bû Serokê Kurdistanê. Ew herdu jî bi hilbijartinê hatin ser hikum. Jiber wê jî bibe nebe dewletên cîran mecbûrin statuya wan nasbikin û êdî li hemberî wan termînolojiya xwe biguherin. Wek mînak rayedarên Tirk hêdî hêdî dest bi guherandina termînolojiya xwe dikin, êdî wek berê nikarin bêjin „ Serok eşîr"



İbrahîm Guçlu (Hiqûqnas-siyasetmedar)

Dewletên hevpeyman amadekariya Dewleta Kurd dikin

www.kurdistanarchive.org



Wek Serokdewlet pejirandina kek Mesûd Barzanî ji destûra Îraqê ya federal-demokratîk tê. Zagona bingehîn a Iraqê gelekî vekirî qebûlkiriye ku Kurdistan dewletek federal e. Piştî ku destûra Iraqê bi referandûmê ji aliyê gelê Kurd û gelên din yên Iraqê ve hat erêkirin, ji aliyê hiqûqa navnetewî ve statuya Kurdistanê jî hat diyarkirin.

Di prosesa demokratîzekirina Iraqê û pêkanîna projeya Rojhelata navîn ya mezin de, rola netewa Kurd, rola serokên Kurd û rola hêzên siyasî yên Kurd, rolek sereke ye. Li gorî dîtina min hevdîtina Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî, George Bush û Tony Blair, ji aliyê hiqûqa navnetewî ve naskirina netewa Kurd û Dewleta Kurdistan ya Federal e. Piraniya şirovekaran û ez ji berê de di wê nerînê de bûm ku partî, rêxistin û siyasetmedarên Ereban wek mentalîte ji aliyê psîkolojîk û civakî ve jibo sekularîzmê, jibo Iraqek demokratîk û federal ne amadene. Gava ew proje pêk neyê, wê gavê wê Dewleta Kurdistan a serbixwe bê damezirandin. Kurd ji avakirina dewletek serbixwe re amade ne, hêzên hevpeyman ji îro ve dewletên Rojhelata navîn û dinyayê ji aliyê psikolojîk ve jibo vê yekê amade dikin.

Qebûlkirina statuya Kurdistana başûr wê di dema nêzîk de li Îran û Suriyê û dema dûr de jî li Tirkiyê statuya Kurdan jî biguhere. Divê Kurd jî li gor wê xwe amade bikin.

Li Tirkiyê bêedebî û şovenîzma medya û siyasetmedarên Tirk gihîştiye ezmana. Me îro li Amedê çend kesan di vê derheqê de nerehetiya xwe nîşan da. Lê ji aliyê din ezbera rayedarên Tirk hatiye guherandin. Rayedarên Tirk hertim dixwazin ku Kurd nebin dewlet, Kurd di Rojhelata navîn de nebin xwediyê statuyekê. Lê ew gihîştine wê qeneatê ku êdî nikarin pêşî li vê prosesê bigrin.



Umît Firat (Edîtorê kovara Serbestî)

Dinya ne li gor daxwaza rayêdarên Tirkiye diguhere

Mesûd Barzanî seroke, divê wek serok bê binavkirin. Meşrûtiyeta Serokatiya Mesûd Barzanî ji hiqûqa hindurî ya Iraqê tê. Destûra Iraqê Dewleta Federal a Kurdistanê diperijîne û Mesûd Barzanî jî Serokê vê Dewleta Federal e. Di prosesa federalbûyîna Iraqê de rola Amerîka sereke ye. George Bush jî Serokê Amerîka ye, ji ber wê jî normale ku G.Bush bêje Serok Barzanî.

Gelê Iraqê bi referandûmekê Iraqek Federal-Demokratîk avakiriye. Rêxistin û dewletên navnetewî jî divê vê statuyê qebûl bikin. Alternatîva wê dîktatorîye, rejîmek girtî ye. Gava mirov bixwaze rejîmek vekirî û demokratîk avabike, divê mirov hacetên demokratîk ku hemi dinya bikartîne, bikarbîne. Îro rayedarên Iraqê jî wan hacetan bikartînîn.

Eger li Iraqê dewletek federal hebe, cîranên Iraqê jî mecbûrin wê dewletê qebûl bikin. Gava vê dewletê qebûl nekin, tê vê manê ku ew dewleta Iraqê nasnakin. Tirkiyê nikare ji dewletek cîranê xwe re an jî ne cîranê xwe re bêje ku; ez wek sembolîk serbajarê te nasdikim, lê herêmên din nasnakim. Tirkiyê îro dikare ji Almanya re bêje; ez te nasdikim, lê eyaleta Bayernê nasnakim? Iraq li gor hiqûqa xwe ya hindurî sîstemek federal ava kiriye, cîranê Iraqê jî mecbûrin vê rewşê qebûl bikin. Wek mînak gava li Rûsyayê şoreşa 17 Oktobere çêbû, dinyayê berê ev dewleta nû nasnekir, lê piştre mecmûr man ku nas bikin. Gava cîranên Iraqê dewleta Iraqê nas bikin, ew mecbûrin ku Mesûd Barzanî jî wek Serokê Kurdistana Federal nas bikin.

Ev guherandin ne li gor daxwaza Tirkiyê ye, ne li gor prosesek normal e. Lê şertên herêmê Tirkiyê mecbûr dikin. Masmedya Tirkiyê û rayedarên dewleta Tirk heta niha jibo birêz Barzanî û Talebanî „ Serokeşîr“ û ji Dewleta Kurd re jî „ Dewleta Eşîretan“ gotin. Dewleta Federal a Kurdistan ne dewletek eşîrî ye. Li eksê wê Dewleta Seddam dewletek eşîrtî bû. Tirkiye gazî serokeşîrên Ereban dike û wana dike mêvan. Çima temsîlkarên meşrû yên gelê Kurd qebûl nake? Ne Mesûd Barzanî ne ji Celal Talebanî ne serokeşîr in. Ew bi salane jibo azadiyê kar dikin, serokên partiyên modern in, ew karîzma xwe, pozîsyona xwe û meşrutiyeta xwe ji gelê Kurd digrin.

Dinya ne li gorî nerîn û daxwazên Tirkiyê, lê li gor zagonên xwe diguhere. Ew jî mecbûr in vê yekê qebûl bikin.



Keya Izol (Nivîskar)

Sefera Barzanî û Statuya Navnetewî a Başûrê Kurdistanê

Birêz Mesud Barzanî wek Serokê Herêma Kurdistanê ji alîyê Serokê DYA G. W. Bush û Serokwezîrê Îngilîstanê Tony Blair ve, bi awayekî resmî hat pêşwazî kirin, lê heke em bixwazin tesîra vê bûyerê bipîvin emê bibînin ku di heqîqetê de Mesud Barzanî li van welatan wek temsîlkarê hemî Kurdan (40 milyon Kurd) hat ezimandin.

Acizbûna rejîma Tirkiyê vê rastîyê baş dîyar dike.

Tirkiye berîya ku ev sefer pêk bê xwest bi rêya "dîplomasîyê" bandorê li şêweyê pêşwazîkirinê bike. Yanî bi gotinek din, wan hin daxwazên xwe gîhandine DYA ku Mesûd Barzanî bi sîfeta resmî neyê pêşwazî kirinê. Piştî ku hewldanên wan biserneketin wan yekser dest bi naqaratên xwe yên berê kirin.

Efendim, serokeşîrek çawa bi awayekî resmî ji alîyê DYA ve wek serok tê pêşwazî kirinê ? Berpirsê leşkeran Ozkok beyan da û got; "Bila zorê nedin sînorên xetên me yên sor!" Partîya nasyonalîst/şowen CHP ji hikûmetê pirsî; "Gelo Barzanî çawa dikare bi cilên pêşmerge biçe Qesra Spî ?" Weke ku Qesra Spî li Tirkiyê be û dewleta Tirkan Mesud Barzanî ezimandibe.

Şerpezebûyînek bi vî rengî jibo Tirkan rûreşîyek mezin û ji bo me cihê kêfxweşîyê ye.

Tirkiyê dizane ku heke Başûrê Kurdistanê wek îdareyek sîyasî bê naskirinê dê dor were Bakurê Kurdistanê jî. Derd û kulên wan ew e. Gelo ew dê çawa bikaribin li Tirkiyê pêşiya tevgera sîyasî ya Kurdan bigrin da ku rojekê ew jî doza statuyekî navnetewî nekin.

Bush û Blair bi pêşwazîkirinek wiha îşaret bi rastîyekê dîrokî kirin û mesajên xwe yên ku ji alîyê Kurdan ve gellek girîng bûn, gîhandin raya gîştîya cihanê. Bi bawerîya min, ev mesaj bi her awayî gihişt cihê xwe.

Ev sefer bi van alîyên xwe ve di dîroka têkoşîna Kurdan de rûpelekî zêrîn vedike û ji niha ve tesîrek mezin li hemû beşên Kurdistanê, li Rojhilata Navîn, li nav dewletên dagîrkeran û di qada navnetewî de kiriye.



Yılmaz Çamlıbel (Berpirsiyarê Dema-nû yê derveyî welêt)

Li Rojhilata navîn, kevir li ciyên xwe rûdinên.

Ji şerê Kendavê û vir de, rewşa Rojhilata Navîn, hêdî hêdî zelal dibe. Di vê rewşê de, giraniya Kurdan jî, hêdî hêdî derdikeve holê.

Dijminên Kurdan, wek Tirkîyê, Îran, Surîyê û hinek Kurdên nexêrxwaz û kêmaqil, bawer nedikirin ku, Kurd yê ji konjonktûrê ewqas îstifade bikin.

Du partîyên sereke hatin cem hev, yekitîyek netewî saz kirin. Berjewendiya milletê Kurd danîn pêşîya hertiştî. Her wiha, heq û hiqûqên hurnetewa, ol û mezheban, yê jinan, yê zarok û seqetan parastin. Li seranserê Kurdistanê sazûmanek pirrengî û pirdengî avakirin. Dimokratî, aştî, edlayî û hevdemiya milletê Kurd, raxistin ber çavên dinyayê.

Jiber van sedeman, dinyaya hevdem dît ku, li Rojhilata navîn Kurd aktorek sereke ye, him jî aktorek hevdem e. Bê Kurda, aştî, edlayî û demokratî nayê Rojhilata navîn.

Yasaya Esasî ya Îraqê, hat pejirandin. Li gor vê yasayê, êdî Birêz Mesûd Barzanî, bi fermî Serokê Herêma Kurdistanê ye. Divê di her hevdîtinan de jê re "Birêz Serok" bê gotinê.

Em qebûl bikin an nekin Emerîka û îngiliz axê dinyayê ne. Gotinên wan, li her hêlên dinyayê tên pejirandin. Êdî Birêz Barzanî here kîjan welatî, yê jê re bibêjin "Serok" kî çi dibêje bila beje, îtibara Kurdan, roj bi roj wê bilind bibe. Kurdên ku xwe piçûk dibînin, serberjêrin, êdî yê serê xwe bilind bikin. Tevgera milletê Kurd, yê roj bi roj hê pêşde here, xurt bibe.

www.rojhilat.org



biraveti

Bayram Ayaz

Tevgera Kurdistanê li Rojhilata navîn dibe aktoreka polîtîk sereke

Bi serdana Serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî li Amerika û Brîtanya di dîroka Kurdistanê de rûpeleke nû dest pê dike. Ev bûyer herwisa delîlê pêşketin û kamilbûna prosesa netewî ya gelê Kurd û Kurdistanê ye jî.

Ev serdan rastiyeka din jî derdixe holê. Ew jî ev e: Gel heta nebin xwedî dewlet û desthilatê nikarin bibin neteweyek gihayî, têkûz û pêşkevtî. Ziman, çand, ax û dîrok jibo nasnameya xelkek girîng in. Eger xelkek bikare li ser axa bav û kalan bijî û ziman û çanda xwe biparêze, wê demê wicûda wî gelî dimîne. Yanî di saya van faktoran de xelkek dikare hebûna xwe biparêze, yanî nasnameya xelkekî wenda nebe. Helbet eger ew gel bi destê hin diktatorên zalim û desthilatên nedemokrat tûşê jenosîdê û nefikirinê nebe.

Vêca halê me Kurdan diyare. Me şerê hebûn û tunebûnê daye û em hê jî didin. Bi saya berxwedana sedsalan û serhildanan ku li me zêde bi xwîn û malwêranî kelifîn, xelkê me li ser piya ma. Piştî ku gelê me îro gîhaye qonaxa damezirandina dewleta netewî, gelek pispor, zanyar û siyasetvanên navdar êdî vê rastiyê qebûl dikin, dibêjin Kurdan serê xwe danenî û bi xebata xwe gîhan vê encamê. Ev bîr û hizr delîlin ku destkevtiyên miletê me misoger in û me pêşerojeka bi ronahî heye.

Em vegerin ser pirsa dewlet û desthilatê. Di aliyê zanistî de û jî dîroka gelan îspat bûye ku gel bi dezgeha dewletê û bi hêz û îmkana desthilatiyê dikarin, civakekî modern û bi îstiqrar damezirînin. Dewlet û desthilatdariyek demokrat nebe, xelkekî nikare tevlê civata cîhanê bibe. De kerem bikin, gelê Kurd li Rojhilata navîn civakekî xwedî dîrokeke bi kêmasî şeş hezar salan e. Lê em endamê civaka cîhanê nînin. Hê jî hin Ereb û Faris û Tirkên tirtire ku pêş navên wan gotinên wek „profesor", „general", „wezîr" û „kizîr (!)" heye, ji me dipirsin: „Ka Kurdistan, ka li ser nexşeya cîhanê nîşanê me bidin!". Wê demê em wekî sêwiyên ber dîwaran ustîxwar dimînin! Jiber ku Kurdistan heye, lê liser nexşeya siyasî ya cîhanê nexuyaye. Çima ? Jiber ku em ne xwedî dewletek in.

Emê êdî ji vê sêwîtiyê û ustîxwariyê rizgar bibin. Hela carekî ji xwe bipirsin. Dema em wêneyên Kek Mesûd li kêleka Bush û Blair dibînin, ma em ji şanaziyê û keyfa kelegirî nabin! Ez bawerim, di çavên her Kurdekî dilsoz de dilopên hêstira gêrdibin. Yê min wisa ye. Jiber ku xewna me bi cîh hat! Em bûn xwedî dewlet û Serokê me dibe mêvanê Bush û Blair! Ev aliyê hestên me. Em bi van rûdanan dilxweş û serbilind in.

Ev aliyekî van rûdanan e. Aliyê din, aspekta siyasî û stratejîk girîngtir e. Tevgera Kurdistanê êdî li Rojhilata navîn di prosesa guherînan de bûye hêz û faktoreka siyasî ya sereke. Ji tevgera Kurdistanê qesda me, Dewleta Federe li başurê welatê me û bizava welathiz ya li hemî parçeyên Kurdistanê ye.

Belê Îran, Tirkiye, Misir û Sûidî çar dewletên bihêz in ku dixwazin li Rojhilata navîn bibin xwedî bandorê û rola „Dewletên herêmî pêşeng" bilizin. Hêzeka din Israîl e. Nuha li herêmê êdî tevgera Kurdistanê jî derdikeve pêş û wek hevpeymanên Amerîka dibin xwedî rolek. Ev di dîroka me de nu ye. Divê stratejistên Kurd vê rûdanê baş analîz bikin. Ev çar dewlet nikarin pêşengiya demokratîzekirinê bikin. Divê dewlet û mileteki musilman vê rolê bilîze. Hêlîna demokrasiyê Kurdistan e. Kurd paqij in, bi jehrê diktatoriyan nelewitî ne.

Ev rewşa nu erkên nu derdixe pêş tevgera bakurê Kurdistanê jî: Divê em xwe hinekî bilezînin, li gor pêdiviyên rûdanan bersiva jiyanê û siyasetê bidin. Îlac yekîtiya netewî ye. Elîta siyasî û rewşenbîrî ya bakur divê dest bide hev û bi hevre ji bin vî barî rabe.

Saddam Huseyîn an jî darizandina dewletek dagîrker -2-

Dadgeha Taybetî ya Iraqê dadgehek netewî ya Iraqê ye.Lê meriv li wezîfe û darizandin,sûc û sûcdaran binerin,wek dadgehek nawnetewî ye.

Li gorî agahdarîyan, piraniya sûcan bi emr û daxwazab Saddam û hevalbendên wî pêkhatine. Saddam heta 2004 an bi 7 sûcan û piştre jî bi 5 sûcên din hatiye tavanbarkirin.Ew sûc di hiqûqa nawnetewî de wek;

a-Sûcen şer.

b-Sûcên komkujî-Jenosîd-

c-Sûcên li dijî mirovatîye.

tên nasandin. Sûcên ku heta niha eşkere bûne li jêrin.

1-Kuştina serok û şêxên olî di sala 1974 an de.Ew dem Saddam Cîgirê Serokkomarê Iraqê bû.

2-Kuştina gelek mirovên sîyasî-Ew kes endamên gelek partîyê cûrbecûr bûn-Di nava 30 salî de bi hezaran mirovên endamên partîyên sîyasî hatine kuştin.

3 -Îdamkirina 143 kes û êşkence li Dudscheîl ê di sala 1982 an de piştî sûîqasta li dij Saddam Huseyin.

4-Bombekirina bajarê Kirkûk e.

5-Komkujîya li dij êşîra Barzanî di sala 1983 an de .Di Sala 1983 an de dema şerê di navbera Iraq û Îranê de Artêsa Îranê heta Hecî Umranê hatibû. Saddam di wê demê de nêzî 8.000 Kurdên Barzan bi zor ber bî başûrê Iraqê kocber kir û li çolên Iraqê dan kuştin.Gelek kes dibêjin ku,di dema kuştina



Cuma YAKUT

8.000 kesan de çekên kîmyewî cara yekemîn hatine bikaranîn.

6-Komkujîya Enfalê di navbera salên 1986 û 1988 an de.Di navbera wan salan de li gorî agahdarîyên Kurdan nêzî 180.000, li gorî agahdarîyen nawnetewî nêzî 100.000 mirovên Kurd jîyana xwe wenda kirine. 4.500 gundên Kurdan hatin hilweşandin.Bi sedhezaran kes bi zor hatin koçberkirin. Di 20.06.1987 an de Hasan Alî el Macid biryara SF/4008 îmze kir.Di biryarê de kustina hemû mêrên di navbera 15-70 salî û xerabkirina gundan, koçberkirina gundîyan li ser sînorê Îranê jî cîh girtiye û Kurdên hatin koçberkirin di qamp û girtîgehan de hatin êşkence kirin û dûre jî bi sedan kes bihevre çavgirtî hatin kustin.Ew kesên kuştî bi hevre xistin bin êrdê.

7-Di sala 1980 de koçberkirina Kurdên Feîlî .

8-1988 an de êrîşa Helebçê bi çekên kîmyevî.Di vê êrîşê de nêzî 5.000 Kurd-bi piranî jin, pîr û zarok jîyana xwe ji dest dan.

9 -Êrîs û girtina Quweyt ê.

10-Di sala 1991ê de kuştina hezaran şîîyan piştî serhildanê.

11-Guhertina şertên jîyana Erebên başûrê Iraqê.

12-Îskence,binçavkirin û qedexekirina partîyên sîyasî, sazî û terîqetên olî.

Saddam dîqtatorekî xwînmij e. Li dij gelê Kurd, di 30 salên desthilatdariya wî de herdem şer kiriyê û bi sed hezaran Kurd li gor daxwaz û fermanên wî hatine kustin. Dewleta ku Saddam îdare kiriyê wek dewletên dagirkerên Kurdîstanê herdem qirkirina Kurdan, xerabkirina gund û bajaran, kocberkirina sedhezaran, êskence û zilma bê dawî bikaranîyê. Saddam hemû sûcên ku di hiqûqa navnetewî de hene kiriyê.Saddam û sîstema BAAS li dij mirovatîyê sûcdarin. Eskereye ku Dadgeha Taybetî ya Iraqê, Saddam û hevalbendên wî sûcdar bibîne û mehkûm biki. Gelê Kurd cara yekemîn bibînê ku,sûcên li dij Kurdan hatiye kirin bê ceza namîne.Darizandina Saddam û hevalbendên wî jibo vê yekê dîrokî ye.Darizandina dewletek dagîrker û sûcên wê ne.

Gelo ewê kengî dor bê dewletên wek Tirkîyê,Îran û Sûrîyê, ku bi sedsalane gelê Kurd qir dikin, koçber dikin, gunda dişewitînin, êşkence dikin û tucar hesabên wan kiryar û sûcên li dij mirovatîyê nadin?

Tirk ji Gena xwe ketin şikê



Dr. Spencer Wells ê ku hatiye serê Projeya Genografiyê got „ li Tirkiyê GEN a Tirk kêm e". Liser vê gotina Wells pisporên Tirk jî gotina wî rast derxistin û şika xwe ya liser kêmbûna GEN a Tirk anîn zimên.

Dr.Spencer Wells bû Serokê Projeya ku ji alî şirîkatiya Komela National Geographic û IBMê ve wek „Projeya Genografî" hat binavkirin û ewî di hevpeyvînek xwe de got „li Tirkiyê GENa Tirk kêm e". Pisporên Tirkiyê jî ketin nav vê nîqaşê û gotinên Wells piştrast kirin. Pisporên Tirk dibêjin ku „ew li van gotinên Dr.Wells ecêbmayî nemane û rastî eve ku GENa Tirkan tevlihev e". Dr Wells dibêje „ em zanin ku çand û zimanê Tirkî li Anadolê belavbûye, lê rastî û belge pêş me dikin ku GENa Tirk a ku bi Selçûkiyan re ji Asya Navîn hatiye Anadolê li vir zêde belav nebûye. Tirkiye ciyekî pir heterojen (tevlihev) e".

Liser van gotinên Dr.Wells pisporên Tirk bi vî awayî bersivêdidin:

PROF. DR. ASLIHAN TOLUN (Endamê Perwerdekarên beşa Genetîk û Molekulên Bîyolojîk a Zanîngeha Boğaziçi): „Berî 5-6 salan derket holê ku em bi warê Genetîkî li gor çêbûna Anadolê ne. Berî bi çend salan me bi biyaniyan re lêkolînek liser koka Genetîka Tirkan kiribû. Li wir jî heman encam derketin holê. Tirk pir heterojen in. Sedema vê jî eve ku Tirkiye liser riya koçberiyê ye. A girîng yekîtiya kulturî ya mirovan e. Di vê babetê de koka Genetîkî dikeve rêza duyemîn. Tirk di warê Genetîkî de dişibin mirovên derûdora xwe. Em dişibin xelkên Rojhilata Navîn, Balkan û Kafkasan, em hinekî jî dişibin Ermenî û Ereban jî".

DOÇ. DR. ÇEVİK TUFAN (Endamê Perwerdeya beşê Navenda Lêkolînên Biyoteknolojî, beşê Mihendîsiya Gen û beşê Navendî ya Hîstolojî û Embrîyolijî ya Zanîngeha Pamukkale): „Ev ne nûçeyek ecêbmayînê ye. Hinek ji Genên bedena mirov Genên sabît in, ango Genên ku hatine paraztin in. Nûçe behsa van nake. Behsa karakterên ku meriv destnîşan dikin tê kirin. Ev jî ne ecêb e.Em jî li bendî bûn ku Gena Tirk tevlihev be. Heger bêyî ku lêkolînek bê kirin ji me bê pirsîn emê bêjin „ Tirk dişibin Ewrûpî, Afrîkî, Amerîkî û Rojhilata dûr. Wî çaxî jî grûpek ku taybetmendiyên Tirkan hildigrin namîne".

PROF.DR. HAKAN ŞATIROĞLU (Endamê Perwerdeya beşê Nexweşiyên Pîrekî û Navenda Zabûnê ya Fakulteya Tenduristî ya Zanîngeha Ankara): „Heterojenbûna me tiştekî xwezayî ye, em koçer in. Em li ciyekî nesekinîne. Cazîba zayendî (cinsî) pir girîng e. Jiber ku hem mêr û hem jî jinên Tirkan koçerin, bi rehetî girtî nemane. Bi xweşdîtinî ji civatên ku têde jiyane Gen dane û stendine, mêr kirine û jin anîne. Di nav Osmaniyan de jî tevliheviyek wilo xweşik hebû. Em û dinyayê di nava hevdû dene, tevlihevbûna Genên me tiştekî ne ecêb e".

HEY WAX !

Xalidê Hekarî



Di roja 17.10.2005 an de, di ekranên hersê Televîzionên Kurdistana azad da , bi tenê dîmenên 512 Şehîdên Barzanîyên bênav, ko di sala 1983 an de, ji alîyê Sedam û partîya wî ya xwînxwar ve hatibûn şehîtkirin û di çaleke komkujî de veşartibûn, diweşandin. Çi dîmenek bi heybet bû ,sahmê serê mirov digirt. Hey dad û bêdad! Ma tiştek weha dewr û deman liser ruyê erdê hatibû dîtin û bihîstin? Ma tiştek weha li deverek din yê cîhanê rûdabû? 512 şehîdên eşîrek welatevîn, yên bênav, ko bi sedan salane, jibo welat û millet giyanê xwe gorîdikin ,xwîna xwe dirêjîn, bi zaro, xort û kalan, turbe û cenazên wan , bi rêresmekê bê rakirin.? Bi deh hezaran dayik, xwuşk, jin, bûk, zaro û lêzimên wan,reşgirêdayî, bigirîn,şîn û tazîyê bikin. Ev çi dîmen bû? Çi dehşet û çi heybet bu? Êşê havêt serê min, min got qey xwîn ketîye mejiyê min, kerb û kînê ez girtim, nihêla dilê min rabû, hiş û aqil tevlihev bû.

Di axaftina xwe ya rêresmê de, Mam Celal got : Yek bihost erd li Kurdistanê nemaye ko bi xwîna Barzanîyan sor nebûye. Vê gotina Mam Celal, ez havêtim nav bûyer û qewimandinên salên 1974- 75 – 79 û yên pey wê. Wan salên ko Partî, Rêxistin û sazîyên me, yên Kurdistana bakur jibo xatirê ko dost û propoxandîstên dewletên sosyalîst, yên herwe û belaş bûn, lewre jî dibûn dijminê şoreşa xwe, neheqî û gotinên ne di rê de, li Barzanîyan dikirin, hatin ber çavên min. Bi vê kerb ü hirsê Partî ,Rêxistin û Sazîyên Kurdistana bakur hatin ber çavê min ewên ko jiber arikarî ü danûstandinên ticarî û eskerî ya navbera Sovyet û Sedam de, hinekan digot: Sedam û partîya wî ya Bees sosyalîst e, pêşverû ye, Barzanî û şoreşa wî hevalê emperyalîstanin ,paşverû ne û bi xiyanetê tewanbar dikirin. Hinan digotin : Emê Şoreşa Barzanî û Kurdistanê qurbana bratîya çepê Tirkan bikin. Hinan digotin: Eyaleta Amerîka, ya nizanim çendanê. Hinan digotin: Axa ne, paşverû ne, eşîr in, dijminê gelê xwe ne. Hinan digotin: Kurdistan firotine çend milyon tumen û dolaran. Hinan digot : Hevalê MÎT ê ne, li filan gundî li binê filan darê bi berpirsên MÎT ê re berx sordikirin, ereq vedixwarin. Hinan bi Tirkî bi dengbêjên xwe didan gotin: şehît filankes, rêber filankes, Barzanîcîlerden Întîqaminî alacagiz.(şehît filankes, emê tola te ji Barzanîparêzan bistînin) Hinan digotin : Îsraîla diduwane. Hinan digotin: Xencereke di nav qolincên dewletên Rojhilata navîn de. Hinek jî ewqas pêşde diçûn digotin: Ew Kurdistana bi destê Barzanîyên paşverü çêbibe, em naçin wê Kurdistanê û hwd.

Gelo, piştî gotina Mam Celal, xwedîyên van gotinên jorîn dê bi wijdanê xwe re hesabê bibînin yan na? Wê ji ezabê wijdên xew bikeve çavê wan? Dê bişên xwe ji bin barê wan gunehan derxin? Dê kusan (çawan) xwe bi van 512 şehîdên Barzanîyên bênav bidin efûkirin? Heke wijdan û rehm di dilê wan de mabe! Hey wax dê li vê dinyayê çend ezabê bidene xwe. Ev celeb kesene dê çawa ji wê ezaba wijdanê û gunehan rizgarbin? Bi tene rêyek heye ew jî bi şik e. Heke her tiştên xwe bidin rexekî, bi hemî karîn û şîyanên xweve, di bin dirişim û sloxana Barzanîyê nemir û pêşmergên qehreman de ko digotin: Yan Kurdistan , yan neman, bigehin hev, welatê xwe ji bin nîrê koledarîyê rizgarbikin û gellê xwe bigehînin azadîyê! Wî çaxî,ku xwudê hebe, belkî li wan bê rehmê. Ku nebe belkî şehîdên Barzanîyan li wan biborin û heqê xwe li wan azad bikin.

Di dawîyê de gotina gorbiheşt Hemreş reşo hat bîra min ko di sohbetên navbera min û wî de tim



Kadîm Kan

„HINEK“ KURD Û GELEK DEMOKRASÎ

Ji alî gelekan ve tê qebûlkirin ku demokrasî herî forma baş ya rêvebiriyê ye.

Yanê dengdanên ku bi dengê piranîyê dibin qerarên kolektîv otomatik berjewendîyên piranîya civakê diparêze. Di welatê herî demokratîk de jî gelek biryar û ne hercar bê dengdana gel tênê girtin.

Carna siyasetmedarên ku nûnerên gel in heqê qerardayînê di xweda dibînin û ji gel napirsin, qanûnan derdixin. Yan jî qerarên şaş liser aborîya xelkê, liser sihetê, liser kar, liser bac-vergîya xelke didin.

Lê piştî wexteki xelkê ku xwedîyê kulturek siyasîne û bi hêza dengda na xwe zanin, mekanîzma demokratîyê di dengdanê de bikartînin û bersiva siyasetmedaran didin.

Lê hinek teref di civatê de hene ku demokrasî bersiva hêviyên wan nade.

Jibona hinek mislimanên bi bîr û bawer biryarên civakî, biryarên ku kolektîv hatine stendin ne mimkune li ber emrê xudê tu mana wê hebe. Yan jî tesira wan bi emrê xudê wek hevdû bin.

Biryaren demokratîk ne bi dilê feminîstaye jî. Jibona feminîstan qanûn û hikmên ku hene tenê berjewendîyên mêran diparêzin. Başe ku ew jî protestoyên xwe wek misilmanên fûndementalist bi riya xweteqandinê nîşan nadin.

Jibona komunîsteki demokrasîya ku heye û qanûnên ku hene tenê ji sinifa serdest re xizmetê dike û meriv gerek li himberî demokrasîyek weha be. Antî milîter, yanê pasîfist jî demokrasîya ku têde leşker û xerckirina hêza parêziyê heye qebûl nakin û demokrasîyek nû dixwazin.

Lê xelkên eqlîselim yan jî li gor wan ne eqlîselim li gor prensîpên listika demokrasîyê geh li rast û geh li çep grûpên civakê li pey xwe dibin û tînin.

Başe em Kurd çi dikin? Em Kurd çikasî prensîpên demokrasîyê jibona berjewendîyên xwe pêktînin?

Em Kurd çiqas li prensîpên demokrasîyê di nav rêxistinên xwe de bikartînin û lê xwedî derdikevin? Da ku ew prensîpên demokrasîyê bibin hacet jibona armancên me em çi dikin?

Li welatekî Ewrûpî, li dewletek gelek demokratîk, li paytextê wê dewleta pêşketî, çend Kurdên dilsoz û xêrxwaz dighîjin hev û komîtekê ava dikin? Li berxwe didin û çend hevalên din jî jibo xwe peyda dikin?

Roja ku komîtek nû bê hilbijartin, hinek ji wan Kurdên siyasetmedar ku prensîpên demokrasiyê gelek baş nas(nakin)dikin, bi carekê xwîşk, bira û hinek ji eşîra xwe tînin û li .... qeyd dikin.

Ku gelek ji wan xelk bi rêzdarî liwan mêzedikin. Ew bixwe jî wê liztikê qebûl dikin û xwe li...qeyd dikin.

Pirs bi P ya mezin!

a-Çima weha dikin? B-Çi dixwazin? C-Armanca wan çiye ?

Merivên ku ew dixwazin di komîta...bin.

Merivên ku ew dixwazin dîsa di komîta...bin.

Merivên ku ew dixwazin carekê din di komîta...bin.

Tu bersivekê din nikarim bibînim.

Ez sedî sed pê bawerim. Eger meriv bipirse ``Ez xulam hûn zanin ku tiştên hûn dikin ne raste, weha nabe`` wê bersiv``Ma ne demokratîye? Ma ne dengdane?" be.

Gelek ji me demokrasîyê ji alî q..ne fahm kirine.

A herî balkêş gelek ji wan merivan karin bibêjin "em li himber diktatoriyê, li himber totalîterîzmê, li himber otokrasiyê û wd ne.

Lê li tişteki naxwazin mikur bên û bêjin ku ên li himber demokrasiyê ew bixwe ne.

Xudê sebir bide!

Amîn!..

Li Almanya merasîma çilrojiya wefatkirina hùnermend Merziye Ferîqî

Mistefa Çiwartayî / Koln



Di merasîmek pir şerefmend de, bi beşdariya hejmarek mezin ji malbatên Kurdên bajarê Koln û bajarên derdor, çendîn partiyên şoreşgerên hemû parçeyên Kurdistanê, çendîn rêkxirawên kulturî li bajarê Koln ê Almanî. Çileya wefatbûna hunermenda gelê me xanim 'Merziye Ferîqî' bi rêve çû. Di wê merasîmê de çendîn parçe muzîkên xemgîn û hin ji berhemên hunermenda navhatî pêşkêşkirin. Herweha ji aliyê partî, rêkxirawên siyasî, komeleyên kulturî, çend gotar jî hatin xwendin. Dîsan hunermend Nasirê Rezazî hevjînê 'Xanim a Merziye' li vê merasîmê amade bû û tê de supasî hevxemî û hevkariya xelkê Kurdistanê û partiyên siyasî bi taybetî 'Yekêtî, Partî, Komele û Demokrat' kir. Herwusa Nasirê Rezazî egerê wefata Merziyeyê, xemsariya Diktoran û neserkeftina wê neştergeriya ku ji hunermendê re hatibû kirin, ji amadebûyan re behs kir. Pişt re şaîr û nivîskar Şaho Tofîq û şaîr Heme Reza gotar û perçe şiîrên xwe pêşkêş kirin. Merasîmê bêtirî çiwar demjimêran dom kir. Li dawiyê jî amadebûyan yeko yeko, hevxemî û serxweşiya xwe jibo malbata Rezazî û malbata Ferîqî dubare kirin û ji hunermend Nasirî Rezazî xwestin ku ew liser huner bexşînê berdewam be.



nirxandin

Ômer ÖZMEN

BAZIRGANIYA GEMAR

Pêywendîyên navnetewî ; bi giranî liser bingeha berjewendîya milletan û dewletan tên tayînkirin. Dewlet an rêxistin, li gorî van berjewendîyan politîqayên xwe hildibijêrin. Encax, di hilbijartina van politîqayan de, hinek nirx û pîvanên mîrovahîyê, yên hevbeş hene ku, divê neyên binpêkirin. Wek; piştevanîya sûcên li dij mîrovahîyê, firotina çekên kîmyevî, bazirganîya narkotîkê, bertilxwarin an bertildayîn.

Seddam Huseyîn; bikaranina çekên kîmyevî ji di nav de, îro ji kuştina milyon kesan berpirsîyar, jibo sûcên dij mîrovahîyê, li hemberî dadgehê ye. Alîkarîkirin û xurtkirina kesekî wek Seddam Huseyîn, tê wateya alîkarîya dij mîrovahîye.

Li gorî raporek ji terefê Komisyona Neteweyên Yekgirtî ve hatîye amadekirin, bi qasî 2200 firmayên bi dewleta ve girêdayî 1.8 milyar dolar bertîl dane Seddam Huseyîn.

Serokê Komîteya Lêpirsînê ya serbixwe Paul Volcker, di vî warî de, raporek 623 rupel pêşkêşî Sekreterê Gîştî yê Neteweyên Yekgirtî Kofî Annan kiriye..Di raporê de eşkere bûye ku, di nav salên 1996- 2003 an de, di çerçova „ beramberî xwarinê petrol" ê de, ji dervayê yasayên navnetewî, bi rejîma Seddam re têkilî hatîye çêkirin.

Di rêzgirtina firmayên bertildan de, Rûsya, Fransa û Tirkîye di serî de cîhgirtine.Berpirsîyarê Fransê, yê Neteweyên Yekgirtî Jean Bernard Merrimee, jibo vê bertildayînê, ji dewleta xwe 165 hezar 725 dolar şabaş stendîye.(Radikal- 29.10.2005)

Ji vana 138 firmeyên Tirkîyê ne. Di rapora Volcker de cîh girtine ku, ji firmayên Tirk, bertîla herî zêde TUPRAŞ ê daye Seddam.Tupraş firmeya dewletê ya fermî ye.

Firma Rûsan ya bi navê GAZPROM, di serê listê de ye. Tê zanin ev firme, bi Dewleta Tirk re, bi navê " Projeya mavî Akim" kar dike.Liser Derya Reş, gaza xwezayî difiroşe Tirkîyê.Bi salane navê Gazprom ê, di nav lêpirsîna mafya Tirk de cîhgirtîye.

Cudarenge; dewleta Fransiz, damezranvanê Yekîtîya Ewropayê ye. Dayîka Repûblîkê (komarê) tê zanin. 215 sal berê, liser prensîbê wekheviyê, edaletê û azadîyê, ji şoreşê re pêşengî kiriye. Lê mixabin, vê mîrasa xwe ya dîroki, jibo çend petrol-dolarê rejima xwînxwar lewitandiye.

Rapora Komîta Serbixwe ya Neteweyên Yekgirtî., carek din destnîşan dike ku, di xwînrijandina gelên Rojhilata Navîn de,rejîma Seddam ne bi tenê sûcdare. Ew dewletên ku, heta roja rûxandinê piştgirîya Seddam didomandin, jibo van berjewendîyên gemar, sûcdarên hevbeşin.

Thomass Mann



Fadil Özçelik

Buroya Peyama Kurd li Bonnê li cadeya Thomas Mann e. Gelek car xwendevan û hevalên me miraq dikin û dipirsin: "Çi kes e ev Thomas Mann?" Piranî car ez bi kurtî bersîv didim û dibêjim: "Ew jî kesekî wek me sirgûn e. Em ji faşîzma Tirk ew jî ji faşîzma Alman reviyaye. Em li welatî wî li cadeya navê wî lê hatiye kirin rojnameya sirgûnî Peyama Kurd derdixin. Wî jî li sirgûniyê li Swîssreyê kovarek bi navê Mass und Wert (Girse û hêjayî) derxistiye. Lema em wî gelekî nêzîkî xwe heta wek hevalekî xwe dibînin." Bêguman ev bersîv têra tukesî û tiştekî nake. Ji ber vê yekê bi nivîsekê be jî min xwest nivîskar û humanîstê mezin Thomas Mann piçekî naskirin bidim.

Thomas Mann yek ji girîngtirîn nivîskarên Alman yê sedsala 20an e. Ew li Almanya bajarê Lübeckê li malbatek dewlemend hatiye dinyayê. Diyare di demên nivîskariyê de dewlemendiya Mann bûye bela serê wî û rastî rêxnên dijwar tê. Mann vê rewşa xwe di nivîsekê de weha radixe ser kaxizan: "Ez di nava du dinyayan de me. Di herduyan de jî ez rehet nakim. Ji ber vê yekê karê min zor e. Hûn, hunermendno dibêjin ku ez bûrjuwayekim, bûrjuwazî jî xwest min bigire.. Ji van kîjan bêtir min dibêşîne ez nizanim." Di sala 1905an de li Münchenê bi Katja Pringsheim re dizewice û bi vê zewacê şeş zarok jê re çê dibe. Di salên Şêrê cîhanê yê yekem de Thomas Mann siyaseta şer ya Kaiser diparêze û rêxnên dijwar li lîberalîzmê dike. Di sala 1923an de wexta Komara Almanya tê damezirandin Mann wek berdevkê nîvresmî bangî rewşenbîran dike ku piştgiriya Komara Weimar bikin.

Yekem pirtûka wî „Der Kleine Herr Friedmann (Birêz Friedmannê bejn qut) di sala 1898an de hat weşandin.

Mann li gel romanên xwe bi ceribandin û nivîsên rexnegirî jî tê naskirin. Romana bi navê „Malbata Buddenbrook" wek çêtirîn berhema Mann tê naskirin ku nivîskar di 26 saliya xwe de nivîsandiya.

Piştî vê romana xwe ya mezin Mann, berê xwe dide nivîsandina romanên biçûk û çîrokên dirêj. Di sala 1902an de romana ku huner û dîsîplînê dinirxîne „Tonio Kröger" weşand. Di pirtûka xwe ya „Königliche Hoheit" de jî wezîfe û fedekariyê ji xwe re dike mijar. Mann di romana xwe „Li Venedikê mirin" evînek bê hêvî radixe ber xwendevanên xwe.

„Çiyayê Sêhrkirî" duyem berhema wî ya naskirî ye. Di vê romana Mann de hêjayiyên lîberal û konservatîf; dinya medenî û bîr û baweriyên ji dervî êqil bi hevdu re şer dikin. Humanîstê Îtalî Settembrini mecbûr dimîne ku pêşniyariya duello ya Naphta yê paşverû, xwedî bîr û baweriyên kor û dervî êqil qebûl bike. Mirin ji bo Settembrini ji kuştinê hêsantir e. Êşa mirinê carekê ye ya kuştinê di temamiya jiyana mirov de didome. Jiber vê yekê Settembrini xwe bi kuştin dide, lê nakuje. Naphta bê ku dudilî bibe Settembrini dikuje û serkeftina xwe îlan dike.

Di jiyana reel de jî şerê „çê" û „xirabiyê" ma her weha bi dawî nabe? Kî naxwaze bikuje ew tê kuştin. Gava dikuje ew jî dibe kujerek, ango li vir jî dîsa ne „çê" lê „xirabî" bi ser dikeve. Di niqaşên xwe de Naphta kehanetek balkêş ku tenê piştî weşandina pirtûkê deh salan wê pêk bê diqîre û hatina faşîzmê dibîne: „Nehên (nagîhana, gizem) û esas prensîba dema me ne azadîbûn û pêşxistina egoyê ye. Ya pêwîstiya dema me, ya daxwaz dike, terora ku wê ji xwe re biafirîne ye."

Berhema piştî vê „Yisûf û Brayên xwe" wexta Mann dinivîse li Almanya desthilatî dikeve destê Naziyan. Mijara vê xebata xwe jî Mann ji Încîlê wergirtiye û xwendevan li ser azadiya ferdî û tîraniya siyasî difikirîne.



Bi hatina faşîzmê Thomas Mann welatê xwe terk dike diçe li Swîssreyê bi cîh dibe û li vî welatî kovarek bi navê Mass und Wert (Girse û hêjayî) derdixe. Di sala 1936an de jî Mann berê xwe dide Amerîkayê û 10 salên xwe li vî welatî diborîne. Li Amerîkayê Thomass Mann li gel gelek dezgehên zanyarî li Zanîngeha Princeton jî kar dike. Mann li vir romana „Lotte in Weimar" (Lotte li Weimarê) dinivîse ku di şexsiyeta îlûzyonîstekî bêesil de faşîzma Alman dinirxîne. Di sala 1947an de Mann romana xwe ya dawî „Doktor Faust" dinivîse û hema di eynî salê de redigere Ewropayê.

Lê li gel ku di wan salan de li Almanya faşîzm êdî têk çûbe jî Mann venagere welatê xwe û carek din li Swîssreyê bi cî dibe. Kî dizane belkî carek din nexwest pêl erdê welatê xwe yê ku di şer de bû sedema mirina bi dehan milyon însan û jê bêtir mirovên seqet li dû hovîtiya xwe hişt. Belkî nexest welatê xwe û dinya tarûmar kir bibîne. Mann di sala 1955an de li Zurîhê diçe ser dilovaniya xwe û romana "Îtirafên Felix Krull" nîvçe dimîne.

Li gora Mann: „Însan ne tenê jiyana xwe ya şexsî, bi hişdarî an bi bêhişî, ew jiyana dem û mirovên dema xwe jî dijî".

Thomass Mann di sala 1929an de Xelata edebiyatê ya Nobelê wergirt.

Hin berhemên wî yên mayin ev in: Mario û Sêhrbaz, Jina hatiye xapandin, Yê hilbijartî, Gelê Alman gohdar bike, Mejiyên diguhere.

Belê Peyama Kurd li ser cadeya navê mirovekî gelekî nêzîkî xwe lê bûye, wek kelemek di çavên dagirkerên Kurdistanê jiyana xwe didomîne..

Biryarên civîna duyemîn ya nûnerên PDK-Bakur û PSKê

PK - Civîna duyemîn ya nûnerên PSK û PDK-Bakur jibo karên hevbeş li derveyî welêt roja (30.10.2005) li Bonn çêbû. Nûnerên Rexistinên Derveyî welêt yê PDK-Bakur û PSKê ev biryarên li jêr dan.

1. Jibo karên hevbeş li derveyî welêt Komiteyek kargêrî- hertimî hat damezirandin. Karên hevbeş wê bi riya vê Komiteyê bê meşandin. Ev Komiteyeke ku kar û xebatê bike. Ev Komîte wê ji kesayetên ku amade bin alîkariya vî karî bikin, tikayê bike ku ew jî tevli karê Komiteyê bibin û ewê bê firehkirin.

2. Ev Komîte wê di kar û xebatên xwe de ji tecrûbe û nerînên kesayetên din jî istifadeyê bike. Bi taybetî yên ku di xebatên hûnandina yekîtî û hevkariyên nabeyna partî û rêxistinên Kurdistanî yên berê de cîh girtine, wek xebatên UDG, Hevkarî Hep-Dep, Tevger. ... Ewê di derbarê cûreyê hevxebat û alîkariya van kesayetan de bi wan re bê peyivandin. Pirsa yekîtiyê ne tenha pirsa herdu partiyan e, her Kurd û Kurdistaniyek dilsoz divê tevli van xebatan bibe.

3.. Ewê nameyek amade bibe û bi rêxistinî û nerêxistinî ji hemi kesayetên li derveyî welêt re bê rêkirin. Di vê nameyê de wê bîr û raya kesayetan û pêşniyarîyên wan di derbarê metod û şêweyê xebata yekîtiya netewî de bê pirsîn. Em dixwazin bipirsin bi çi rengî û metodî kar jibo lihevcivînê bê kirin ku heta mumkin be hemî hêzên Kurdistanî bikarin bên cem hevdu û gavek jibo yekitiya netewî bê avêtin. Di vê qonaxê de emê liser rê û rêçûna kar pêşniyarîyan bicivînin.

4.. Piştî ku em pêsniyariyan bicivînin, ewê civînek fereh lidar bikeve. Di vê civînê de wê rewşa tevgera welatparêz li seranserê Kurdistanê û bi taybetî li bakurê welêt bê axaftin. Armanc wê ew be ku aqil û bîr û hizrek hevbeş peyda bibe, an bi gotinek din aqilê muşterek bê tespîtkirin. Di vê civînê de pêwiste liser siyaseta yekitiya neteweyî û şêweyê rêxistinâ hevbeş û xebata hevbeş bê axaftin û biryar bên dayîn.

Komîteya hevbeş wê xebata xwe periyodîk û bi rêk û pêk bidomîne û raya gîştî di wextê de agahdar bike. Xebatek vekirî û di bin çavdêriya raya gîştî ya welatparêz de em dixwazin lidarbixin.

Em bangî hemi Kurd û Kurdistaniyan dikin ku piştgiriya karê yekitiya netewî bikin û bi niyetên negatîv ev kar neyê nirxandin. Ji derveyê yekitiyê û xebata hevbeş li pêşiya me tu riyên din nînin.

Hemi tişt jibo yekitiyê û azadiya Kurd û Kurdistanê.

Bonn, 30.10.2005

Komiteya Hevbeş a Kargêr a PSK û PDK-Bakur

Kamîran M. Silêman:

„Wê Mêrg û Çîmen careke din Kurdistan Tv bixemilîne“

Kamîran Mer'î Silêman berhevker û pêşkêşkerê programa 'Mêrg û Çîmen'e ku temendirêjtirîn û binav û dengtirîn program bû li Kurdistan.tv. Ji nişka ve ev program hat rawestandin û Kamîran jî winda bû. Rojekê me ew li kafetiryayeke bajarê Duisburg yê Elmanî dît û me ev hevpeyvîna serpê digel wî sazkir..



Peyama Kurd: ***Kek Kamîran tu kengî û jibo çi hatiye Ewropa?***

Kamîran: Ez li dawiya meha Hezîranê gihîştim Parîsê, bi rastî ez digel hevjîn 'Xanim'a xwe hatime geşt û seyranê wekî dibêjin; "Meha hingivînî"ye, helbet ev sê mehin em li vir in û me pir heval û pir welatên Ewropa dîtin.

Tu jibo karekî televizyonî nehatiye?

Erê raste, lê digel geryanên xwe li welatên Ewropa, me kar jibo televizyonê jî kir û me karî bi kamîreya xwe em gelek hevpeyvînan digel hunermend, rewşenbîr û nivîskarên Kurd yên ku li Ewropa dijîn bikin û me raport liser ciyên dîrokî yên van welatan berhevkirin. Dîsan em beşdarî ahengên revenda Kurd bûn li gelek ciyan û me ev hemû tişte ji televozyonan re şandin, bi taybetî jibo televizyonên navxweyî û gelek ji wan hatine weşandin û gelekên din jî wê li van demên nêzîk bên weşandin.

Mêrg û Çîmen çi lê hat? û eger hûn vegeriyan Kurdistanê, wê Mêrg û Çîmen jî vegere?

Helbet Mêrg Û Çîmen û Kurdistan.tv, malên min in, wan ez perwerde kirime û bi rêya vê kenalê û vê programê, me kariye em xizmeta gelê xwe bikin û emê berdewam bin. Lê jiber ku ez berhevkar û pêşkêşkarê 'Mêrg û Çîmen'im û ez niha li Ewropa me, loma program dernakeve.

Xelkê gotin Kamîran Mer'î û Mêrg û Çîmen ji Kurdistan.tv, hatin derxistin! Hûn çi dibêjin?

Em her kurên Kurdistanê ne, nehez û dijminên me gelekin, lê eger mirov bixwaze xizmetê bike, bi baweriya min kes nikare rê li ber mirov bigire, min go Kurdistan.tv mala mine û ez bi hemû bawerî dibêjim, wê Kamîran Meriî di Kurdistan.tv de, derkeve, îca li ser navê programa Mêrg û Çîmen yan programeke din be.

Li vir min divê ez bêjim ku hin caran mirov şaşiyan dike, lê îtirafkirin bi şaşiyê serkeftine, belkî di vî temenê gencatiyê de me şaşî kiribin, lê ne bi qesd me kirine, loma ez dibêjim ku bi piştevaniya birêz Karwan Akreyî û rêveberiya berhemanînê li Kurdistan.tv, wê Mêrg û Çîmen careke din Kurdistan Tv bixemilîne.

Li vir me wek Peyama Kurd, divê em ji xwendevanên xwe re bibêjin ku dema Kamîran ji Kurdistanê derket, gropa teroristiya Şêx Zana li Hewlêrê hat girtin, xelkê jî gotin; Kamîran endamê vê gropê bû û yê revîyayî. Ji axaftinên kek Kamîran jî diyarbû ku ev gotin gihiştine guhên wî, loma wî behsa nehez û dijminan dikir, me jî xwest em li ser vê mijarê hinekî pê re bi axivin, lê wî got;

'Ez naxwazim vê babetê nûkem, jiber ku jibo hemûyan derket ku ew tenê got-got bûn û çi bingeh jibo wan nebû'.

Herweha got; 'min Şêx Zana nedîtiye û ez wî nas nakim!'

We got hûnê liser ekrana K.tv cardin diyarbin, lê belkî ne bi programa Mêrg û Çîmen, gelo çi programên din di serê we de hene?

Pirojeya programek rojane heye, belkî ez pêşkêş bikim ew jî programa 'Spêde baş Kurdistan'e, lê hêjî misoger nîne û dema ez vedigerim, wê hertişt xweya be.

We Ewropa û revenda Kurd çawa dîtin?

Birastî hemû welatên Ewropa wekhev in, li vir du rê li ber mirovan hene. Rêya başiyê û pêşketinê û rêya diserdaçûnê û pûçbûnê. Revenda Kurd jî wek min dît rêya baş helbijartiye û sûd jê wergirtiye, çavê wan hemûyan li hindêye ku rojekê ew vegerin û jiber ku ew li vir fêrî yasa û azadiyê bûne, omêda wan jî ewe ku ev yasa û azadiyên li Ewropa hene li Kurdistanê wê bên peyrew kirin. Loma hemû kardikin û xwe zehmet didin jibo ku dema vedigerin bikarin li welat jî xizmetê bikin.

We got, we gelek hunermend dîtin, bi raya te çi ji wan re pêwiste?

Belê me jimareyeke mezin ji hunermendan ji hemû parçeyên Kurdistanê dîtin, bêtiriya wan li hêviya wê rojêne ku biçin Kurdistanê û hemû li rêyan digerin, lê bersîvê ji tu kesekî nagirin, loma bi raya min eger saziyek hunerî çandî hebe hembêza van hunermend û rewşenbîran bike, emê bikarin li Kurdistana azad hunerek ekademîk avabikin û festîvalên mezin lidarxin.

Axaftina we ya dawiyê?

Jibo ku ji nehezan re diyarbikim ku Kamîran ne reviyaye, ezê li van nêzîkan vegerim Kurdistanê û ezê berdewamiyê bi xizmetê bidim li Kurdistan.tv. Supas jibo wan hevalên ku li vir bi meve mandîbûn û supasiyek taybet jibo Peyama Kurd û hêviya serkeftinê jê re dixwazim.

Em jî supasiya te dikin û pîrozbahiyê li we dikin bi helkefta şehyana we û hêviya jiyaneke pir bextewerî jibo we dixwazin.

Hevpeyvîn: Silêmanê Alîxan

Bêje Diyarbekir - 6-

Selim Çürükkaya

Roj diçû ava. Li salona xwarinê ya mezin, jina wî ya porkin ya ku li gora wî ciwantir xuya dikir, bi fistanekî şîn û dirêj li gel herdû keçê xwe û takekurê xwe amadekariya xwarina şîvê dikirin. Adem li ser maseyeke dirêj û entîke, li beramberî jina xwe rûniştibû. Keça wan xwarin dixist sênîkan û kurê wan jî behsa serpêhatiyên xwe yên dibistanê dikirin.
Keça wî ya mezin Zozan, 25 salî bû. Rûdêna wê giroverî genimî û bejna wê dirêj bû. Porê wê heta bi newqa wê dadiket. Bi vî awahî, di hundirê fistanê xwe yê sipî de, bedewtir xuya dikir. Ew du sal bûn ku li dermanxaneyekê kar dikir û weke herdemê bextewer bû.
Keça wî ya biçûk Berfîn, ji xwişka xwe ya mezin dagirtitir bû, lê ne cangiran bû. Ji sporê hezdikir û li malê jî kincên xwe yên sportif jixwe nedikirin. Li fakûlteya tibê xwendevan bû, lê di çêkirina xwarinê de, ji xwişka xwe jêhatîtir bû. Kurê wî Azad li liseyê dixwend. Ew ji dersên xwe bêhtir, bi siyasetê re mijûl dibû. Ji ber vê yekê ew û bavê xwe gelek caran diketin qirika hev.
Ji binemaleke Kurd û navdar dihat. Bapîrên wî tevlî serhildanên Kurdan bûbûn, lê wî nedixwest xwe nêzîkî siyasetê bike. Li bajarê Diyarbekirê kesekî ku ew nasnekira tune bû. Rewşa wî ya aborî baş bû û ji ber vê yekê pêwendiyên wî berfereh bûn.
Dema ku keça wî xwarin û vexwarinê di sênîkên porselan û îskanên kristal de li ser masê rêz dike, zîla derî lêdikeve.....
Kurê Adem bi lez xwe digihîne derî. Piştî demekê kurik "bavo" dibêje û deng li bavê xwe dike. Adem weke ku bibêje "kîye gelo" li serçavê jina xwe dinere û berbi derî ve diçe.
Pênc polîsên ku dido ji wan fermî û sisê jî medenî ne, li ber derî rawestiyane. Adem hinekî şaş dibe lê bi xwînsarî derdikeve pêş û bi dengekî jixwebawer dibêje "Fermo, hûn li kesekî digeriyan gelo?".
Polîsê medenî yê girs û bejindirêj, bi dengekî sar dibêje, "Ezbenî kincên xwe lixwe ke, hûnê bi me re heta bi qereqolê werin".
Adem gumlekekî sipî û pantorekî qehweyî lixwe kiribû. Yekser vedigere salonê. Keçên wî û jina wî liser piyan bûn û bi meraq li wî temaşe dikirin. Bêyî ku tiştekî bibêje, saqoyê xwe lixwe dike û li jina xwe vedigere: "Ezê heta bi qereqolê biçim û vegerim" dibêje û bi gavên lezgîn ji salonê derdikeve. Jina wî û keçên wî jî heta bi deriyê derve didin pey şopa wî. Kurê wî li ber derî matmayî li bavê xwe yê di navbera du polîsan de temaşe dikir.
Adem, di dawiya çîpekê de dixin navbera du polîsan. Piştî ku erebe ji ber derî bidûr dikeve, çavên wî bi paçekî eskerî girê didin û kiseki dixin serê wî .....

DEM-KURD Kongre xwe ya duwemîn pêk anî



PK - Koordînasyona Komelên Demokratîk yên Kurdistanî (DEM-KURD)di 29-30, 10, 2005 an de li bajarê Duisburgê kongre xwe ya duwemîn pêk anî.

Dem-kurd di 30 meha Hezîranê de li Kölnê hatiye avakirin û xebatên xwe di nav PKE (Platforma Kurdên Ewropa) de didomîne. Dem-Kurd ji rêxistinên Kurdistanî yên demokratîk ku li welatên Ewropa di warên cîhê de kar dikin, pêk tê.

Kongreya Dem-Kurd bi axaftina Serokê Komkarê Fettah Tîmar destpêkir û dû re dîvan hat hilbijartin. Di dîwanê de Ferhat Amedî (Koç-kak), Selam Cizirî (FKKS) û Pirşing Tiwana (FKKS) cîh girtin.

Di vê kongreya durojî de li ser babetên jêrin hat sekinandin.

Agadarî liser rewşa DEM-KURD û PKE û xebata wan ya buhurî.

. Gengeşî liser hûnandina DEM-KURD ê.

. Amadekirina destûrekê Pêşniyar û biryar liser xebata pêşerojê.

Piştî gengeşiyan destûrêk jibo Dem-Kurdê hat pejirandin, çimkî heta niha destûrek Dem-Kurdê tunebû.

Komîta duwemîn ya Dem-Kurdê biryar girt ku komîta rêvebir ya nû bi hemû Komelên Kurd yên mayî ve pêvendiyê deyne. Çimkî Dem-Kurd dixwaze hemû Komelên Kurdistanî yên demokratîk û pîşeyî di nav xebata Dem-Kurdê de cîh bigrin.

Xercî wê kongreya Dem-Kurdê ev biryarên jêrîn girt:

Dem-Kurd li Ewropayê jibo nasandina Kurdan wek netewe û jibo bidestxistina mafên kêmnetewan kar dike.

Dem-Kurd li gor îmkanên xwe hewl dide ku zimanê Kurdî di nav civata Kurdên dîasporayê de (bi taybetî di malbat û komelan de) bê bikaranîn û zimanê Kurdî di dibistanan de wek dersa zimanê zikmakî bê dayîn, li Ewropayê bi zimanê Kurdî weşanên radyo û televîzyonê bên çêkirin.

Dem-Kurd bi giştî piştgiriya doza Kurdistan dike û jibo bidestxistina mafê çarenûsî xebatê dike.

Dem-Kurd jibo wekheviya jin û mêran, mafê mirovan, mafê zarokan û demokratîze bûna civata Kurd û pêkanîna toleransê di nav civatê de , kar û xebat dike.

Piştî kar û xebata durojî jibo Dem-Kurdê komîteyêk karger hat damezirandin. Di vê komitê de ev kes cîh digrin:

Aycan Şermîn Bozarslan (seroka FKKS), Ferhat Amedî (Koç-kak), Fettah Tîmat (Komkar), Kerîm Demîr (Civata Kurd Fulda), M. Elî Amedî (Hevkar-Hamburg), Wek cîgir jî Kenan (Komela Kurd li Norveç), Seyran Duran (Seroka Yekitiya Jinên Kurd-Swêd)

Ew komelên jêr tev li kongreya duwemîn ya Dem-Kurdê bûn: Komkar - Almanya, Komkar-Belçîka, Federasyona Komelên Kurdistan Swêd (FKKS), Hevkar, Komela Kurd li Norveç, Civata Kurd li Giessen, Civata Kurd li Fulda, Koma radyo „Dengê Kurdan li Duisburgê",

Şandeyek PDK jî roja duwemîn wek mêvan beşdarî kongreya Dem-Kurdê bû.

Sûkirin û danesûya kiçê bi rêyên ne dirust û.. encam!

Sabir Berwarî



Helbet genc şengistê avabûna civakane û rûyê geş ê pêşeroja miletan e. Anku her miletekê gencên wî bihêz û xudan îrade bin, ew milet dê beref pêşve çît, bêguman genc wate „kiç û kur" in. Li vêre em dê behsa kiçê bikeyn ku jibo avakirina civakek saxlem ew faktorek serekiye, jiber ku di pêşerojê da kiç dê bîte dayik û guman têda nîne ku dayikê ji babê pitir kartêkirin liser xêzanê heye, bi taybetî ji aliyê perwerdeyî ve. Îca jibo avakirina xêzanek saxlem, girînge destpêkirina jiyana hevjîniyê di navbera kiç û kuran da bi razîbûn bît ne ku bi darê zorê. Li vêre bi kurtî em dê hindek nimûneyên daneşûya kiçê bi rêkên şaş diyar bikeyn..

Yekem; daneşûya kiçê ji biçûkatî, berî ku bayê hez û viyanê bi helkêşît, anku hêşta zarok, malbata wê dê wê digel yekî dî bêjin (dê dene şû-zewac), ev çende jî bi taybetî di nav „dutmam û pismam" da heye, bêy ku hizra hindê biken ku erê dema ev zaroke mezin dibît dê bi hevjînê xwe razî bît yan ne! û eger ew kiç mezin bû û razî nebû, malbata wê dê zoriyê lê ken û bêjinê; me axiftina xwe ya gotî û nabît tu axiftina me li erdî bidey! yan dê bêjin eve wesyeta filaniye û divêt bicîh bihêt! û li def wan xem nîne ku kiçek belingaz bibîte qurban.

Duyem; daneşûya kiçê bi pêguhorkanê (berdêlî -jin bi jin), eve jî di nav civaka me da mişeye, lê bi dîtina me tiştekî bi sanahî nîne ku çiwar dil bibin yek û eger hemû alî jî razî bûn, her dê arîşe hebin, çunkî bi gorey têgehiştina wan kesên ku pêguhorkanê diken, pêwîste ji hemû aliyan ve wekhevî di navbera wan da hebît. Gelek caran me guh lê bûye yekî jina xwe berdaye, yê beramber jî hevjîna xwe berdaye!.

Sêyem; daneşûya kiçê jibo pêkhatina xwîndariyê, eve di wê demê da çêdibît dema du aliyên xwîndar li hev diken ku aliyek kiça xwe bidete aliyê dî, helbet bêy wergertina rezamendiya kiçê.

Çiwarem; daneşûya kiçê bi nextekê giran, eve jî hindek kes jibo meremên xwe yên taybet kiça xwe yan xuşka xwe dikene qurbana hindek paran, pitiriya caran jî ew kesê kiçkê dixwazît bi temenî gelek ji wê mezintire.

Pêncem; Kiç bi xwe hevjînê xwe di helbijêrît bêy ku wî nas biket û jibo kiçê ev renge şûkirine ji hemûyan nexweştire, çunkî ew bi xwe biryara xwe didet, îca neşêt gazinda jî biket û eger hizr û bîrên wan ne wekhev bin, wê demê dihev nagehin û arîşe dê di navbera wan da çêbin, jiber ku tiştê herî girîng di hevjîniyê da yekgehiştine.

Belkî mirov bişêt bibîte qareman û navê xwe li berperên dîrokê tomar biket, lê gelek bi zehmete kesek bişêt hest û heza kesekî beref aliyê xwe bînît, bo nimûne 'Napilyon' dunya hejand û gelek beşên wê dagîrkirin, lê ne şiya dilê dildara xwe dagîrbiket. Îca bila em sûdê ji vê wergirîn û zoriyê li kiçê nekeyn, çunkî li pêşerojê zor encamên negatîv diyar dibin, li vêre em dê bi kurtî çendekan rêz keyn..

Yekem; avabûna xêzaneka pirî arîşe, û nexoşî dê bine beşek ji jiyana rojane ya wê xêzanê û zarok jî dê tûşî nexoşiyên derûnî bin û rêka dizî û karên xirab bigirin.

Duyem; pitiriya wan afretên ku xwe dikujin bi van rêkên lî serî me diyarkirîn şûkirîne û li dûmahiyê bê omêd bûyne û çi rê li ber wan nemayne, îca xwe dikujin!.

Sêyem; gelek ji wan jinên ku bi zorî şûkirîn, jibo tolvekirinê berê xwe di dene karên dehmenpisiyê, çunkî li def wan jiyanê çi buhayek namînît û tinê hizra wê li tolvekirinêye bi her rêyekê bît.

Çiwarem; Gelek ji wan afretan xwe didene berdan û li hemû deman jî zarok dibin qurban!.



Jinekolog, mêrekolog, dînekolog. Prof. Dr. Fatê Were Civatê

Şêxbat

Xaltika Fatê, nizanim haya te jê heye yan na, lê evî malxirabê Şûjino di malpera xwe de tofana bêbextiyê aniye serê te haa! Hema rahiştiye meqes û derziya xwe, hem çirandiye û hem jî dirûtiye. Ma îşê bêbextiyan li te rebena xwedê dike, heçê nizanibe wê bê qey rast e. Dibêje "Fatê ji xwe re li mêran digere, di nav Kurdan de mêr nedît îcar terk û dinya bû". Herweha dibêje "Fatê çûye cem Lenîn û Lenîn ji pesnê Şûjino daye". Bi xwedê ez bixwe bawer nakim! Ez dibê heye tuneye hesûdiyê li serê Şûjino daye û ewî çavê xwe berdaye te, te go çi? De ka zû bersivê bide yan ezê ji qehra biteqim haa!

Şemdînê Xincersor / Alamanya

Lao Şemdîno, birastî ez zêde serê xwe bi derzî û şûjinan naêşînim, ew jibo dirûtina telis û çewalan başin, carna jî meriv pê kurtanê keran bidrû başe. Ê lao piştî ev înternet derket û Kurd û teknîk bûn destebirakên hev, îcar Kurd kirin mirîd û kolên xwe û ew ji mêranî xistin, xesandin! Jiber vê xesandina înternetê min mêrekî qirase di nav Kurdan de nedît û ez mam bê mêr. Lê piştî go şiret û narkotîka qelema min fêde li însanan kir, îcar serokên dewletan ketin dora xwestin û zewaca min. Jiber vê jî Şûjino hesidî û got "weyy, bi xwedê heger ez bêbextiyekê nexim stuyê vê qehpika Fatê, ewê ji destê min bireve û ezê jî bê jin bimînim, jixwe jinek tenê têra min nake!" û dest bi nivîsandina "fitnenameya" xwe kir. Ma qey ev cara pêşîye? Na! Şûjino darkê hewdelê ye, 15 dîplomên şorbeçêkirinê stendine, bi 40 zimanê fitneyî dipeyive û kelbetanê hesûdiyê di destê wî deye û hema pê diranê xelkê radike. Ji simbêlên xelkê diheside, xwe bi wan ve dadiliqîne û tayo tayo wan hildike! Ê lao Şûjino, serperityo, tu bi kêr bihata û te nehişta Fatê li mêran bigere bavê min! Fatê welatparêze, deryê Fatê vekiriye, lê gava tir di qûna we de nemabin û hûn nikaribin xwe liber derbên Fatê bigrin ma sûcê kê ye? Fatê ne ya "nermik û germika"ye. Fatê bi derzî û şûjinan têr nabe bavê mino, rahijin xencera xencer!

Te go Lenîn? Erê wey, min Lenîno jî dît, di mûzelînê xwe de lêkolînekê liser "Derzî çawa dibe Şûjin" çêdike û wê lêkolîna xwe pêşkêşî Sosyalîst Înternasyonalê bike. Lenîn digot "kuro ev Şûjinkê me newilo bû bavo, ev çi hatiye serê wî hevalê kominîst? Ez dibê heye tuneye tifinga wî zingar girtiye û fişekên wî qelp dikin!".

Îcar qurban, deryê Fatê vekiriye, heçê bi doxîna xwe bawer be bila kerem bike dîwana Fatê!

****

Fatê Xanim, ez bi navê Dewleta Elokan "Turkey" vê nameyê dişînim û hêvidarim tuwê şêwirmendiyekê baş ji me re bikî. Serok Bush ji Barzaniyê "Serokeşîr" re gotiye Mr.President! û gotiye "weyyy, ev şal û şapik çi xweşikin, yekî ji min re ji çêkin ezê di Roja Netewî de lixwekim!" Ma çima ji Serokê me Kerdoxan re nabêje Mr. President?" Ma ev wijdane? Ka demokrasî? De haydê de, zû stuyê xwe bişkîne û aqilekî bide me!

Nermik K. T. Berdevkê Dewleta Elokan/ Turkey

Lao Nermiko, çîçikê Elokê, ker kurê kerê, ma meriv ji Serokê Dewleta Elokan re dibêje Mr. President oxlim! Pir pir mero kare bêje "Mr.Turk, yanî Mr.Elok!" Ê oxlim, ma Serokê we Kerdoxan ne torinê Atavirqê Qûnde ye? Belê! Serok Bush dizane heger ji Kerdoxan re bêje "Mr.President" ewê jî wek Atavirqo bibe "nêrûmê"û zilaman bera ser xwe bide. Serok Bush Serokan û Elokan baş nasdike bavê min, mêrxasan nasdike, dizane go Barzanî kurê ciwamêrane, dostê dostê xwe ye, wek Atavirq ne kurê Zubeyde xanima Selanîkî ye! Qet meraqa nekin, heger we rojekê Presîdent Bush bi şal û şapikên Botanî dît qet şaş nebin haa! Bi saya President Barzanî û projeya Serok Bush, bixêr emê çareseriyekê ji pirsgirêka Dewleta Elokan re bibînin. Tu dev ji Serok Bush berde. A baş emê Mam Celal bişînin ser Dewleta Elokan û bila reçeteyekê baş ji elokên we re binivîse!

Te fêmkir Namiqo? Elok kurê Elokê!

fate@peyama-kurd.com

Çengelpirs

Liser bênderê pê pûş tê hûrkirin	Qeder, wextê mirinê	Navekî mêran		Kirê kir, deman kir		Bênamûs, bê ar Başe, pake	Siyasetmedarê li wêne		Hejmarek	Vîn, kesayet	
							Malbata mezin				
Saziya ewlekariya Amerîka				Mazata karên mezin, berberî						Zimanekî Ewrûpî	
Bi Erebî „Kurd"						Dibistan, stîl, rê	Jêhatî, zîrek				
				Rengek	Wezîfe, pêrabûn				Bi Erebî „na"		
Mam Celal pir ji wan hezdike	Destnîşana kesê sêyem	Welatek cîranê Kurdistanê Damar, reh					Têgihiştin				Lê flîm tê temaşekirin
					Dînî, bi olê ve girêdayî				Di lîztikê de hejmara yek Kurtiya Okey		
Serserî, bêkar Genim lê hûr dibe			Pantolon, derpî Tîpa dehem				Ne tarî, ruhnî				
				Teref, hêl, navekî mêran	Sebzeyek bi bêhn	Lê, feqet Xwarina heywanan					
			Teng, zehmet, dorgirtî				Pronavê yekem		Kurtenivîsa Doktor	Kesê yekem	
			Parçe, gep Aletek muzîkê					Wext, kat, zeman			
						Birêz, Mîster, qedirbilind					



Remildank

Beran (21.03-20.04)
Di serê we de gelek pirsgirêk hene lê hûn jî nav dernakevin. Serê xwe zelal bikin, ronak bin.

Gamêş (21.04-20.05)
Rê liber we ye. Rêwîtiyek bi xêr û bêr e. Ji xwe haydar bin û malbata xwe jî bîr nekin.

Cêwî (21.05-21.06)
Mêrxasî ne karê herkesî ye. Xwîngermî hemi caran ne baş e. Bêhnfirehî û aramî derman e.

Kevjal (22.06-22.07)
Navbera xwe û hezkiriyê/ya xwe xurttir bikin, di a hev debin û guh nedin xêrnexwazan.

Şêr (23.07-22.08)
Nankor pir in, hinek navbera we û malbata we tev didin, xwe bihûnin û rê nedin wan.

Simbil (23.08-22.09)
Dost hene û dostik hene. Dost hevalên rojên teng in, dostik hevalên gep û kevçiyan e.

Mêzên (23.09-22.10)
Di rewşa aborî de firehiyek dixuye, destê xwe li perê xwe bigrin. Kesî kesan tuneye.

Dûpişk (23.10-21.11)
Di rewşa malbata we de guhertin çêdibin. Mizgîniyek xêrê rewşa malbatê germtir dike.

Kevan (22.11-21.12)
Vê heftê kêfa we li cî ye. Dilê hezkiriyê/ya xwe nehêlin. Xwe ji stresê bi dûrbixin.

Kovî (22.12-19.01)
Hûnê têkevin nav civatek biyanî û derûdorek nuh binasin. Li xwe haydar bin û xwe winda nekin.

Satil (20.01-18.02)
Çavên derûdorê liser we ne. Hûn tên pesinandin. Kar û xebata we bala gelekan dikşîne.

Masî (19.02-20.03)
Tenê nemînin, mirovê tenê wek masiyê bê av e. Xwe ji civata xwe bi dûr nexin.Dilfireh bin.

Pêkenok

Jixweberdan

Kurê Evdo kamil bibû, xort bû. Her roja xwedê diçû bin nêrdewanê û jixwe berdida. Evdo û jina xwe xwestin wî ji vî halî xelaskin û jêre jinekê bînin. Jêre keçek xwestin û lê mehr kirin. Adinî rojê Evdo xwest serdana wan bike û li halê wan bipirse. Evdo nerî wa kurê wî dîsa li bin nêrdewanê jixwe berdide. Evdo hêrs bû:

- Kûçik kurê kûçik, me ji tere jin ji anî ma tu nîha ji jixwe berdidî?

Kurê wî bersivê dide:

-Yabo, ma ez çi bikim lo, destê jinikê qerimî haa!

www.arsiv.org

Dêra Surp Giragos li hemberî dîrokê liberxwe dide





Ev 5000 sal in ku Diyarbekir weke cî û warê jiyanê tê bikar anîn. Dîrok, ne bi tenê li derdora lehengan, lê ew her wiha li derdora cî û warên jiyanê bipêş dikeve û dijî. Diyarbekir yek ji wan bajarên cîhanî ye ku bi mîrata xwe ya dîrokî şanaz û serbilind e. Ezê di nivîsara xwe ya vê carê de, behsa dîroka dêra Ermeniyan ya bi navê Surp Giragos û berxwedana wê ya li hemberî dîrokê û tevkujiyan bikim. Dêra Surp Giragos li Amedê li taxa fatih paşa, li kolana penaber (göçmen) cî digre. Ew li cîhanê tevî, yekemîn dêra Ermeniyan ya bi 5 Xorana ye. Navê dêra Surp Giragos cara yekemîn di gernameya Simeonê Polonî de derbas dibe ku ew di navbera salên 1610- 1615 de pêk hatiye. Ev gerok dibêje ku dêra Surp Giragos dêreke mezin, bi hêbet, kevnar û bi 5 mihraba ye. Dîrokzanê bi navê G. Inciciyan di navbera salên 1758-1833an de li ser erdnîgariya Asya berhemek bi navê Nor Hayasdan nivîsandiye û di wê berhemê de behsa dêrê dike û wiha dibêje, "Di sala 1515 yan jî 1518an de dêra Surp Teotoros kirine mizgeft û piştre di nava goristana dêrê de dêreke nû hatiye avakirin. Dîroka avakirina vê dêrê ne diyare lê ew xwediyê 7 mihraba ye. Navê vê dêrê, di qeydên fermî de weke "dêra biçûk" derbas dibe. Di dawiya sedsala 18an de jora wê darîn bû. Di hinek kîtabeyan de tê gotin ku ev dêr di sala 1722an de hatiye mezinkirin. Dêr ji aliyê mîmarên weke Şahin, Seroxan û Yerem ve di sala 1729an de ji nû ve bi berferehî hatiye avakirin. Dîroka avakirin û nûkirina dêrê li ser neh kevirên kîtabî hatiye nivîsîn û ev kevir li rojavayê dêrê, li ser dîwarên hundirîn yên kîtabeyên derve hatine danîn.Keşeyê bi navê Savars Balîmyan yê ku di sala 1662an de serdana dêrê kiriye, ew nivîs xwendine. Dêr di 10ê Hezîran 1881an de bi temamî şewitiye û ew piştre di sala 1883an de ji nû ve hatiye avakirin. Ev dêra ku di sala 1890î de hatiye tamîrkirin, di Yekemîn Şerê Cîhanê de weke biryargeha sûbayên Alman hatiye bikaranîn. Di sala 1915an de birca wê ya can ya kagir, bi awayekî ku nayê zanîn hat hilweşandin. Di roja me de li şûna birca can, birceke darîn heye. Dewleta Tirk ew dever weke depoyeke leşkerî û weke depoya paçên Sumerbankê bikar aniye. Ew birc piştre careke din teslîmî komika Ermenî kirine. Di sala 1662an de keşe Balimyan li dêrê 6 Qendîlên zîvîn yên ku dîrokên weke 1670-1808-1827-1855-1865-1870-1884 li ser wan hatiye neqişandin dîtine. Di sala 1988-1989an de jora wê ya darîn hilweşiya. Ji ber vê yekê hundirê wê tije ax bû û ew êdî weke perestgehekê nehat bikaranîn. Lê belê ji berê ve li derdora dêrê sapeleke metrûk hebû û ewder hîna jî weke perestgehê tê bikar anîn. Dêra Ermeniyan ya bi navê Surp Sarkîs jî di roja me de weke depo tê bikaranîn. Di dema Împeretoriya Osmaniyan de hikûmeta Jön Turk di sala 1915an de li Kurdistanê tevkujiyeke mezin li hemberî gelê Ermen pêk anî û zêdetirî milyonek mirov kuştin. Wê demê piraniya Ermeniyan li bajarên Kurdan dijiyan. Tevkujiyê derbeyeke giran li pêşketina karên destî xist û di aliyê bazirganî û çandiniyê de jî bû sedema paşveçûneke mezin. Ji 36 dêrên ku li Diyarbekirê hene, di roja me de bi tenê 2 weke dêran têne bikaranîn. 29 dêr bi temamî hilweşiyane û 5 jê jî li ber hilweşanê ne. Zemanê berê dengê azana minareya çar pê û dengê zengilê dêra Surp Giragos tevlîhev dibû. Ew deng êdî wenda bûye.Anton hosteyê ku li odeya kêleka dêrê dijiya û mazûbaniya mêvanan dikir jî êdî ne li wir e. Ew jî li Stenbolê di nexweşxaneyekê de şerê man û nemanê dide. Divê herkes ji bo jiyandina vê dêra li Kurdistanê tiştekî bike, yan na ewê Surp Giragos jî weke dêrên din bibe dîrokeke wendabûyî.





www.arsiv.com

Zelal



Navenda Zelal

Liza GmbH
Köpenicker Str.
22-25
D-10997 BERLI N
Tel: 030 390 380 30
Fax:030 390 380 84

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH
Hamburg
Tel.: 040 723 402 96

AKCAN 2
Bremen
Tel.: 0421 691 96 78

CAN GETRÄNKE
Essen
Tel.: 0201 289 74 17-18

CAN GmbH 2
Köln
Tel.: 0221 37 79 408

ESD Softdrink GmbH
Mannheim
Tel.: 0621 318 76 70

LIZA GmbH
Berlin
Tel.: 030 61 62 98 11

TRINK-One
Düsseldorf
Tel.: 0211 15 79 881

TRINK-SEM
Dortmund
Tel.: 0231 981 86 23

Bîranînek ji Ermenistanê -5-

Pîrkemal



Ev nêzîkî deh rojan bû ku em li Ermenîstanê, di nav Kurdan de bûn. Bi taybet germî û mêvanperweriya malbata Cemal Cindoyan û hemi dostên derûdorê em kiribûn wek kesên ji malê û destê me ji hev nedibû. Lê roja xatirxwestinê nêzîk dibû, em mecbûr bûn ji hev biqetin û bi dilekî xemgîn hevdu bi tenê bihêlin. Êvara ku sibê emê biçin hema bêje dilê me hema şikestî û bi xemgîn bû. Ne destê dostên me ji me û ne jî destê me ji wan dibû. Xemgîniya Cemal û Nazê Cindoyan di çavên wan re xuya dibû. Nêzîkî deh rojan bû ku em di nav çavên wan de, wek zarokên malê diçûn û dihatin. Cemal û Nazê jî wek dê û bavekî em xwedî dikirin û li me miqate bûn. Lê mixabin, wek çûkên go bi firê kevin û ji hêlîna xwe bifirin, dema fira me û terka hêlînê hatibû û emê serê sibê zû bi maşotgeyê (mînîbus) biçûna gundê Riya Teze û ji wir jî meyê berê xwe bidaya Tiblîsê, paytextê Gurcîstanê.

Sedema çûna me ya gundê Riya Teze dîtina dibistana Kurdî bû. Ev jî liser daxwaza Aslanbeg hatibû rojevê. Aslanbeg Kurdekî pir zimanxweş, qedirşînas û navdar bû. Ew li Ermenîstan û welatên derûdora wê wek "Şêrê Kafkasya" dihat naskirin, hesabê wî dihat kirin, dihat hezkirin û Kurdekî qedirgotin bû. Wî dixwest em dibistana gundê Riya Teze, Mamostên Kurd û şagirtên dibistanê binasin û rewşa wan bi çavên xwe bibînin.

Em serê sibê zû rabûn. Wek hercar xanima destxweş û mêvanhez Nazê Cindoyan taştêya me danî ber me û me taştêya xwe ya talî li vê malê, li hêlîna xwe xwar. Piştî taştê êdî bi dilekî xemgîn, çavekî melûl û bi kelegirî me xatirê xwe ji xwîşka Nazê xwest û em daketin bajêr, pageha maşotgeyan. Me yeko yeko xatirê xwe ji dostên xwe xwest, em li maşotgeyê siwar bûn û me berê xwe da gundê Riya Teze, gundê Aslanbeg, Şêrê Kafkasya..

Em li gundê Riya Teze peya bûn. Piştî xêrhatinê Aslanbeg sererast berê me da dibistanê. Dibistan bi rengê spî boyaxkirî bû. Navê "Emînê Evdal" lê hatibû kirin. Emînê Evdal nivîskar û zanyarekî Kurd e. Eminê Evdal di sala 1906 an de, li gûndê Emençayîr, li Qersê, li Bakurê Kurdistanê hatiye dinyayê û di sala 1964an de li Ermenîstanê çûye ser dilovaniya xwe. Jiber zordariya Osmaniyan malbata wî dest ji welêt berdabû û li Ermenîstanê bicîhbibû. Midûr û Mamosteyên dibistanê hemi Kurd bûn,bi dîtin û naskirina me kêfxweş bûn û em li sinifên dibistanê gerandin. Dibistan têra xwe mezin bû, hetta salona wê ya sporê jî hebû. Lê mixabin ew salona sporê şût û rût bû û tu aletek sporê têde tunebû. Jiber tengasiya aborî û derfetên kêm wan nikarîbû ji salona xwe re aletên sporê bikirin. Ne tenê aletên sporê, hema bêjin hewceyiya wan bi hertiştî hebû. Aletên sporê, mase, kursî, alfabe, pênûs û bi dehan tiştên din. Lê bi ser ewqas kêmasî û bêîmkanan jî Mamosteyên Kurd bi helwestek xurt liberxwe didan û zarokên Kurdan hînî xwendin û nivîsandina Kurdîya latînî dikirin. Wek hemi gazindmendên ku me dîtin, gazindên Mamostên vê dibistanê jî ji tunebûna materyalên dibistanê bûn.

Li bexçê dibistanê heykelê (peyker) Emînê Evdal hatibû çikandin. Herweha di ketina hindur de jî sûretê (wêne) Emînê Evdal hatibû daliqandin û xuyabû ku Mamosteyên Kurd qîmetek mezin didan nivîskar û zanyarên xwe. Ev jî ciyê şanazî û kêfxweşiyê ye. Li dibistana gundê Riya Teze ne tenê derzên zimanê Kurdî lê herweha derzên zimanê Ingilîzî, Fransî û Almanî jî dihat dan. Herweha ji derzên zanyariya Kîmya û Fîzîkê bigrin û heta bi gellek derzên din di bernama vê dibistanê de hebûn. Evê jî nîşan dida ku Mamosteyên Kurd serê xwe bi zarok û şagirtên xwe re diêşînin û dixwazin wan jibo nûneriya pêşeroja milletê Kurd re bikin namzet.

Birastî herçiqasî em ji rewşa aboriya wan a nebaş û kêmderfetiya wan xemgîn û dilêş bûn jî, lê piştî me fedakariya van Mamosteyên hêja dît, em bi dilekî rehet ji dibistanê derketin. Ez bawerim, heger di mirov de fedakarî û baweriyek xurt hebe, derfet û îmkan çiqasî kêmbin jî, meriv wê biserkeve û bigihê armanca xwe. Mamosteyên vê dibistanê jî wek hemi Mamosteyên gundên din hêviya alîkarî û destdirêjkirinê ji Kurdên li Ewrûpa û Kurdistanê dikirin ku ji wan re alfaba Kurdiya latînî û materyalên dibistanê bişînin. Em jî bi riya vê nivîsê hêvî dikin ku wê Kurdên li Ewrûpa û Kurdistanê brayên xwe yên li Ermenîstanê û yên li seranserê Kafkasyayê jibîrnekin û destê alîkariyê dirêjî wan bikin.

Bi xweşî û nexweşiya xwe, bi kêf û xemgîniya xwe em ji gundê Riya Teze veqetiyan. Aslanbeg bi trimbêla nasekî xwe em bi rê xistin û me berê xwe da Gurcîstanê.





Derheqî Iraq de vînayê Kurdan: Mesûd Barzanî





Hefteyî ku viyertî Iraq de hîrê hedîseyî muhîm bî. 15î oktobre de referandumî destûrê Iraq viraziya. Iraqijan îta de waşteyî xo yo awankerdişî demokrasî û newera awankerdişî welatî xo nîşan da.

Di rojî cuwa pey miletê mi re mehîtî 500 kesan yew mezelî başûrî iraq re ameyî kurdistan. Serranî 1980 de netîceyî kampanyayî Anfal 182 henzar kurd amebi kiştiş. 1983 de kampanî BAAS de 8000 merdimî mi bibî vîn. Înan re 7500 kesî hama zi vînbiyayeyî.

19î oktobre de penî de Sedam Husên veciya mehkima.

Nê biyayeyan re qet yew zi bê operas yonî amerîka nêbinî. Kurd zi ortaxî nê opreasyonî ye. Hêzanî çekdar ê amerikaya pey peşmergeyî ma hêzo didin bi. Ewro hêzî emniyetî kurdistan hezî en muktedîr û mutefîkî emîn ê amerika yê. Ma her tim bi amerîkaya piya xebitiyayî û xo resna hevwelatiyanî xo. No qede ma ortê prosesî siyasî de ca girot. Armancî no prosesî yewbiyayiş, demokrasî û konsesus o.

Verî her çî tekoşînê ma ha rûmena, çimkî ma zi sey amerîka wazenî ke iraq verdşuero û ê felaketanî ke cuwa ver şarî iraq ciwiyawo, ê felakêt hêna miyerî ma serre. No rid re ma polîtîkaya netewî û îdarê iraqa alaqadar benî. Zafê kurdan leşkeriya iraq de ca girot. Ma zaf fedakarê kerd.

La hanc zi kurd sey seperatîst amê sucdarkerdiş û sebeb ke kurd bin destî, herkesî pê kurdan biyeqûnî kerd. Çimkî o qede ame bawer kerdiş ke kurd wazenî xoser bî. Yew sebebo bingehîn zi şovenîzm a. na şovenîzm zaf rengê, zaf netewetiye rojhelatabênatîn qebûl nêkena, cemaatî rojhelatabênatîn homojen qebûl kena. E ke qûrbananî iraq bi qusir vînenî, ê fehm nêkenî ke kurd zi sey piyerê iraqijan huzur û emniyet wazenî. Kurd wazenî teroro vêrîn re bixelisî. 80 serro ke kurd kurdan ser yew polîtîkaya pakkerdişî etnîkî û qetlîam ha rûmena. Kurd pragmatîst û nemir î. Ma zûnî ke heqî ma estî, la ma zûnî ke mesuliyetî ma zi estî. Ma welatheskerdox î, ma ê rasîst nê ke xo çînekenî. Ma 2003 de bê şert û şûrt konseyî hukmatî iraq de ca girot. 14 serriyo ke ma zaf rengê, zaf miletê, zaf dîniyê qebûl kerda. Ma wazenî ke piyerê gelî rojhelatabênatîn ziwanî xo dinî xo û miletbiyayişî xo azad biciwî.

Iraqo newe de menfaatî kurdan proseso siyasî ê verdşiyayiş û newe ra awan kerdişî iraq de esto, çimkî kurd neheqiyanî wexto viyerte qet xo vîranêkenî. No rid re zi kurd no proses de rolî yew pirt kaykenî. Kurd ê ereban ke erdî înan işqal kerdo, înan re nefret nêkenî. Piyerê iraqijî demokrat zûnî ke encax eşkenî xeletiyanî ke cuwa ver bî, bi edalet û piyaameyiş bênate ra wedarî. Agêrayişî kurdanî Kerkûk û bedeviyan hendê mehkimakerdişî Sedam mûhîm o. Bi mîlyonan iraqijan ke semedî destûra ray dayî, înan terorîzm red kerd. Ê nêbî ortaxî fantaziye terorîstan ke wazenî iraq de yew xerbî zerrî veciyo.

Amerîka tim û tim bawer kerd ke iraqij wazenî demokrasî awan bikerî. Ma piyer bawer kenî têna bi demokrasî pers eşkenî biyerî çarekerdiş. Têna demokrasî gueş dana gerre û gazî şar.

No xerb de kurd dostî amerîka yê.

Açarnayox: Seyîdxan Kurij

Çime: The Washington Post

Silêmaniye de festîvala yewin ê peşmergeyan viraziyay

Silêmaniye - 25î oktobre de Silêmaniye de bi hedrebiyayişî serekî hukmat û temsîlkarî serekkomar Celal Talabanî festîvalê hpeşmergeyan viraziyay.

Festîvalê peşmergeyan fermandarî hezî pêşmerge û wezirtiye kar û barî pêşmerge organize kerd. Na festival de serekî hukmatî Silêmaniye Omer Fettah, temsilkarî birêz Talabanî Mehmûd Sengawî,waliyî Silêmaniye Dana Ehmed Mecîd, waliyî Kerkûk Ebdulrehman Mustefa, temsîlkarî KDP Zeym Elî Nûnerê û temsîlkaranî partî û rexistinanî siyasîyî kurdistan hedre bî.

Festîval bi wendişî sirûda mîllî Ey Reqîp dest ci kerd û bacê endamî komîteyî festival Lîwa Kemal Şakir qisêkerd. Birêz Mehmûd Sengawî zi îta de qisêkerd. Sengawî peşmergeyanî kurdistan qez yew roj zi meydanî ceng de tepiya gam nêeşta û her tim verba îşagalciyan xo verdawo, va.

Cuwea pey peşmergeyan çend çalakiyî spor û çalakiyî hêzanî cîniyan nîşandayî. Pênî de bi name Birêz talabanî û komiteyî festival xelat amê vilakerdiş.





Selim Çürükkaya

Ma piya çî werdib

Aroj mi rojname de wend, Meletî de yew halînî qicanî yetiman de maliman felek ardî qican ser.

Polisan îfadeyî qicanî girot.

Qicî vûnî: Malimî tim-tim ma kuenî, serranî ma dûnî piyer, pê çuweyanî asninan dûnî ma re.

Ma giy xo verd, ey giy ma dûnî ma werdiş.

Wext ke mi nê îfadeyî wênd, hepisxaneyî Diyarbekir ûme mi vîr. Ûca de zi eskeranî tirkan giy deyn însanan werdiş.

Yew şew mi û Heyder Dizlekî ma hucre de giy werdiş ra xeber deyn.

Heyderî va: Nê tirkî no qeyde dewan de, meteban de, eskeriya de giy dûnî ki werdiş.

Mi va: Eskeriya de zi no gure est?

Ey va:

Ti gueştarî bikerî, ez to re vacî; „Yew Wunijî ma şino esker, o yew şew beno nobedar.

O nobet de wazeno ke giy xo bikero, o tifingî xo cey nobet de verdeno û şino bin yew dar de nişeno.rue. Yew zabît yeno, o vîneneo ke yew tifingo bê wahar ho ûca de o.

Zabît vûno: Lacî hêr ti he kam ca de ê?

Wunijî ma timnanî xo ûnceno we, zabît ey vîneno.

Zabît tifingî dareno ci, vûno: Giy xo buri!"

Wunij vûno: Giy nêweriyeno, willay tirşo.

Zabît vûno: Nê ti nêwerî, ez to kişena

Wunij ma tay weno û tifingî xo zabît ra geno.

Zabît vûno: Hêna ti no qede bikirî, ez to geber kena.

Zabît paştê xo xarneno, wazeno şuero, Wunij vûno: Windir!

Zabît vûno: Ez zabîta lacî hêr, bo ez to kişena

Wunij vûno: Ti zi buri, ti nêwirî, ez to kişena û ez vûno ke ame cayî nobet, mi hire ray parola waşt, la ey parola raşt nêva, mi o kişt.

Zabît ewniyeno ke o raşta ey kişeno, yew engişt ze o weno.

O Wunic ra vûno: Bo ti çew ra vacî, wilay ez to kişena

Wanij vûno: Willay ti çew ra nêvacî, ez çew ra nêvana.

Hîre aşm ra pey Wunij semedî yew gureyî xo ya şino yew wade, yew zabît ti ra vûno:Lan Kurt, to ez sinasnaya?"

Wunij binê wiyeno vûno:

E, Ma piya çî werdib

Çadirî binî vor de mendî



Kaniya Reş - Kaniya Reş de çadiranî banlerzî binî vor de mednî. Se ke yeno zûnayiş emser aşmê edar de Kaniya reş de banlerz bî. O wext ke zafî key eke banî înan riciyayî, çadiran de mûnenî. Çend rojî cuwa ver vor varay. Zafê nê xadiran binî vor de mendî. Înan ke çadirî înan binî vor de mendî, mecbur mendî şî binî bananî xo yê xirabeyan. Înan bi zehmet eşyayî xo binî çadiran re vet û nika bananî xirabeyan de bi heywanana piya ciwiyenî. Şarî Kaniya Reş vûno, dewlet ma re ardim nêkena, ma mecmûr mênd şî binî bananî xirabeyan. 8 aşmeyo ke ma hê xadiran de ciwiyenî. Dewlet heta nika 30 ban nêviraşt. Dewlte bi trîlyonan perê şawena
Endonezya û Pakistan, la ma re banan nêvirezena.

Kaniya Reş de lez lez elektrîk biryenî



Kaniya Reş -Navçeyî Çolîg Kaniya Reş de hend zaf elektrîk biryenî ke şarî îtay eciz beno.

Serekî odeyî hûnerkar û esnafan Ali Bingöl vûno, ma her zimistan îna lez lez elektrîk biryenî. Nê 20 rojanî peyînan hanc lez lez elektrîk biryenî. No rid re heta nika keyeyan de zafê hacetî bi ceryan vêşayî. Rid biryayişî elektrîk re esnaf nêşkenî dikananî xo akerî. Şarî Kaniya Reş wazeno ke hin na persê biryayişî elektrîk biyero çarekerdiş.

Bahram Qûbadî yew fîlma newe ûnceno



PK - Rejîsorî kurd Bahman Qubadî ke fîlmanî ey festîvalanî enternasyonal de zaf xelat girotî,nika ho kurdanî bakûr ser yew fîlm ûnceno.

Fîlma Qubadî a peyîn „ Kesê zi eşkenî firdî“ zaf xelat girotî û zaf amê heskerdiş.

Mesûd Barzanî xoserbiyayiş heqî şarî Kurdistan o



Londra - Serekî kurdistan Mesûd Barzanî 1î teşrîn de londra de serekwezîrî brîtanya Tony Blair`a amê piyehet.

No piyaqisêkerdiş de Tony Blaîr va, kurdistan semedî iraq`a eşkeno yew model bo, la terrorist ke sîvîlan kişenî verba demokrasî ase yî. Mesûd barzanî zi Tony Blaîr re waşt ke destekî xo semedî prosesa siyasiya dom bikero.

Serekî kurdistan Mesûd Barzanî, Nêçîrvan Barzanî û Berhem Salih 30î oktobre de Londra de bi kurdistanijana yew kombiyayiş viraşt.

Mesûd barzanî îta de behsî halî kurdistan û iraq kerd û gerayişî xo yê amerîka ser agahdarî da hedreyan. Mesûd Barzanî ameyê Kurdistan ser zi vindert û va, heqo tabî ê şarî kurdistano ke çarçeveyî yew dewleta xoser de biciwiyo.

Serekî Kurdistan û heye tî kurdan hefteyo vêrîn zi amerîka de bî. 26î oktobre de Serekî kurdistan Mesûd Barzanî û wezîrî teberî ê amerîka Condoleezza Rice amê piye het. Her di per prosesa siyasî ê iraq bi taybetî zi ê Kurdistan ser vindêrt.

Serekî kurdistan Mesûd Barzanî û wezîrî xopawitişî amerîka Donald Rumsfeld 27î oktobre de yew bînan dî. Înan halî iraq û Kurdistan ser û çarekerdişî persê emniyet ser qisêkerd. Hanc eynî roj de Mesûd Barzanî koşka sipî de bi cagirotê serekî amerîka Dick Cheney`a yew kombiyayiş viraşt.

29î octobre de Zanîngehî amerîka ê Washington xelatê aştiyê pêşkêşî serekî kurdistan Mesûd Barzanî kerd.

Serekî kurdistan Mesûd Barzanî merasîmê xelatdayiş de hîsî xo îna ardî ziwan:

Ez na xelat sey yew xelatê semedî şarî kurdistan û xebatê şarî kurdistan û peşmergeyanî kurdistan qebûl kena. Ez na xelat bi şeref gena û bena dûna şarî kurdistan.

Kurd, alman û cuhî piya verba antî-semîtîzm veciyenî



Berlîn - Hefte kû viyert Berlîn de cmeaatî kurd, alman û cûhî (yahudî) piya verba rojî Al Quds çalakî viraşt.

Îslamîstî her serr roja îne yo peyîn ê aşmê remezan de verba cuhiyan û demokrasî yew mîtîng virazenî. Emser roja îne yo ke viyert hanc înan nimacî îne ya pey yew mîtîng viraşt û îta de verba cuhiyan kîn û nefretî xo ard ziwan.

Verba na çalakî demokratanî kurd. alman û cemaatî cuhiyan yew şiyayiş viraşt. No şiyayiş de serekî yewbiyayê sendîqayanî almanya –DGB Michael Sommer, serekî partiya Keskan Reinhard Bütikofer û zafî parlementer û şexsiyetî sinasnayê bî.

No şiyayiş de qisêkerdoxan tewra serekkomarî Îran Ahmedinecad ê verba îsraîl protesto kerd. Ahmedînecad çend roj cuwa ver yew qisêkerdişî xo de vatib ke gereka îsraîl herita re biyero estertiş. Hanc qisêkerdoxan ard ziwan ke dewleta îran heqî cîniyan û kêmnetewan re hurmet nêkena.

Konserî Nîlufer Akbal rûmenî

PK - 10î teşrînê de hunermenda kurd Nîlufer Akbal bi gruba xo ya Köln de yew konser dûna. Nîlufer Akbal nê çend serranî peyinan bi muzîsyen Ayhan Evcî û yew grubê muzîsyenî almanan`a xebityena. Akbal muzîkî kurdî bi Blues, Pop, Rock, Funk, Reggae, Jazz, Hip-Hop û Flamenco ya kerdo doletî. Radyoya enternasyonal Funkhaus Europa semedî Nika Nîlufer Akbal`a almanya de yew turne amade kerda.

Dem:Roja paşime, 10î teşrîn 2005, sehet: 20:00 de
Ca: Altenberger Hof - Köln
Organize: Funkhaus Europa

Hukmatî Kurdistan 500 parçe hêgayî da koçeran

Helepçe - 27î octobre de hukmatî kurdistan koçberî kurd ke Îran re agerayî 500 parçe hêgayî da înan.

Merasîma dayişî hêgeyan ke hewşa vîrardişî Helebçe de viraziyay, temsîlkarî serekkomar Celal Talebanî, temsîlkarî hukmatî heremî Mamosta Şaho û keyeî koçeran hedre bî.

Goreyî agahdariyê serekî hukmat heremî hukmat Iraq sozdayo ke 100 banana bi çend projeyanî sey mekteb, navendî saxlemê, camî û awe navçeyî Helepçe de viraziyî.

Çime: Rizgarî Online

www.rizgari.org

کورتەیەک لە ژیان و تێکۆشانی محەمەد شاپەسەندی

کە پێشەوایان ئیعدامکرد، من لە چوارچرا دوو سەعاتان راوەستام، بۆ ئەوەی ئەو دیمەنەم قەت لەبیر نەچێتەوە!



جوتیار حاجی تۆفیق ـ سوید

٣

بەدرێژایی ساڵانی١٩٧٥ هەتاکو ڕاپەڕینی ئازاری ١٩٩١ ژیانێکی زۆر سادە و ساکار دەژی و هەمیشە هەست و نەستی لەگەڵ شۆڕشی نەتەوەکەیدا بووە و بەهەر ڕێگایەک بۆی کرابێت لە خزمەت بەو شۆڕشە دریغیی نەکردووە. بەڵام بە هۆی پیرییەوە نەیتوانیوە لە کۆڕی خەباتدا بێت. لە دوای ڕاپەڕینی ئازاری ١٩٩١ و ڕامالینی دامودەزگا سەرکوتگەرەکانی ڕژێمی بەعس، شاپەسەندی پاش ساڵەها ژیانی نەێنی دەرفەتی ئەوەی بۆ ڕەخسا خۆی ئاشکرا بکات و لای دۆستان و ڕوناکبیران بڵێت: "من محەمەد شاپەسەندیم و لاوێکی نێو کۆمەڵەی ژ. ک. بووم و دواتر بوومە ئەندامی حیزبی دیموکراتی کوردستان و لە چاپخانەی کۆماردا بەشداریی چاپکردنی گۆڤار و ڕۆژنامەکانی ئەوەدەمەم کردووە و جارجار وتار و بابەتی ئەدەبیم بڵاوکردووەتەوە و پاشان ئاوارەی باشوری کوردستان بووم و ناوی خۆم گۆڕی و تا ئێستا بە ناوی (حاجی عەبدوڵا) خۆمم بە خەڵک ناساندوە و نەمتوانیوە ڕاستیی خۆم لای هەمو کەس بڵێم...". «محەمەد فەریق حەسەن»ی چیرۆکنووس و «کەژاڵ ئەحمەد»ی شاعیر و ڕۆژنامەنووس بەر لە هەر کەسێکی دیکە بەرەوپیری شاپەسەندی چوون و بەسەریانکردووەتەوە و وتوێژیان لەگەڵ سازکردووە.(١) پاشتریش چەند دەستە لە ڕوناکبیران و تێکۆشەرانی نێو لایەنە سیاسییەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان سەردانیان کردووە و هەریەک بە جۆرێک ڕێزیان لێناوە و وتوێژیان لەگەڵدا کردووە. دواتر خۆی چەند بەشێک لە بیرەوەرییەکانی لە ڕۆژنامەی (کوردستانی نوێ) و (ئالای ئازادی) و چەند گۆڤار و ڕۆژنامەیەکی دیکەدا بڵاوکردەوە. لەم دواییانەشدا بە هاوکاریی نووسەری چالاک و دڵسۆز «سدیق سالح»، بەشی زۆری بیرەوەرییەکانی خۆی نووسیوەتەوە. ئاواتەخوازم هەرچی زووە لە کتێبێکی قەشەنگ و سەنگیندا چاپ بکرێت. شایانی باسە کە محەمەد شاپەسەندی نرخی وێنە و بەلگەنامەی مێژوویی دەزانێت و سەرباری ئەو هەموو دەربەدەری و ژیانە سەختەی هەیبووە، ئەوەندەی لە توانایدا بووە کۆمەڵێک وێنە و بەلگەنامەی لای خۆی پاراستووە، کە لە نووسینەوە و ساغکردنەوەی مێژوی نەتەوەکەماندا زۆر بەسوودن. هەروەها کۆمەڵێک گۆڤار و ڕۆژنامەی کۆنی لای خۆی پاراستبوون کە لەم سالانەی دواییدا بە ئاگاداریی من، بەبێ هیچ بەرامبەرێک ناردنی بۆ یەکێک لە کتێبخانەکانی کوردستان.

ئێستا محەمەد شاپەسەندی تەمەنی هەشتا و پێنج ساڵە و لە شاری سلێمانی لەگەڵ هاوسەرەکەی و کوڕ و کچەکانیدا ژیانێکی یەکجار ساکار بە سەر دەبات. بەڵام ئەو زیاتر لە هەرکەسێک دڵی بەم ئازادییەی کوردستان خۆشە و خۆی بە بەختەوەر دەزانێت کە بە چاوی خۆی بەری ڕەنجی خەباتی نەتەوەکەی لە پارچەیەکی کوردستان بینی و ئاواتەخوازە هەرچی زوتر پارچەکانی دیکەی کوردستان ئازاد بێن و ئاواتی لەمێژینەی نەتەوەی کورد لە سەربەخۆیی و ئازادی وەدیبێت.(٢)

ساڵی ١٩٩٦ جەلیل گادانی لێپرسراوی ئەوەدەمی (حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران ـ ڕێبەرایەتی شۆڕشگێڕ) بە ئاگاداریی نووسەری ئەم وتارە، وەک ڕێزلێنان و بەسەرکردنەوە، چەند ئەندامێکی حیزبەکەی بە کامێرایەکی ڤیدیۆییەوە بۆ مالی محەمەد شاپەسەندی نارد، هەتاکو بەشێک لە بیروەرییەکانی لە زمانی خۆیەوە تۆمارببکەن. ئەوەدەم شاپەسەندی لەگەڵ خێزانەکەی لە خانوبەرەکی کرێدا لە شاری سلێمانی، لەگەڕەکی ئیبراهیم پاشا دەژیان. ئەگەرچی تەمەنی ٧٥ ساڵ بوو، بەڵام سەربەرزانە لە نێو مالەکەی خۆیدا لەگەڵ کوڕەکانیدا بەکاری بەرگ دورینەوە خەریک بوون و بەو جۆرە بژێوی ژیانیان دابین دەکرد. ساڵی ١٩٩٨ "شاهۆ حەسەن پور" بەشی زۆری ئەو بیرەوەرییەی خستوەتە سەر کاغەز و نوسەرێک بەنازناوی "هانا" ئامادەیکردووە و لە ژمارە ٢٥٧ی ڕۆژنامەی کوردستان، ١٩٩٨/٤/٢٢دا لەژێر ناوی "مامۆستا محەمەد شاپەسەندی ـ پیتچن و نووسەری ڕۆژنامە و گۆڤارەکانی سەردەمی کۆماری کوردستان"دا بڵاوکراوەتەوە.(٣)

شاپەسەندی لە بەشێک لەو بیرەوەرییەیدا گوتوویەتی: "کە پێشەوایان ئیعدامکرد، من لە چوارچرا دوو سەعاتان ڕاوەستام. من چۆن بتوانم ئیمە چین و ئەوان کێن؟ خەڵک خۆی بۆ ڕانەدەگیرا. ئەوسا نزیکەی دوو سەعات ڕاوەستام بۆ ئەوەی ئەو دیمەنەم قەت لەبیر نەچێتەوە!"... ■■■





چەند وتار و بەرهەمی بڵاوکراوەی محەمەد شاپەسەندی:

١ـ خۆشبەختی چیە؟، م. ش. ئادەر٨٢١، گۆڤاری نیشتمان، ژمارە٦، ڕەشەمەی ١٣٢٢، ل٧.
2. هاوار!، م. ش. ئادەر٨٢١، گۆڤاری نیشتمان، ژمارە ٧، ٨ و٩، بەهاری ١٣٢٣، ل٨.
٣ـ سەمەند سیامەندوف، وەرگێڕانی: محەمەد شاپەسەندی، ڕۆژنامەی کوردستان، ژمارە ٦، ١٩٩٤/١/٢١، ل١ و ل٤.
٤ـ لەنینی دانشجو، وەرگێڕانی: محەمەد شاپەسەندی، هاواری نیشتمان، ژمارە١، ١٩٤٦/٢/٢١، ل ٢٢ ـ ٢٨.
٥ـ فیلد مارشال کوتوزۆف، وەرگێڕانی: محەمەد شاپەسەندی، گۆڤاری کوردستان، ژمارە٢، مارتی ١٩٤٦، ل ٩ ـ ١٢.
٦ـ وتاری محەمەد شاپەسەندی بەڕۆژی (جەژنی سەربەخۆیی کوردستان)ەوە، ڕۆژنامەی کوردستان، ژمارە ٢١، ١٩٤٦/٢/٢، ل١و ل٢.
٧ـ مامۆستا عولەما و پەیمەت!، محەمەد شاپەسەندی، هەفتەنامەی ئالای ئازادی، ژمار ٥٦٩، دو شەمە ٢٠٠٤/٦/٢١، ل ٤.
٨ـ لە پەراوێزی ژیان و بەسەرهاتی عەبدولڕەحمانی زەبیحی (مامۆستا عولەما)، محەمەد شاپەسەندی، گۆڤاری هاوار، ژمارە ١٢، بانەمەڕی ٢٠٠٢، ل ٣٦ ـ ٣٩.
٩ـ لە پەراوێزی ژیان و بەسەرهاتی عەبدولڕەحمانی زەبیحی ـ تێبینییەکانی چاپی ژمارە ١٠ی نیشتمان، محەمەد شاپەسەندی، گۆڤاری ڕۆژنامەنووسان، ژمارە١، بەهاری ٢٠٠٢، ل ١٢١ ـ ١٢٥.
١٠ـ دەربارەی حکومەتی کوردستان ـ کورد لە گەڕەی سۆڤێتیدا، محەمەد شاپەسەندی، ڕۆژنامەی کوردستانی نوێ، یەک شەمە ١٩٩٤/٤/٢٤

پەراوێزەکان:

(١) بڕوانە: (گفتوگۆیەک لەگەڵ سەربازی نەناسراو محەمەد شاپەسەندی، ئامادەکردنی: محەمەد فەریق حەسەن و کەژاڵ ئەحمەد، ڕۆژنامەی ئالای ئازادی، خولی دوەم، ژمارە ٢٤، ١٩٩٢/٥/٢٤ و ژمارە ٢٥، ١٩٩٢/٥/٣١).

هەروەها بڕوانە: محەمەد فەریق حەسەن، محەمەد شاپەسەندی شۆڕە سواری بووارِی چاپخانە و ڕۆژنامەگەری، ڕۆژنامەی کوردستانی نوێ، ژمارە ٤٨٤، ١٩٩٣/٩/١٠).

(٢) بۆ ئەم کورتەی ژیاننامەیە سودم لە زۆربەی ئەو نامانە وەرگرتوە کە محەمەد شاپەسەندی چەند ساڵ لەمەوپێش بۆی ناردوم. هەروەها ڕۆژی شەممە ٢٠٠٥/١/٢٩ کاتژمێر ٤ی پاشنیوەڕۆ ـ بەکاتی سوید ـ لە ستۆکهۆڵمەوە تەلەفۆنم بۆ سلێمانی کرد و لەگەڵیدا قسەمکرد و بۆ دڵنیایی زیاتر سەبارەت بە هەندێک لایەنی ژیانی پرسیارم لێکرد.

(٣) مامۆستا محەمەد شاپەسەندی ـ پیتچن و نووسەری ڕۆژنامە و گۆڤارەکانی سەردەمی کۆماری کوردستان، ڕۆژنامەی کوردستان، (ئۆرگانی کۆمیتەی ناوەندیی حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران)، ژمارە ٢٥٧، ١٩٩٨/٤/٢٢، ل ٨ـ٩. (ئەم ژمارەیەی ڕۆژنامەی کوردستان تایبەتە بە جەژنی سەد ساڵەی ڕۆژنامەنووسیی کوردی). {لە نووسینی ئەم وتارەدا سوودم لەو بیرەوەرییەش وەرگرتووە}.

www.kurdistan.org

پەیامی کورد ئامادەی بڵاوکردنەوەی ریکلامەی بازرگانی و بروسکەی پیرۆزبایی و پرسەنامەیە بەنرخێکی گونجاو

کەلوەکانی هەفتە



کاور ٣.٢١ تا ٤.٢٠
کات باش نییە بۆ کاروباری ژنوژنخوازی هەروەها، پێویستە لەسەرت ئەوەندە خۆت بە گیروگرفتی لاوەکییەوە خەریک نەکەیت، ڕۆژی بەختەوەریت یەک شەممە، ژمارەی بەخت١.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠
تەندروستیت باشە بەڵام دەبێت ئاگاداری خۆت بیت چونکە گۆڕانی کتوپڕی کەش کارێکی خراپت تێدەکات، ڕۆژی بەختەوەریت چوارشەممە، ژمارەی بەخت٦.



شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢
پێشبینیکردنت کارێگەرە بۆ ئەوەی ڕۆژ شتت بۆ ڕوون بکاتەوە و هەندێ بابەتی ئالۆزت بۆ یەکلابکاتەوە، ڕۆژی بەختەوەریت چوارشەممە، ژمارەی بەخت٦.



هەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢
ژیانت واخەریکە لەسەر ڕێڕەوێکی ئاسایی بڕوات لەدوای ماوەیەک لە سەرشێواوی، بڕێک پارەت پێ دەگات، ڕۆژی بەختەوەریت یەک شەممە، ژمارەی بەختەوەری٨.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١
بە عەقڵ بەرەنگاری گیروگرفتەکانت بەرەوە و، ئەوەندە بە سۆزەوە بیر لە خەڵکی مەکەرەوە، ڕۆژی بەختەوەریت دووشەممە، ژمارەی بەخت٥.



گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩
تۆ زۆر گیرۆدەی دەوروبەرەکەتیت، هەوڵ بدە سەربەخۆیی خۆت بپارێزیت و بە ژیری بیر لە بابەتەکان بکەیتەوە، ڕۆژی بەختەوەریت چوار شەممە، ژمارەی بەخت٢.



قژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢
کەرانەوە بۆ کارەکەت دڵ خۆشت دەکات چونکە کاتێکی خۆشت بردە سەر، نامەیەک بە ڕێگەوەیە بۆ هەندێکان. ڕۆژی بەختەوەریت شەممە، ژمارەی بەخت٩.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١
باشتر وایە پێوەندییەکانت لەگەڵ هاوڕێکاندا پتەوتر بکەیت، هەروەها خۆت لە گیروگرفتی خێزانی دوور بپارێزیت، ڕۆژی بەختەوەریت دووشەممە، ژمارەی بەخت٤.

دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١
تۆ لە کاتی پێویستدا زۆر دڵسۆز و لەخۆبوردەیت بە مەرجێک بزانیت بەرامبەرەکەت شایەنی ئەوەیە، ڕۆژی بەختەوەریت شەممە، ژمارەی بەخت٩.

تەرازو ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢
تۆ زۆر بایەخ بە بواری ئابووری دەدەیت و هەندێک جار وادەزانیت کە تووشی ئیفلاس دەبیت، دڵنیابە ئەوە ڕووناداتِ، ڕۆژی بەختەوەریت چوارشەممە، ژمارەی بەخت٣.

نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠
هەموو دنیا ناتوانێت تۆ لەم خەمۆکییە دەربکات و چارەسەرەکەش ئاسانە تەنها خۆت دەیزانیت، ڕۆژی بەختەوەریت هەینی، ژمارەی بەختەوری٩.

سەتل ١.٢٠ تا ٢.١٨
کەسێکی نزیک بەختەوەری و شادی دەخاتە ژیانتەوە و، ئەوەی کە بیری لێ دەکەیتەوە بەم نزیکانە دێتە دی، ڕۆژی بەختەوەریت یەک شەممە، ژمارەی بەخت٤.

لە ئەرشیفی هونەرمەندانی کوردستانەوە



ئەرکی وەزارەتی ڕۆشنبیری هەرێمی کوردستانە .. بە ئەرشیفکردن..

ئاشتی گەرمیانی - هۆڵەندا
a.chegani@home.nl

لە دێرزەمانەوە، هەر باسە باسی بە ئەرشیف کردنە، کام ئەرشیف و لە کوێوە دەستپێ بکەین؟ لەو لاپەڕانەی کە زەرد و بۆر هەڵگەڕاون یان ئەو تەمەن و مەرۆڤانەی کە بە ساڵا چوون و کەس ئاوڕیان لێ نادەنەوە و هەر لێشیان بوسیتەوە، کە ئێوە چین و پاشماوەی کێن و لە کوێ هاتوون. سالانی ١٩٨٣ و ١٩٨٤ لە شاری کەرکوک لە کتێبخانەی دەزگای ڕاگەیاندنی ناوخۆی زۆر لاپەڕە و کتێب و پەرتووک و بڵاوکراوەی کوردیم بینی، وەک ئاڤێستا و باسەرە و دیوانی هەڵبەستوانانی کورد. بەڵام بە داخەوە هەموو لاپەڕەکان زەرد زەرد هەڵگەڕابوون و پڕ لە تۆز و بەرە و هەڵوەرین دەچوون، هەر جار جارکێش ڕژێم دەکەوتە نێو پەرتوکخانەی کەرکوک و بڕێ لەو ئەرشیف و مێژووو و ئەدەبیاتانەی دەستووتاند، لە ساڵانی ١٩٩١ و من کەسێک بووم لەو بەهۆایانەی کە ئیدی وەزارەتی ڕۆشنبیری هەرێمی کوردستان، لە کوردستانی ئازادا ئەرشیف و بیبلۆگرافیای هونەرمەندان و نووسەرانی کورد و بڵاوکراوەکانی کورد وەکو بیبلیەی چاوەکانی دەپارێزێت و دەیخاتە نێو تۆڕی ئەلکترۆنی نوێی هاوچەرخەوە. هەر ئەو وەزارەتە، دەیتوانی کارە هونەرییەکانی بەشی شێوەکاریش لە چوارچەوەی بە ئەرشیف کردن و یەک سەرچاوەی گەڕانەوە بۆ هونەری شێوەکاری کوردی بپارێزێت و لە مالپەڕێکدا کۆی بکاتەوە. بەڵام بەداخەوە جاری واش هەیە هەر تەنها یەک مرۆڤ خۆی وەزارەتە، هەر خۆشی ئەرشیفە و خۆشی نوێنەرە. کاتی ئەوەی هاتووە بەزیادەوە بۆ نیشتەجێکردن، لاوانی نوێیش یان گەنجانی نوێیش سووتەمەنی ئەو کارگەیەن کە دووکەڵی ڕەشی لێ هەڵدەستێت، هەموو دونیا هەر لە مۆزەخانە و پەرتووکخانەوە تاوەکو کتێبخانەیەکی بچووک لە گەڕەکەکاندا سەروەت و ئالتوونی وڵاتەکەی لە دوو توێی بە ئەرشیفکردندا پاراستووە، لۆقەر و پاریس بە پاشماوەی تابلۆ نەمرەکان لەنگەری گرتووە.

ئیتالیا لە شاری فلۆرەنسا پەیکەرەکان و هونەرەکەی ناوی ڕێنسانس و هاوچەرخی ئەو وڵاتەیان بەرز ڕاگرتووە. کوردستانی ئێمەش ئەمڕۆ دەبێت بیر لەوە بکاتەوە کە لاپەڕە ئەلەکترۆنییەکان و بە ئەرشیفکردن و پاراستنی کولتووری کوردی و دانانی پسپۆڕی هونەری شیاو، زەرورەتی هاوچەرخیتی ئەمڕۆی کوردستانی نوێیە، بۆیە هونەرمەندانی کورد لەسەر هیلاکی و ماندوێتی خۆیان لە ئاکامی بێ ئاکامییان دەبێ هەر یەک بۆ خۆی ماڵپەڕ یێکی ئەلەکترۆنی دروست بکات، ئەگەر تەنها یەک ساڵ و دوو ساڵیش بێت لەو ماڵپەڕەوە دەنگی دەگاتە دونیا. ئێستاش سەرەتایەکە لەو هەنگاوە پیرۆزە کە هونەرمەندان هەنگاوی بۆ دەنێن و بە زمانە جیاوازەکان بابەت و چالاکییە هونەرییەکانیانی تیادا بڵاو دەکەنەوە. دروستکردنی ماڵپەڕی ئەلەکترۆنی بە تایبەت بۆ کولتوور و هونەر لە ئاستێکی بااڵدا خۆی لە خۆیدا بە ئەرشیفکردنێکی هاوچەرخە و ناساندنی هونەرمەندانی کورد و چالاکییەکانیانە لە تۆڕی ئینتەرنێتدا. وەکو کورد زۆر کاری باش کراوە و هەندێ شت کراوەتە ئەلبووم و ئەرشیف، بەڵام ئەوەی من باسی لێوە دەکەم دەزگایەکی گەورەی بێ کۆتاییە کە زۆر لاپەڕەی کۆن و زەرد زیندوو دەکاتەوە و لە مردنەوە بۆ ژیان دەیانگەڕێنێتەوە. ■■■

"شیلەر" و کورد د پێشانگەها خۆشنڤیسینێ دا



زنار شینو - ئەڵمان - ژبۆ بزاف و چالاکیێن ٢٠٠ ساڵیا وەغەرکرنا شانۆڤان و نڤیسەرێ ئەڵمان "فریدریش شیلەر" (١٧٥٩. ١٨٠٥). هونەرمەند و ڕەوشەنبیرێن کورد ژی هەبوونا خوە هەبوویە. خۆشنڤس "زیاد شینۆ" ب بەرنامەکێ ڕێکخستی و هەژی ل ڕۆژا ٢٠٠٥/١٠/١٤ ل باژێرێ لودڤیکس بورگ، پێشانگەهەکا خۆشنڤیسینێ ل هولا "ڤۆلکس هۆخ شولە" ڤەکر، ب ئامادەبوونا کۆمەکا بینەر و حەژیکەرێن هونەرێ خۆشنڤیسینێ. ١١ تابلویێن ب هونەرێ نەخشەکێشانێ و دیزاینێ هاتینە خەملاندن ژ گوتنێن بناڤ و دەنگ بێن شیلەرێ، ب ڕێنڤیسا ئەڵمانی و کوردی - عەرەبی، پێشانگەهێ هەمبێز کربوون.. پشتی پەیڤێن ڕێڤەبەرێ خواندنگەهێ "ئولریش ئێگدیر" و یا خوەدێن پێشانگەهێ هاتینە پێشکێش کرن، هونەرمەندێ کوردێ شانۆڤان "هاوڕێ زەنگەنە" د پەراویزا پێشانگەهێ دا، کورتە سمینارەک ب ناڤێ (شیلەر و کوردستان و هاوتای نێوانیان) . باس ل سەر ژیانا شیلەرێ کر و مەینەتیێن کەتینە د ڕێیا وی دا و گرێدانا ژیانا هونەرمەندا و نالینا وان دبن دەستهەلاتییا دکتاتورا دا و خەبات کرن و مشەختبوون ژ بۆ فرەکا ئازادیێ، و گوتنا وی یا دون کارلوس د بێژیتە فلیپێ دکتاتور(ئازادیێ بدە بیرورا، بەرێز) . ل سەر ڤێ گوتنێ ل داوییا سالێن سیها دا گەنگەشێن مەزن ل ئەڵمانیا هاتینە کرن. هەرەسا گرێدانا شانوگەریێن شیلەرێ (کابێلە و لیبە، ڕوبەر، ڤیلهێلم تێل) دگەل شانوگەریێن خانزاد و خەج و سیامەند، کو دەربرینێ ژ هزرا کۆمەلایەتی دکەن. دیسان دیتنا شیلەرێ بو شانۆیێ وەک میدیایەک بۆ پێگەهاندنا جڤاکی و پەروەردەکرنێ. ئانکو جوانکاریا پەروەردێ بناڤ دکەن ڤی جورێ. کو هەتا ئەڤرۆ پێگەیەکە ژ بۆ دانوستاندنێ. دیسان ڕەوشا هونەرمەندێن کورد ل ژێر دەستهەلاتییا رژیمێن خوینمێژ و پەنابرنا وان بو تاراوگەهێ و لێگەریانا ئاسۆیێن نوی ژ بۆ ئافراندنێ. هێژای گوتنێ یە ستراتێن ژ پەیڤێن شیلەرێ ب دەنگێ سترانبێژێ ئەمریکی براین فە هاتنە پێشکێش کرن و پێشانگەهـ تا کو ٢٠٠٥/١١/١٠ دێ بەردەوام بیت، بوڤێیەک قەکری ژ خارن و قەخوازنێ د خزمەتا مێهڤانا دا بوو. ■■■

"هارۆڵد پینتەر" رابەر و دروستکەری ڕووداوەکان، لە کتوپڕێکی چاوەڕواننەکراودا خەڵاتی نۆبڵی بردەوە..!



هارۆڵد پینتەر جەنگی دژی عێراقی پڕۆتۆستۆ دەکرد و بەریتانیای بە پاشکۆی ئەمەریکا لە قەڵەم دەدا ..!!

ئەکادیمیای سویدی لەم ڕۆژانەدا هەموو چاوەڕوانییەکانی ناوەندە ئەدەبی و ڕۆشنبیری دەزگاکانی ڕاگەیاندنی تێپەڕاند، بەوەی لە پڕ خەڵاتی نۆبڵی ئەدەبی بۆ ساڵی ٢٠٠٥ بە نووسەری شانۆیی بەریتانیایی سەرکێش "هارۆڵد پینتەر" بەخشی، کە پار٧٥ ساڵەی تەمەنی تێپەڕاند.

ئەکادیمیای سویدیی بێخەوشی خەڵاتەکە لەوەدا دەبینێ، کە"هارۆڵد پینتەر" (باشترین نووسەرە نوێنەرایەتی شانۆی بەریتانیایی بکات لە قۆناغی دوای جەنگی دووەمی جیهانی)یەوە. نووسەر لە تێکستی شانۆیەکانیدا پەردەی لە ڕووی ئەو ڕێگە شاراوانە لابردووە، کە لە پشت قسەی ئاسایی ژیانی ڕۆژانەی پاڵەوانەکانی، جێگەی ئازارە نهێنییەکان دەپێکێت. (پاش سەرکەوتنی لە پڕی "هارۆڵد پینتەر" بەم خەڵاتە، جێی سەرنجی ناوەندە ڕۆشنبیریەکان بوو، چونکە ناوی ئەم لە ناو لیستی پاڵێوراوانداً نەهاتبوو. ئەو نووسەرێکی هاوچەرخی شانۆیی جیهانی پێشڕەوە، بۆیە ئەم خەڵاتە بە تەواوی شایانی ئەو بوو، هەروەها لەبەر ئەوەی دروستکەری ڕووداوەکانە، دەیزانی چۆن ڕێبازە هزری و ڕامیارییەکان ببزوێنێت و دەیزانی چۆن جەنگی گەورە بە نووسینەکانی بەرپا بکات. تەنانەت بە یەکێک لە نووسەرە دەگمەن کەم وێنەکان دادەنرێت، کە توانای بەسەر دوو ڕەهەندەی: "نووسین و کردار" دەشکێ و یەکانگیری یەکدیان دەکات.

هەڵوێستی دژایەتی ئەم نووسەرە لەو جەنگەی دژ بە عێراق بەرپاکرا ئاشکرایە و بیرورا ڕەخنەییە تونەدکانی ئەم دژی جۆرج بوشی سەرۆکی ئەمەریکا و تۆنی بلێری سەرۆک وەزیرانی بەریتانیا هەموو کەس دەیزانێ. ئەم نووسەرە بەم هەڵوێستە ڕەخنەییانەی ناونراوە بە "بەرهەڵستکاری ویژدان زیندوو" نەک بۆ خۆدەرخستن و گەورەکردنی ڕووداو و پفدانی بوارەکانی ڕاگەیاندن و سیاسەت. بەڵکو هەندێ لە هەڵوێستەکانی بە خراپ بە سەر خۆیدا شکاوەتەوە، وەکو کاتێک کە دژی حکومەتی مارگرێت تاتشر کاری دەکرد، هەروەها کاتێک ئەو نامە (تووڕانەی) لە ڕۆژنامەکانی بەریتانیادا بڵاودەکردەوە، بژهەڵماڵینی پەردە لەسەر ڕوداوی ئەوسای سەرۆکایەتی ئەمەریکا کلینتۆن(مۆنیکاگێت.)

"هارۆڵد پینتەر" هەرگیز هەستی بە شەرمەزای نەکردووە، کە دەربڕیووە؛ بەریتانیا هیچ نییە جگە لە پاشکۆیەک، کە بە دەوری خولگەی ئەمەریکادا دەسوڕێتەوە. پاش ئەوەی"هارۆڵد پینتەر" لەم دواییەدا لەو نەخۆشییە کوشندەیەی هەستایەوە، دیوانێکی بڵاوکردەوە بە ناونیشانی "جەنگ ٢٠٠٣" لە دووتوێیدا چەندین چامەی لە خۆگرتووە، کە بێبەزەیی جەنگی ئەمەریکا و بەریتانیای دژی عێراق خستۆتە ڕوو، کە چۆن قوربانیانی جەنگ تەڕوشک دەسوتێنێ و جیاوازی ناکات لە نێوان کوشتنی منداڵ و ژن و پیر و بێ تاواندا. "هارۆڵد پینتەر" چاوی لە خەڵاتی نۆبل نەبووە، پاش ئەو ڕەخنە تونانەی، کە لە جەنگ دژی عێراق دەیگرت، بەڵام ئەکادیمیای سوید بۆ بەخشینی "نوبل"ی ئەدەبی بێ ئاگا نەبوو لە نایابی دەقە ئەدەبی و شانۆگەرییەکانی و ئازایەتی دەنگی"هارۆڵد پینتەر".

"هارۆڵد پینتەر" شانۆگەرییەکی دەربارەی مەسەلەی خەڵک و ڕەگەزپەرستی لە تورکیا نوسیووە بە ناونیشانی (زمانی چیا)،لە زۆربەی بەرهەمەکانیدا نازییەتی ڕیسواکردووە، بەڵام "هارۆڵد پینتەر" لە سەرەتا و کۆتاییدا هەر بە نوسەری شانۆگەری دەمێنێتەوە. دەتوانێت دنیایەکی نوێ دروست بکات لەسەر دووڕیانی ڕێبازی هەردوو شانۆکاری بێهودە "یامۆئیل بێکیت- یونسکۆ" و شانۆکاری بەریتانیایی "ئەلینۆ- ناتورالیست" (سروشتی نوێ) و توانی سەر لە نوێ شانۆ لەچوونە ناو ژیان و ڕۆشنبیری دا بنوسێتەوە. هارۆڵد پینتەر" لە سەرەتای ژیانی گەنجێتی دا وەک دەرگاوان شوفێر کاری کردووە، پاشان وەک یاریدەدەری ئەکتەر هاتە ناوەوە، ئەو کاتە هۆنراوەشی دەنووسی، لە سەرەتای ژیانیدا، لە ساڵی ١٩٥٧، دەستی بەنوسینی یەکەم شانۆگەری کرد بە ناونیشانی (ژوور)، تا وای لێهات بە لێشاو شانۆگەری دەنووسی تا ژمارەی شانۆگەرییەکانی خۆیان لە ٣٠ شانۆگەری دا. کە لە نێوان دەقی کورتی یەک بەش یان دەقی درێژ دا خۆیان دەنواند. نووسەر کەسایەتییەکانی لە ناو ڕووداوەکانەوە هەڵهێنجاوە. گەلێک چامە و وتار و سیناریۆی نوسیوە و لە بواری سینەمای هاوچەرخیشدا دا سەرکەوتوونێکی مەزنی بەدەست هێناوە. زۆربەی ناوەڕۆکی بابەتەکانی "هارۆڵد پینتەر" خۆی لە سیمایەکی ڕەشبینانە وبێهودانەدا دەبینیەوە. وەکو ڕق و خیانەتی ناو خێزان، نائارامی بێ هودەیی، هەڕەشەی نەناسراو، فانتازیای سەرنج ڕاکێش، گاڵتەجاڕی تاڵ، بەڵام کەسایەتییەکان لە حاڵەتی شپرزەیی و ڕاڕایی ترسدان. کەسایەتی ناو دەقەکان بەتوانا تر بوون لە کەسانی تر کە هەوڵیان داوە بۆ بەرهنگاری و بەرەو ڕووبوونەوە. بەڵام دنیای ناوەوەی زۆربەی شانۆگەریەکانی "هارۆڵد پینتەر" لە چوارچێوەی خەڵکی ئاسایی و سروشی ڕۆژانەن کە ڕەوشی زۆربەیان نائارامی تێکچوون و شێتێتی یە. گفتوگۆی زۆربەی بەرهەمەکانی نوسەر، لە نێوان دوو کەس دایە و لە مۆنۆلۆژێکی تەمومژاوی بێ هوودە دەچێت، نوسەر ستونیانە بونیادی ناوە. بە دەنگی بەرز دەست پێ دەکەن و وردە وردە هێواش هێواش دەبێتەوە تا وای لێ دێت بێ دەنگ دەبن. زمان بنچینەیەکی سەرەکییە لە شانۆگەریەکانی بینتەردا، هەندێ جار جێگەی ڕووداو دەگرێتەوە، یان ڕووداو جێ گۆڕکێ لەگەڵ کەسایەتیەکاندا دەکات و دروستیان دەکات. لە ڕێگەی گفتوگۆ بەردەوام و پچڕپچڕەکانی دا زمانی ئەم جۆرە شانۆگەریانە دادەڕێژێت و ناوێ لێدەنێن "دەقی نادیار" کە بە بآ ئەو دەقی نوسراو دروست نابێت. شانۆگەریەکانی هارۆڵد پینتەر بریەوێکی زۆریان هەیە لە دنیادا بە گەلێک لە زمانەکان و لەسەر شانۆکانی ئەمستردام، بڕۆکسل، ئەستەمبوڵ، هەرەوەها لەسەر شانۆی جیهانی عەرەبیش سەرکەوتنی بە دەست هێناوە و ناسراون و دەهێنەرە عەرەبەکانیش لە قاهرە و دیمەشق و بیروت و تونس لە گەلێک بواری جیاوازدا، ئاشنان بە دەقەکانی ئەم نوسەرە و وەریان گێراون، یان لێیان وەرگرتووە و تێهەڵکێشی شانوگەریەکانی خۆیان کردووە. دەکرێت ئەم نوسەرە بەریتانییە بە یەکێک لە ئەستێرەکانی شانۆی هاوچەرخی جیهانی و دابنرێت، چونکە زۆربەی بەرهەمەکانی وەرگێڕدراون و بۆ شانۆگەری دەرهێنراون. ■■■

ئامادەکردنی: سەردار قەتاح ئەمین هۆڵەند

ئەم چەند دێڕە لە ڕۆژنامەی عەرەبی "الحیاه" ی لەندەنی و ڕۆژنامەی Volkskrant ی هۆڵەندی ڕۆژی ٢٠٠٥/١٠/١٤ هوە ئامادەکراوە.

پەیف...



نووسینی: شێرکۆ خالید

ڕەهەندەکانی بێبەش کردنی کارمەندەکانی هەرێمی کوردستان لە جەژنانەکەی جەعفەری

کە منداڵبووین شتێک لە جەژنا دڵی خۆش ئەکردین، جەژنانە بوو. وامان ئەزانی جەژن بۆیە خۆشە چونکە جەژنانەی تیا وەرئەگرین، جەژنانە زۆر مانای هەبوو لە عەقڵی منداڵیماندا، لەوانە مانای ئەوەی دایک باوک لەو ڕۆژەدا گوزارشت لە خۆشەویستی خۆیان ئەکەن بەو بڕە پارەیەی ئەیاندایێ، جگە لەوەی سەربەستی ئەوەیان ئەدایێ بە دڵی خۆمان شتی پێ بکڕین، ئەمە دەستوورێکی کۆمەڵایەتی بوو و هەتا ئێستاش کۆمەڵگای کوردەواری و زۆر لە کۆمەڵگاکانی تر پەیڕەوی ئەکەن، یەکێکە لەو دەستوورانەی مانایەک لە مانا زۆرەکانی خۆشەویستی بەرجەستە ئەکات، هەر بەو شێوەیەش ئەگەر جگە لە باو دایکمان جەژنانەی پێ بەخشیباین وەک مام و خاڵ و باپیر ئەوە مانا خۆشەویستی لەلایەن کەسانی ترەوە بۆ ئیمەی منداڵ زیات ئەچەسپاند، بۆ نمونە باپیر وەک سەرێکی گەورە کە بەردەوا ئەو دەستوورەی پەیڕەو ئەکرد ئیمەی منداڵی فێری ڕەهەندەکانی خۆشەویستی ئەکرد، چونکە خۆشەویستی یەکێکە لەو بۆماوانەی مرۆڤ هیچ کاتێک باسی لێوە ناکات، وەک ئەوەی کەسێکت کۆچی دوایی بکات ئەگەر هیچی لە دوا بەجێ نەمێنێ تەنها خۆشەویستی ..

ئیدی ئەگەر هەر لەو گۆشەیەوە بڕوانینە دەسەڵاتی سیاسی وڵاتێک و بە باوکی گەورەی خۆمانی بزانین، ئەوا ئەبێت ئەوە بە دوولایەنە بەرجەستەببێت، ناکرێ من دەسەڵات بەردەوام بە باوک بزانم و ئەویش من بە هیچی خۆی نەزانێ، ناکرێ من هەستی ئەوەم هەبێت ئەو باوکمە و ئەو هەستی باوکایەتی بەرامبەرم نەبێت ..

ئەو کاتەی جەعفەری وشەی فیدرالی لە سوێندەکەی خستەخوارێ وتمان بە ئەنقەست نەبوو، ئەو کاتەی لە دانیشتنی ماتەمینی شانشینی وڵاتی عەرەبی سعودی کە لەسەر کورسی سەرۆک کۆمار دانیشت وتمان لەوانەیە سەرنجی نەدابێ، بەڵام کاتێ ئەو حکومەتەی بەناو ئەبێت باوکمان بێت بێبەشمان بکات لە جەژنانەی جەژن ئەوە شتێکە مێژوو هەڵیئەگرێ، چونکە هەمیشە لەلای خەڵکی سادە لێکدانەوەیەک هەیە و لای خەڵکانی سەروو سادەش لێکدانەوەی سەروو سادەش هەڵدەگرێ ئەو جۆرە ڕەفتارانە ..

ئەگەر بەخشین و نەبەخشینی جەژنانە بریتی بێت لە تەنها بڕێک پارە ئەوە چ بەهایەکی نیە و چ تەئویلێکی ئەوتۆ هەڵناگرێ، بەڵام ئەگەر بریتی بێت لە شتێک زیاتر لە بڕێک لە پارە ئەوە بەهای هەیە و لێکدانەوە و تەئویلی تر هەڵدەگرێ. ■■■

جێگری سەرۆکی سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی کوردستان:

ئێمە سەندیکایەکی سەربەخۆین



نووسەر و ڕۆژنامەنووسی ناوداری گەلەکەمان مامۆستا مستەفا سالح کەریم جێگری سەرۆکی سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی کوردستان و جێگری سەرنووسەری ڕۆژنامەی "ئەلئیتحاد" لەسەر بانگهێشتی ناوەندی لێکۆلینەوەی کوردی لە شاری بۆن لە سەرەتایی مانگی ڕابردوو گەیشتە ئەڵمانیا، پەیامی کورد ئەم سەردانەی بەهەل زانی بۆ ئەوەی لە نزیکەوە چەند پرسیارێک سەبارەت بە سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی کوردستان ئاراستەی بەڕێزی بکات. سەرەتا داوامان کرد کە تیشکێک بخاتە سەر چۆنییەتی دامەزراندنی ئەم سەندیکایە و لە وەڵامدا گوتی:

وەک دەزانن لەم چەند ساڵەی ڕابردوو کوردستان بە بارودۆخێکی نائاسایی تێپەڕی و ئەم بارودۆخەش ڕەنگدانەوەی لە سەر هەموو بوارەکانی ژیان هەبوو. بەتایبەتی لە سەر ڕێکخراوە پیشەییەکان، ئیتر ئەوەبوو لە هەولێر ڕێکخراوێک بەناوی سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی کوردستان هەبوو، لە سلێمانیش ڕێکخراوێکی تر بەناوی یەکیەتی ڕۆژنامەنووسانی کوردستان هەبوو، بەڵام بە نیازپاکی و هەست بە بەرپرسیارییەتی نەتەوایەتی هەردوولامان، توانیمان دەستپێشخەری بکەین لە یەکخستنەوەی هەردوو سەندیکا ئەوەبوو لە کۆنگرەیەکی یەکگرتوودا کە لە ٢٠٠٤/١١/١٣ کە لە شاری هەولێردا بەستمان ئەنجوومەنێکی هاوبەشمان هەڵبژارد و بەپێی بڕیارەکانی کۆنگرە چەند لقێکمان لە شارەکانی بەغدا و موسڵ و کەرکوک و دهۆک و سلیمانی و ئەوروپا کە بارەگاکەی لە شاری "لەندەن" ە، کردەوە.

پ: بڕچی لە هەولێر لقتان نیە؟

و: ئێمە ئێستا سەرقاڵی کردنەوەی لقی هەولێرین، لەوانەیە لە دوای گەڕانەوەم ئامادەکاری بۆ کردنەوەی هەولێر تەواو بووبێت.

پ: کارەکانی لقی ئەوروپا چییە؟

و: کارەکانی لقی ئەوروپا، ئەوەیان تایبەتە بەو ڕۆژنامەنووسانەی لە ئەوروپا دەژین بۆیان هەیە ببن بە ئەندامی سەندیکا لە ڕێگەی ئەم لقەوە بەپێی ئەوەمەرجانەی لە پەیڕەوی ناوخۆی سەندیکادا، هاتووە..

پ:گرنگترین ئەوکارانەی بۆ ئەندامانی سەندیکا کردووتانە و لە ئایندەدا دەیکەن چین؟

و: لەو کارانەی کە تاوەکو ئێستا بۆ ئەندامانی سەندیکا کردوومانە لەوانە دابین کردنی زەوی و بەرگریکردن لەو ڕۆژنامەنووسانەی کە تووش کێشە هاتوون لە دادگا لەسەر کاری ڕۆژنامەوانی و یارمەتی دانیان لە کاتی نەخۆش و لێقەومانی کتوپڕ و پاخود بۆ مەسەلەی ژنهێنان، ئەمانەش هەمووی دەسکەوتە بۆ ئەرک و ماندووبوونی ڕۆژنامەنووسەکانمان.

پ: ئایا ئەم سەندیکایە لە ڕووی یاسایی باوڕپێکراوە و هیچ پرۆژەیەکی یاسایی هەیە؟

و: بەڵێ ئەم سەندیکایە لە ڕووی یاساییەوە باوەڕپێکراوە و، تونیومانە بیرێک لە پەرلەمانی کوردستان بکەینە یاسا، ئەویش لە هەرکاتێک هەر ڕۆژنامەنووسێک بخوازێ لە دەزگایەکی حکومەت دابمەزرێ؛ ئەو سەڵاحیەتی کاری ڕۆژنامەنووسی بەخزمەت بۆ حیساب بکرێ، وەک مووچە و خانەنشینی. ئەمەش کارێکی زۆر گرنگە بۆ بەرزکردنەوەی ئاستی ژیانی ڕۆژنامەنووسانمان.

پ: تێکڕای ژمارەی ئەندامانی سەندیکا چەندن و مەرجەکانی بەئەندابوون چیە؟

و: تێکڕای ئەندامانی سەندیکا بە هەموو لقەکان نزیکەی ٢٠٠٠ ئەندامن مەرجەکانی بە ئەندام بوونیش بەپێی پەیڕەوی سەندیکا هەر ڕۆژنامەنووسێکی کورد لە هەر بەشێکی کوردستان هاتبێت، لە کوردستاندا نیشتەجێبێت، مافی بە ئەندام بوونی هەیە و هەروەها هەر ڕۆژنامەنووسێکی غەیرە کوردیش ئەوەی کە لە کوردستان نیشتەجێبێت ئەویش مافی ئەوەی هەیە کە ببێت بە ئەندام و هەروەها هەموو ئەورۆژنامەنووسە کوردانەی کە لە ئەوروپان، بێ جیاوازی مافی بە ئەندام بوونیان هەیە.

پ: جیاوازی نێوان سەندیکای کوردستان و عێراق چیە؟

و: هەزدەکەم ئەوە ڕوون بکەمەوە بە چەند خاڵێک یەکەمیان سەندیکای ئێمە سەربەخۆیە و هیچ پەیوەندیەکمان بە سەندیکای عێراق نییە خاڵی دووەم سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی کوردستان ئەندامە لە سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی نێودەوڵەتی و تاوەکو عێراق لەم سەندیکایە نێودەوڵەتییە بە ئەندام وەرنەگیراوە ئەویش لەبەر پەرش وبڵاوی خۆیان. هەرچەندە سەندیکای عێراق داوایان کردووە، کە پەیوەندییەک لەگەڵ ئێمەدا ببەستن، بەڵام ئێمە مەرجی خۆمان هەبووە بۆ ئەو جۆرە پەیوەندییە و گوتوومانە ئێمە سەندیکایەکی سەربەخۆین و ئێوەش سەربەخۆن و ئێمە هەرگیز قەبوڵ ناکەین ببین بە لقێک لە سەندیکای عێراق و، ئیتر ئەوە نەما بەوە ڕازیبین تەها موحێدین مەعروفێکمان بۆ دابنێن؛ هەروەها پێمان گوتوون ئەگەر هەر کاتێک ئێوە توانیتان سەندیکایەکی یەکگرتوو دابمەزرێنن، ئەوە ئێمە لیژنەیەکی هاوبەش بۆ ئاڵوگۆڕکردنی بیروڕاو سەردان و ناردنی کادیری ڕۆژنامەنووس بۆدەرەوەی وواڵات بەنیازی خولی ڕۆژنامەوانی دادەمەزرێنین.

پ: بڕچی سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی عەرەب ناڕەزایی خۆی بۆ سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی نێودەوڵەتی دەربڕی لەسەر بە ئەندامبوونی سەندیکاکەتان لە سەندیکای نێودەوڵەتی؟

و: بەڵێ سەندیکای عەرەب هەڵوێستێکی زۆر خراپیان نواند بەڵام بە هیمەتی هەموولایەک و دڵسۆزانی گەلەکەمان لە ڕۆژنامەنووسانمان لە ئەوروپا توانرا بەرەپرچی ئەو هەڵوێستە شۆڤینیە بدرێتەوە و ڕۆژنامەنووسە عەرەبە عێراقیە پێشکەوتووخوازەکانیش کە نزیکەی ٤٠ کەس بوون یاداشتێکیان دایە سەندیکای عەرەب و ناڕەزایی خۆیان لە هەمبەر هەڵوێستی ئەوان دەربڕی ئێمەش وەک وەفا دارییەک بۆ ئەو هەڵوێستە جوامێرانەیە بە بڕیارێکی دەستەی باڵا بڕیارماندا ئەم ٤٠ نووسەر و ڕۆژنامەنووسە عەرەبە عێراقیانە بە ئەندامی فەخری سەندیکاکە وەربگرین

پ: ئایا هیچ ڕووبەڕووبوونەوەیەکتان بووە لەگەڵ سەندیکای عەرەب؟

و: بەڵی لە کۆنگرەی ڕۆژنامەوانی لە ئێنای پایتەختی یۆنان ئەم هەڵوێستەمان بەچاودانەوە و ڕاستیەکانمان بۆ ڕوونکردنەوە لە ئاکامدا فەلەستینیەکان و جەزائیر و مەغریب پەشمانی خۆیان نیشان دا لەو هەڵوێستە و گوتیان ئەم بڕیارە بەسەرماندا تێپەڕیوە و بێ ئاگاداری ئێمە ئەم بڕیارە وەرگیراوە ئەوەی تونیبوو نوێنەری تونس بوو کە زۆر شۆڤینیانە هەڵسوکەوتی دەکرد لێرەدا خۆش ئێمە لەوەدابوو لەو کۆنگرەیە دەستەی باڵای کۆنگرە بەنیازی دەرکردنی تونس بوون لە سەندیکای جیهان و بەوە تاوانبارکرابوون کە سەندیکای ڕۆژنامەنووسانی تونس (گەلای زێڕینی) بەخشیوە بە زەین العابدین بین عەلی سەرۆکی تونس، ئەوانیش تونس بە وڵاتێکی خنکاندنی بیروڕا دەناسن بۆ پێڕەش سەندیکای تونسیان بە کلکی ڕژێم تاوانبارکرد، بەمەش هەڵوێستی ئەوان زۆر لاواز بوو لە هەمبەر ئێمەش و سەندیکای نێودەوڵەتیش.

پ: وەڵامی سەندیکای نێودەوڵەتی بۆ ئەم هەڵوێستەی عەرەب چی بوو؟

و: هەر دەکەم ئاماژە بە خاڵێکی گرنگ بدەم ئەویش وەزعی سەندیکای یەکگرتووی عەرەب لەم کۆنگرەیەدا زۆر ناهەمواوە شەپرێو بوو و، وەڵامی بەڕێز ئایدن وایە سکرتێری ڕۆژنامەنووسی نێودەوڵەتی لەم بارەیەوە زۆر ئیجابی بوو. لە کۆنگرەی ئەثینا بەڕێزی بە بەڕێزفەرهاد عەونی سەرۆکی سەندیکای کوردستان و بەندەی گووت. هەزدەکەم ئەم هەڵوێستەی سەندیکای عەرەب بەهەند وەرمەگرن چونکە ئەوان بەهیچ شێوەیەک بۆیان نیە دەست بخەنە کاروبارەکانی ئێمەوە بۆیە داواتان لێدەکەم ئەم مەسەلەیە لەبیر بکەن و ئێوە ئەندامی نێو دەوڵەتین خۆ ئێوە ئەندامی ئەوان نین.

پ: ئایا سەندیکای کوردستان ئەندامی کارایە لە سەندیکای نێودەوڵەتی؟

و: نەخێر ئێستا ئێمە وەک دەست پێک ئەندامی بەشدارین و کارانین بەڵام وەعدەی ئەوەیان داوینەتێ لە زووترین کات ببین بە ئەندامی کارا لە گەڵ ئەوەشدا پێیان گوتووینە کە ئێوە هەرچەندە ئەندامی بەشدارن بەڵام هەموو مامەڵەیەکی کاراتان لە گەلدا دەکەین. بۆ بەشداریکردن لە کۆنگرەکان. تا ئێستا بەشداری سێ زۆرک شۆڕپمان لە عەمانی پایتەختی ئوردن کردووە، هەروەها لە مەرید ئامادەبوونێکی چالاکمان لە تەک وڵاتانی ئەندامدا هەبووە. دوا جار بەڕێز سکرتێری نێودەوڵەتی لە عەمان ڕوویکردە ڕۆژنامەنووسانی عێراق پێی گوتن پێویستە ئێوە لە سەندیکای کوردستان فێری کارەکانتان ببن خۆتان ڕێکبخەن بزانن ئەوان چۆن کاردەکەن ئێوەش بە هەمان شێوە سەرکەوتوو دەبن.

پ: پەیوەندیتان لەگەڵ دراوسێکان چۆنە؟

و: پەیوەندیمان باشە بۆ نموونە، بڕیارە یۆنان و تورکیا لەم ماوەیەسەردانمان بکەن. لەوەوپێش وەفدی ئێران سەردانیان کردین و لە عەرەبەکانیش پەیوەندیمان لەگەڵ ڕۆژنامەنووسانی ئەردەن باشە، بڕیارە بەم زووانە سەردانمان بکەن. ■■■

دیمانە: لوقمان بەرزنجی

بەکوردی بدوێ، بەکوردی بخوێنە، بەکوردی بنووسە، بەکوردی بیربکەرەوە!

www.kurdish.org

دیداری هەڵکەوت زاهیر لەگەڵ:

هونەرمەند ئەحمەد ئەلسەعدەنی



ئەحمەد سەعدەنی هونەرمەندە، کۆری هونەرمەندی بە ڕەچەڵەک کورد سەلاح سەعدەنییە، ماوەیەک لەمەوبەر هونەرمەند هەڵکەوت زاهیر بە سەردانێکی ڕەسمی سەردانی وڵاتی میسری کرد و، لەگەڵ ژمارەیەک لە هونەرمەندانی بواری جیاواز بە تایبەتی لەوانەی بە ڕەچەڵەک کوردن، دیدار و هەڤپەیڤینی سازدا. هەڵکەوت زاهیر

هەڵکەوت: ئەم کاتەت باش و شادمانین بە دیداری بەڕێزتان.

وەڵام: ئەم کاتەی بەڕێزتان باش، زۆرخۆشحاڵم بە ودیدارە و. بەناسینی هونەرمەندێکی کوردستان.

هەڵکەوت: بۆ ڕۆژنامەیەکی کوردی دەمەوێ چەند پرسیارێکت ئاراستە بکەم و ڕاتان چیە؟

وەڵام: زۆر بەخۆشحاڵییەوە، ئەوەی لام خۆشە وەک قسەمان کرد کە بەڕێزتان هونەرمەندن دیداری هونەری ئەنجام ئەدەن زۆر کارێکی سەرکەوتووە وە خۆشحاڵم بۆ یەکەم جار بۆ ڕاگەیاندنە کوردییەکان ووتوێژ بکەم سڵاوم بۆ هەموو کوردێک هەیە.

هەڵکەوت: ئەمڕۆ چاوم بە شانۆگەرییەکی بەڕێزتان لەگەڵ ژنە هونەرمەندە(ڕەغدە) کەوت دەستخۆشیتان لێ دەکەم بە تایبەتی کە ئەم ژنە هونەرمەندە، یەکەم جارە ڕۆڵی سەرەکی بینی لەم شانۆگەرییەدا.

وەڵام: تائیستا چەند کارێکی هونەریم ئەنجام داوە بەڵام (ڕەغدە) یەکەمین جارە لەم کارە هاوبەشەماندا ڕۆڵی سەرکی دەبینێ.

هەڵکەوت: تێروانینت بۆکاری سینمایی و کارکردن لەم بوارەدا چۆنە؟

وەڵام: دیارە کاری سینمایی کارێکی زۆرخۆشە و، تەماشاکارێکی زۆریش هەیە بەڵام من شانۆم زیاتر لا خۆشەویستە، ئەگەر کارێکی وەها بێتە پێشەوە بەخۆشحاڵییەوە دەیکەم.

هەڵکەوت: ئێمە خەرێکی فیلمێکی سینەمایین لەسەر مێژووی گەلی کورد بۆ بەشداریکردنتان لەو فلیمە ڕاتان چیە؟

وەڵام: بەشانازییەوە بەشداری تێدا دەکەم و ناسینی تۆ کاک هەڵکەوت هاندەرێکی باشتر دەبێت بۆ بە ئەنجام گەیشتنی ئەم بەرهەمە و بەشداریکردنی ئێمە بێگومان لە فیلمێکی کوردی تەعبیر لە خۆشەویستی کوردستان دەکات.

هەڵکەوت: بەڕێزت کۆری هونەرمەندی بەناوبانگ (سەلاح سەعدەنی) ت؟

وەڵام: بەڵی ڕاستە باوکمە و یەکەم مامۆستا و پەروەردەکاری هونەریمە.

هەڵکەوت: بەو میوایەی لە داماتوویێکی نزیک دیمانەیەکی تر بکەین زیاتر باس لەو بوارەدا بکەین.

وەڵام: زۆر سوپاس و خۆشحاڵ بووم بە دیدارتان و هاتنتان بۆ قاهیرە وڕووناکتان کردوە و سڵاو ڕێزم بۆ خوێنەری کورد هەیە. ■■■

مەراسیمی چلەی کۆچی هونەرمەند مەرزیە فەریقی لە ئەڵمانیا



هونەرمەند ناسری ڕەزازی هاوسەری "خاتوو مەرزیە فەریقی" ئامادەی ئەو مەراسیمە بوو

پەیامی کورد - ئەڵمانیا - کۆڵن - لە ڕێوڕەسمێکی پر شکۆدا و، بە بەشداری ژمارەیەکی زۆر لە خێزانە کوردەکانی شاری کۆڵن و دەوروبەری و، چەندین خێزبی شۆڕشگێڕی پارچەکانی کوردستان و، چەندین ڕێکخراوی کولتووری، لە شاری "Koeln - کۆڵن" ی ئەڵمانیا، چلەی کۆچی هونەرمەندی گەلەکەمان، خاتوو "مەرزیە فەریقی" بەڕێوەچوو. لەو مەراسیمەدا، چەندین پارچە موزیکی خەمیگین و هەندێ لە بەرهەمەکانی هونەرمەندی کۆچکردوو، پێشکەش کران، جگە لە وتار خوێندنەوەی پارت و ڕێکخراوە سیاسییەکان و کۆمەڵە کولتوورییەکان، هونەرمەند ناسری ڕەزازی هاوسەری "خاتوو مەرزیە فەریقی" ئامادەی مەراسیمەکە بوو و، تێیدا سوپاسی هاوخەمی و هاوکاری جەماوەری کوردستان و پارتە سیاسییەکان بە تایبەت "یەکێتی و پارتی و کۆمەڵە و دیموکرات"ی کرد، هەروەها هۆکاری جۆری نەخۆشی و کەموکوڕیی پزیشکەکان و سەرنەکەوتوویی نەشتەرگەرییەکەی بۆ ئامادەبوان ڕوون کردەوە، پاشان شاعیر و نووسەر شاهۆ تۆفیق و شاعیر حەمەڕەزا وتار و پارچە شیعری خۆیان پێشکەش کرد. مەراسیمەکە زیاتر لە چوار کاتژمێری خایاند، لە کۆتاییدا، ئامادەبووان، یەکە یەکە، پرسە و هاوخەمی خۆیان بۆ هونەرمەند ناسری ڕەزازی و بنەماڵەی فەریقی دووبارە کردەوە، داواشیان لە هونەرمەند ناسری ڕەزازی کرد، کە لە بەخشش و هونەر بەردەوام بێت. ■■■

داستانی مەملەکەتی باران

فرمێسک مستەفا - نەڵمانیا



پیاوێک لە قوڕ، بێ نیشتمان، بێ ناونیشان،
لە ناکاوە چرکەیەکدا لە دڵی دام، دەگەڕا
بۆ مشتە کۆڵە زەوییەک بیگرێتە خۆی،
دااڵدەی نەهامەتیەکانی بدات، لە سەر خاکی
پاراوی سۆزم پسوڵەی نیشتەجێبوونی
وەرگرت. پیاوێک لە قوڕ. ئەدیوو سێووری
ئازارەکانی بڕێبوو، بێ هیوا و ماندوو دەگەڕا
بۆ سینەیەک فرمێسکی مەینەتییەکانی لە
سەر هەڵبڕێژێت. ئامێزی خۆم بۆ والا کرد.
پیاوێک لە قوڕ، ڕێبوارێکی وونبوو بوو بۆ
سێبەری دەگەڕا، بوومە سایە و نەشئەی
تینوویەتی ئەو.. پیاوێک لە قوڕ، دۆڕاو لە
جەنگەکانی ژیاندا، شەکەت تەنها بێ لە
شکر، بوومە سەربازی چەتوونی، وەدووی
کەوتم ئیدی..
بووە وێژدانم
دیوانی شیعرم
سۆمای چاوانم
بە تووڵە ڕێ و کۆڵانە وێرانەکانی
ڕۆحم ئاشناکرد، هەناسە و سووتووی
یادگارییەکانم پێشکەش کرد. لە فەرهەنگی
سەگوڵی و شەوپیتەکاندا تاجە گوڵینەکەی
هۆنراوە و لاوکی شەوچەرەی منااڵیم خەاڵت
کرد. نیشتمانم بۆ کردە نێرگزەجار، بووە
پەرستگام و گشت نهێنیەکانی خودێم بۆ
درکاند، کردمیانە کافر، بە کافربوونی خۆم
بۆ ئەو ئاسودەبووم، ڤرێ درامە دۆزەخەی
ئەبەدی و بۆ من بە هەشت بوو... ئیدی..
تیشکی مۆم و بۆنی بوخربوو
نوقڵ و بادەم و مێووژ و جەژنانەم بوو
دەنگی تار و نایم بوو
سنوورەکانی نیشتمانم پێکەوە لکاند ،
نەخشەم بۆ خۆشبەختی کێشایەوە، چیرۆکی
عەشقی بووە داستانی لە پەڵەهەور..
بە سابلاغێ تێپەڕی
لە ماردینا پشووی دا
ئاسمانی سووری شەوێکی هاوینی
کەرکوکی
پژنی
ئەستێرەکان ماچ بارانیان کرد
لە قامیشلۆیا دابارین..
ئەوجاکە.. ئااڵ لە گەردنی سەرکەش چیاکانی
سلیمانییەوە
بووینە سەرگوزشتە
لە خانەقینا نمایشیان کرد بۆ..منااڵن..
ئەویش کردییە دەسرازەی لانکەکەی
گرۆکاڵی لەگەڵ دەکرد
شەوانە ژانی دڵم بۆ حەسرەتی دووری و
ناسۆری ژوانی ئەو گینگلی ئەدا، شیعرێ
لە دایک دەبوو بۆ ئەوێ شیعرێ، لەگەڵ
ئاسۆی بەرەبەیانیشدا. یەکەمین تەلیسمی
خۆرم دەکردە نامەیەک چەشنی پەپوڵە و
بە باڵندە ڕەوەندەکاندا بۆم دەنارد، ناز و
ڕازی دڵمی تیا تۆمار کرابوو، خواست و
حەزەکانیشم عەتر و گوڵاوی دوو تۆپی
نامەم بوو... تیا دەنووسرا ئەی گیانەکەم
خۆشم دەوێی، گەر دەتەوەێ بۆ ئەبەدی
شاژنی خەونەکانت بم. خواست و مەزەکانی
دڵی دوور لە کوردستانم ڕازی بکە.
ئەوحەزانەی لەمێژە وێڵیم ٢ جوامێرێ بۆمن
نەهێنایەدی، سوارچاکێ دەستی نەگرتم و بە
خاکی دەرویشانی نەناسیم، عاشقێ نەهات
تنۆکە بارانی سەرکێڵگەیەکە ئەوێ بکاتە
عەترێ و لەسەر گەردنمی جێ بهێڵێ...
خواستەکانم بەباڵا قورینەکەیدا هەڵواسێ و
چرپاندم بەگوێیدا.. خۆشم دەوێی کاتێ ببیە
خەندە بۆ ڕوخسارێکی پڕ لە پەژارە خۆشم
دەوێی کاتێ پێشڕەوی گەلێکی نەفام بیت
خۆشم دەوێی لەو چرکە لەدایک نەبووەی
کە ڕووبەڕووی یەزدان دەبیتەوە.. تا..
گەردوونی پڕ لە ئاشووبەی پاکژ بکاتەوە..
خۆشم دەوێی گەر ببیە نانێکی گەرم، بچیە
نێو دەستی هەژارێکەوە..
خۆشم دەوێی ئەوساتەی دەبیە شەماڵێکی
نەرم شانەی نازی سەر و پرچی ژاکاوم
بکەی
گەرکردمتە پەردە نێرگز و بەیبوون و
ڕێحانە
بەرگی بوکێنیم بێ
جۆگەیەکی سازگار تارام بێ
ئەڵقەی دەسگیرانیشم
گەاڵیەکی زەردی پایزەبێ..
کاتێ لێوا و لێو بوو لە خۆشەویستی من .
گەشکەی دەکرد بەسۆزی من تا ئەو ڕۆژەی
بە فیزێکەوە روانیە ئاوێنەی چاوەکانم و
بەخۆی گووت.. ئەم بەستە زمانە لە تاوم بۆ
تە یەزدانی عیشق و هەر ڕۆژەی گزرانیەکی
نوێم بۆپ دەچڕێ ... ئەونازانێ خەونەکانم
شاژنێکی دی تێدایە وەک تەخمی خۆم لە
قوڕ.. ئەو نازانێ من لە ڕۆحی باران ناگەم
لێی دەترسێم چونکە پێی ناوێرم و دەمکاتە
لیتاو، هیچی تر.. من ئافرتێکم دەوێ نەک لە
باران بەڵکو لە بیابان تا بمکاتە بتێکی بەردین،
ئیدی هەڵهات لە نیشتمانی من گەڕایەوە بۆ
نیشتمانە کونە پەپوو و شەمشە کوێران..
بەلووڕەی ڕەشەبادا لە گەڵ گیژەڵووکە
خۆاڵوییەکاندا.. نامەکانی دایە دەستم و
تیایدا دەنووسی من لە زستاندا دەڕمێم
وڵە بەهاراندا دڕووست دەبمەوە، کاتێ
دڕوستیش دەبمەوە خودی خۆم لە بیر
دەچێتەوە، لە نیشتمانی تەڕوپاراو ئۆقرەم
نییە و نامۆیەپێم بم بەخشە خواستەکانت
لە بەرگی قورپنی خۆمم دەردێتی، منێ فێرە
ئەم پۆشتەیەم و بۆم داناکەنرێ..
ئیدی بۆ هەتاهەتایە..
گلێنەکانمی بەقوڕ سواغ دا
جەستەمی بەقوڕ هەڵنجی
شیعرەکان زیندە بەچاڵ کران
ئارەزووەکانیش لە بابران
بووە ڕووبارێ لە لیتە و خەونەکانمی
دارماند
خۆم پێچایەوە لەگەڵ تنۆکە بارانێکا و
تۆزقاڵە خۆشەویستییەک کە هێندەی دنیا
یەک دەبوو، بەڕێکەتین بەرەو مەملەکەتی
باران....■■■

سپتیمبر ٢٠٠٥

ڤیزای ئێران لە ماوەی یەک هەفتەدا
ئاژانسی تۆریستی NEW PLAN
ئێمە ئامادەی خزمەت کردنی هاوڵاتیانی کوردی عێراقین
کوردستان لە ڕێگای تارانەوە
ڤیزای ئێران بۆ خێزانی پتر لە سێ کەس ١٢٠ €/کەس
گەشتی توریستی بۆ سەرتاسەری جیهان
بلیت بۆ سەرتاسەری جیهان
حەجی "عمرە"
Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E.Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de
تاران لە ٣٢٠€وە

لەبەرنامەیەکی سەتەلایتی کوردستاندا دووپات لەسەر دواکەوتویی ئاستی ژیانی گەنج لە کوردستان کرا و حکومەتیشی لێ بەرپرسیار کرا

بریکاری وەزارەتی کاروباری کۆمەڵایەتی حکومەتی هەرێم:
لاوان خۆیان تەمبەڵن، حکومەت هەڵی بۆیان هەیە، بەڵام ئەوان خۆیان نازانن بەکاری بهێنن.
لاوان: حکومەت خۆی پرۆژەی نیە و ئەم بێ پرۆژەییەش کاریگەری لەسەر گەنج کردووە.
گەنجێکی بەشداربوو: ئەگەر بریکاری وەزارەت ئەیەوێت مافی لاوان بدات، پێویستە دەست لەکار بکێشێتەوە، بۆیە من دەڵێم بەرێز تکایە ئیستیقالە بکە.

لە چوارچێوەی دۆسیەکانیدا بەرنامەی ئایینەی سەتەلایتی کورستان دۆسیەیەکی لەبارەی پرسی بێکاری لاوانی کوردستان و بەکارخستنی گەنج کردەوە و چەند ئەڵقەیەکی لەبارەوە پێشکەش کرد. بەڕێز عەبدوللا سالەح بریکاری وەزارەتی کار و کاروباری کۆمەڵایەتی حکومەتی هەرێمی کوردستان وەک سەرەکیترین لایەنی پەیوەندیداری بەرپرس میوانی ئەڵقەی یەکەمی ئەم دۆسیەیە بوو. ئەو پێی وابوو بەڵێ ئاستی ژیانی گەنج بەو شێوەیە نیە کە پێی دڵخۆش بن. بەڵام حکومەت لایەنە جیاکانی ئەم پرسەی فەرامۆش نەکردووە و هەوڵی خۆی هەر بۆ داوە. بەڵام ئەو بە پلەی یەکەم گەنج و لاوانی خۆیان بە فەرامۆشکەر وەسف کردوو و پێی وابوو بە پلەی یەکەم خۆیان بەرپرسن لەو دواکەوتوییەی ژیانیان، کە تێیدا دەژین و ئەو هەندێک جار ئەوانی بە تەمەڵ وەسف کرد و گوتی: "گەنجی کورد ئەمڕۆکە هەر بەدوای ئاسانکاریدا دەگەڕێت و نایەوێت خۆی ماندوو بکات و دەیەوێت رۆژی دوو کاتژمێر کار بکات و ئەویش نابێت هیلاک بێت و ئارەقە بڕێژێت و بەڵام دەبێت موچەیەکی زۆر بەرزی هەبێت و هەموو پێداویستیەکانی ژیانیشیان بۆ دابین بکرێت، کە ئەمە بەراستی تەمبەڵییە". عەبدوللا سالەح بریکاری وەزارەتی کار و کاروباری کۆمەڵایەتی حکومەتی هەرێمی کوردستان هەروەها ئاماژەی بۆ ئەوەش کرد، کە وەزارەتەکەیان چەندین فرسەتی کاری بۆ لاوان کردۆتەوە و گەنجانی کورد خۆیان نەیانتوانیوە سوودی لێ وەربگرن.

لەبەرامبەر ئەمەدا یاسین کە یەک لەمیوانەگەنجەکانی نێو ئەم دۆسیەیە بوو، وەڵامی دایەوە و گوتی: "بەراستی گەنجی ئێمە دنیای دیوە و حەز بە خۆشیەکانی ژیان دەکات. گەنج هەقی خۆیەتی تەنانەت لە کارگەیەکی چیمەنتۆشدا کاربکات و داوای پێداویستیەکانی ژیانی بکات".

هاوار ئەحمەدیش میوانێکی دیکەی ئەم ئەڵقەیە باسی لەوە کرد کە حکومەت تەنها بۆ دەزگاکانی ئاسایش و بۆ بەپۆلیس کردن گەنج دەخاتە بەر کار بۆ ئەوەی دواجار شەڕەکانی خۆیانی پێ بکات.

لە ئەڵقەیەکی دیکەی دوا ئەم ئەڵقەی ئاماژە بۆکراوادا ئایینده کۆمەڵێک گەنجی دیکەی رووبەروی بریکاری وەزارەتی کاروکاروباری کۆمەڵایەتی کرد و کارمەند بەکر یەک لەو دەکات و لاوانیش کاری تێدا دەکەن. ئەمەیە بەکار خستنی گەنج".

ناوبراو هەورەها گوتی: "بەراستی گەنجی ئێمە دنیای دیوە و حەز بە خۆشیەکانی ژیان دەکات. گەنج هەقی خۆیەتی تەنانەت لە کارگەیەکی چیمەنتۆشدا کاربکات و داوای پێداویستیەکانی ژیانی بکات".

هاوار ئەحمەدیش میوانێکی دیکەی ئەم ئەڵقەیە باسی لەوە کرد کە حکومەت تەنها بۆ دەزگاکانی ئاسایش و بۆ بەپۆلیس کردن گەنج دەخاتە بەر کار بۆ ئەوەی دواجار شەڕەکانی خۆیانی پێ بکات.

لە ئەڵقەیەکی دیکەی دوا ئەم ئەڵقەی ئاماژە بۆکراوادا ئایینده کۆمەڵێک گەنجی دیکەی رووبەروی بریکاری وەزارەتی کاروکاروباری کۆمەڵایەتی کرد و کارمەند بەکر یەک لەو لاوانە بوو کە گوتی: "حکومەت پرۆژەی نییە". راستەوخۆ رووی لە بریکاری وەزارەت کرد و گوتی: "ئەگەر دەتەوێت مافی گەنج بدەیت، فەرموو ئیستیقالەی خۆت تەقدیم بکە و دەس لە کار بکێشەوە با گەنجێک بێتە جێگەی تۆ. چونکە ئێوەن هەقی گەنج دەخۆن و نایەڵن بە مافەکانیان بگەن". بەڵام بریکاری وەزارەت ئەم مافەی بە هی لاوان نەزانی و گوتی: "من ئەم جێگەیە بۆ گەنجێک جێناهێڵم کە ئەساسەن خۆی پرۆژەی نیە و تەمبەڵە".

جێگەی ئاماژە پێدانە، ناوبراو تۆمەتبارکرا بەوەی ئیهانەی لاوانی کوردی کردبێت، بۆیە ئیعتزاری هێنایەوە و "گوتی من ئیهانەی گەنج ناکەم، بەڵام بە شێوەیەکی سەرەکی لاوان خۆیان بەرپرسن لەرەوشی ژیانیان، پاشان حکومەت.



هەوڵەکانی پێکهێنانی پەرلەمانی لاوان روبەرووی هەڵمەتێکی دژایەتی دەبنەوە

گوتەبێژێکی ریکخراوی تواناسازی لاوانی کوردستان:
رۆژنامەکان هەموو ئەو شتانەیان بڵاو کردەوە کە دژ بە ئێمە دەنوسران، بەڵام وەڵامنامە و راگەیاندننامەی ئێمەیان فەرامۆش کرد.

ریکخراوی تواناسازی لاوانی کوردستان لە هەرێمی کوردستان خەریکی چەند پرۆژەیەکە بۆ پێکهێنانی پەرلەمانی لاوانی کوردستان، بۆ ئەم مەبەستە کۆنفرانسێکی لە پایتەختی هەرێم سازدا و ئێستا کاری دیکەی بۆ دەکات، ئەم پرۆژەیە لە لایەن چەند سە رچاوەیەکی ئاشکرانەکراو و چەند نێوەندێکەوە خراپ وەسفکرا و لە چەندین رۆژنامە و نێوەنددا فشاری بۆ دروستکرا و هەوڵەکانی نەرێنی لێکدرایەوە. بەجۆرێک باس کرا کە دەستی لەپشتەوەیە و حزب دەیەوێت لەم رێگەیەوە گەنجی هۆشیار کۆبکاتەوە و بۆ بەرژەوەندیەکانی خۆیان بەکاریان بهێنن.

لەم بارەیەوە گوتەبێژێکی رێکخراوی تواناسازی لاوانی کوردستان بە پەیامی کوردی راگەیاند ئێمە بەردەوامین لە پرۆژەکانمان و ئەو شتانە هیچ لە کارەکانمان کەم ناکاتەوە و ئێمە هەمیشە گوتومانە تا گوێگرتن فێر نەبین، نابین بە قسەکەرێکی باش بۆیە ئەو شتانەش ئاساییە لامان و ئەگەرچی زۆریان پێمان وایە دەستی لە پشتەوە هەیە و جۆرێکە لە کاری نەیاران دژ بە خواستەکانی لاوان، بەڵام هەمو شتێکیش قابیل بە رەخنەیە وبە سنگێکی فراوانەوە وەری دەگرین. بەڵام لەگەڵ ئەوەشدا شتێک هەیە کە حەز دەکەم باسی بکەم کە زۆر لە رۆژنامەکانی کوردستان هەموو ئەو شتە بێ بنەمایانەیان بڵاو کردەوە کە دژ بە ئێمە نوسران، بەڵام ئامادە نەبوون تاقە وەڵامنامەیەکی گشتی ئێمە و راگەیاندنەکەمان بڵاو بکەنەوە. بۆیە دەکرێت بڵێین زۆری ئەو شتانەی دژ بە ئێمە نوسران بڵێین هەوڵی تێکدەرانەن و دەستیان لە پشتەوە یە و هەقە لاوان گومانیان لەوە هەبێت. سەربارەت بەخۆشمان وەک پێشتر لە وەڵامنامەکەدا گوتومانە با تا خستنەڕووی پێشهاتەکان تەنها گومان بێت و ئەو کات کە شتەکان دەرکەوتن بڕیاری لەسەر بدەن.

www.kurdistanwalk.org

قەزاقەکانی ناوچەی کوبان شەڕی چی دەکەن؟

لە وڵایەتی کراسنادار خەڵکێکی-تریش دەردەکەن!

لە"ناوەراسیسک" بەرەو ناوچەی کریمە لە کراسنادار دەچین. دیمەنی شارۆچکەکان، گوند و ویستگەکانی شەمەندەفەر لەبەر چاومان تێدەپەڕن. پەیتا پەیتا زەوی کێڵدراو دێتە بەرچاومان. شوفیرەکە بۆمان ڕوون دەکاتەوە: "هەر لە ساڵی ڕابردوودا لێرە تورکەکانی مەسقەتی کاریان دەکرد. تەماتە و بۆرهەمی‌تریان دەچاند، بۆڵام ئیستا ئەوان یا بۆ ئەمریکا چوون، یا خەریکی ئامادەکردنی بەڵگەن بۆ دەربازبوون."

چ کۆڕوکۆمەڵێک لە دەرکردنی تورکەکان لەم ناوچەیە کەڵک وەردەگرێ؟ دیارە خودی تورکەکان کە بەم ناوچەیە ڕاهاتوون و ئێستا بە دژواری لێی دەپچڕێن. هەندێ بنەماڵە تووشی کارەساتی سەیر بوون. دایکەکان منداڵەکانیان لە باوکیان دەشارنەوە، بۆ ئەوەی ڕەوانەی وڵاتی نامۆ نەبن. بەڵام لەو هەزاران کەسە کە لەمەوبەر بۆ ئەمریکا کۆچیان کردووە، هەواڵ دەگات کە لەوێ بە باشی وەریان گرتوون، کاریان داونەتێ و منداڵەکانیان ڕەوانەی قوتابخانە کراون....

بەڵام ئێمە ئێستا بۆ لای تورکەکان ناچین. لە ویستگەی "نابرژاوسک"ی ناوچەی کریمە نوێنەرانی ڕەگەزیکی‌تر داوای چاوپێکەوتنیان کردوە... یەزیدییەکان.

یەزیدییەکان خەڵکێکی ڕەسەن و لەمێژینەن کە مێژووەکەیان بۆ سەدەی شەشەمی بەر لە زایین و ڕەنگە بۆ مێژوویەکی زۆر لەمە کۆنتر، تەنات بۆ سەردەمی ئیمپراتوری بابل بیەکان دەگەڕێتەوە. لە سەدەی حەوتەمی زایینیدا، یەزیدییەکانی هەتاوپەرست کێشرایە دژایەتی و ناکۆکی لەگەڵ دوولاباڵی سەرەکی ئیسلام و لە ئاکامدا مەجبوور بوون شوێنی سەرەکی ژیانیان، واتە مزوپوتامیا بە جێهێڵن و لە وڵاتانی هیند و ئێران و تورکیا و عێراق و سوریا بڵاوبنەوە. *1بەشێک لە یەزیدییەکان ئایینی ئیسلامیان پەسەند کرد و لەمەوبەر ئیتر بە ناوی کورد ناسران و ئەوانی‌تر ناو و ئائین خۆیان پاراست.

یەزیدییەکان لە دوای ساڵی ١٩١٨ی زایینیدا، لە ئەرمەنستانی یەکەتی سۆڤیەت نیشتەجێ بۆن. بومەلەرزەی قورس و تێکەدەری ساڵی ١٩٨٨ی ئەرمەنستان، بەشی هەرە زۆری گوند و ناوچە یەزیدییەکانی گرتەوە. ماڵەکانیان تێکڕما و سامانیان لەناو چوو. شەڕ لە سەر ناوچەی قەرەباغ لە نێوان ئەرمەنستان و ئازەربایجان بەرە بەرە هێز و توانای ئەرمەنستانی دەسوانەوە و بۆ بنیاتنانەوەی سەر لە نوێ ژیان، کەس بە هانای یەزیدییەکان نەگەیشت و یارمەتییەکانی مرۆڤدۆستانەیان، هەر بەرچاو نەکەوت. بیر و ئامانجی شەڕی قەرەباغ بۆ ئەم کۆمەڵەیە بێگانە بوو

نیکۆلای ریشکوف سەرۆک وەزیری ئەوکاتەی یەکێتی سۆڤیەت کە لە ناوچەکانی کاوکڵراو دێنشاری دەکرد، لە وەڵامی یەزیدییەکانی مەینەت دێنێو، پێشنیاری پێیان کرد تا بۆ ناوچەی کوبان کۆچ بکەن. ئا بەم جۆرە لە ساڵە کانی١٩٨٨-١٩٩١ دا، زیاتر لە ٥/٥ هەزار یەزیدی لە ناوچەی کراسنادار، نیشتەجێ بوون. ئەوان هیچ کەڵکێکیان لە یارمەتییەکانی دەوڵەت وەرنەگرت و تەنیا بە نرخێکی نزم ماڵ و زەویان لە تاتارەکانی کریمە کڕێ.

لەو سەرەتادا دانیشتوانی ناوچەکە بە چاوی هاوەردی و دۆستانە دەیانڕوانیە یەزیدیەکان و هاوسێکان یارمەتیان دەدان بۆ ئەوەی بتوانن لەگەڵ شوێنی نوێ ڕابێن. باغ و بێستانداری بوون بە سەرچاوەی سەرەکی داهاتی یەزیدییەکان کە هەر لەم بوارەدا بەئەزموون بوون.

تێکچوون و نەمانی یەکەیەتی سۆڤیەت ئیتر یەزیدییەکانی لە ڕوسیادا، نیشتەجێ کرد. ٩٠٪ یەزیدییەکان بەڵگەنامەی شورای دێیان لەدەستدایە کە پێیشان دەدات، ئەمانە بەر لە ٦ فوریەی ساڵی ١٩٩٢، نیشتەجێی کراسنادار بوون. واتە بە پێی بەشی یەکەمی بڕیاڕی ژمارە ١٣ی یاسای شاروەندی ڕوسیا، یەزیدییەکان شاروەندی ڕوسیا دەژمێردرێن. بەڵام یەزیدییەکان، لە زمانی کاربەدەستێکی بەرزی کراسناداریان بیست کە ژمارە و ڕێژەی دانیشتوانی ئەم ئەیالەتە یەکجار زۆرە و کار بەدەستانی ناوچەکە بەو بیانوویە، لە تومارکردنی ناوی ئەم کۆمەڵە خەڵکە خۆیان پاراستووە.

پاشان و لە کاتێکدا کە مەسەلەی وەرگرتنی شاروەندی ڕوسیا هاتەکایەوە - دیسانیش وەڵامی "نا"یان بیست. لەم ناوچەیەدا، کار بەدەستانی داموودەزگاکان، یاساکانی ناوەندی، بە پێوانەی خۆیان دەپێون. وا دەرکەوت کە بە دوای ١٧ساڵ ژیان لە شاری کوبان، یەزیدییەکان لێرە هەر بێگانە دەژمێردرێن. نزیکەی هەزار کەس لەمان توانیان بەڵگەی شاروەندی لە ناوچەکانی‌تر وەدەست بێنن. بەڵام ئەمانەش هەر ئازار دەدرێن. قەزاقەکان ڕادەگەیەنن: "تورکەکان بۆ ئەمریکا دەرباز دەبن، دەی ئێوەش دەستبێ بکەن. لێرە ئێوە هیچ کارێکتان نییە!

بۆ لێکۆڵینەوەی ئەم بابەتانە، یەزیدییەکان لە ویستگەی نابرژاوسک، بانگەوازی منیان کرد. لام وا بوو دەبێت بە ماڵاندا بگەڕێم و سەری ئەم ماڵ و ئەو ماڵ بدەم بۆ ئەوەی شارەزای بارودوخی ژیانی خەڵکەکە بم، بەڵام وا دیاربو هەلسەنگاندنەکەم هەڵە بوو، نەک دانیشتوانی ویستگەیەکی بچوک بەڵکو کۆبونەوەی گشتی نوێنەرانی یەزیدی ئەیالەتی کراسنادار پیشوازیان لێم کرد.

چەند مێز و کورسی لە کۆلانێکی نزیک ڕیزکرا، تونکەی ئاو و چەند ئیسکان لەسەر مێزەکان دانرا. نیشانەکانی کۆبونەوەیەکی ڕەسمی. بەشدارانی کۆبونەوەکە دەستیان بە خۆناساندن کرد: نوێنەرانی ناوچەی ئاناپا، ناوەراسیسک، کراسنادار، ئیسک، تمروک، گولکاویچی، خالمسکایا، نابرژوسکایا و ...

وتوێژێکی دوور و درێژ دەست پێدەکات، باسی ئەمە دەکەن کە یەزیدییەکان چیین، چۆن گەیشتوونەتە ئەم ناوچەیە، چۆن بەبێ سەنەد و پێناسە ماونەتەوە، چۆن مافی کارکردنیان نییە و "دەترسین بچینە ئیدارەی پاسپورت و قیزای ناوچەی کریمە، لە هۆڵی چاوپێکەوتنی ئەم ئیدارەیە هەر ماوە هەڕەشەی دیپورتمان لێبکەن." ئەمە وتەکانی "جاسن جولایان"ە. بۆ کام شوێن دەتوانن دیپۆرتی ئەم کۆمەڵە خەڵکە بکەن کە بەر لە تێکڕمانی یەکەیەتی سۆڤیەت هاتوونە ئەم ناوچەیە؟ وا دیارە حەوڵی گەڕاندنەوەی یەزیدییەکان بۆ ئەرمەنستان بۆ وەرگرتنی پاسپۆرت لەگۆڕێدایە. هەر چەند ئەوان تەنانەت بۆ ڕۆژێکیش شاروەندی ئەرمەنستان نەبوون. ئەنجامی ئەم کارە بۆ کاربەدەستانی ناوچەکە نەرەخسا.



"ئیسکو گاسایان" باسی ئەمەی کرد کە لە ناوچەی "گولکاویچ" سەر بە "کراسناسلسک" کە ٨٦ بنەماڵەی یەزیدی لێیە، لە قوتابخانەی ژمارە ١٦، ئیزنیان بە منداڵەکان نەدا بچنە کلاسی دەرس، داوای بەڵگەی مافی مانەوە و یا خود بەڵگەی مافی ژیانی کاتی، دایک و باوکیان لێکردن. سەرۆکی کۆڕی بەڕێوەبەرایەتی ڕایگەیاند: "ئێمە کۆبوونەوە و بڕیارمان دا تا بەڵگە و سەندی پێویست نەهێنن، ئیزن نەدەین منداڵەکان بچنە قوتابخانە."

بەڵێ، ئا بەم ئاسانیە لە ئەیالەتی کراسنادار بڕیار دەدرێت، کۆبونەوە و بڕیارمان دا: "یاسای بنەڕەتی ڕوسیا پێشێل بکەین!" مافی بەشدار بوون لە چاوەدێری پزیشک، مافی دەورانی لەکار بونەوە و مافی ژیانی ئاسایی- ئەمانە گشتیان نەک بۆ یەزیدییەکانە، چۆن قەزاقەکان بە بێگانە دەیانناسن. ساڵەکانی درێژی کار کردن لە یەکیەتی سۆڤیەت لە لایەن پێشیلکەرانی یاسا لە کراسنادار بێبایەخ ڕاگەیاندراوە.

یەزیدییەکان تەنیا ڕیگایەک لە بەرامبەر خۆیاندا دەبینن. دەرباز بوون و کۆچ کردن لەم ناوچەیە. یەزیدییەکان نامەیەکیان دامی و داوایان لێکردم کە بیدەمە دەست باڵوێزی ئەمریکا لە موسکو. ئەمە نامەیەکی سەر کراوەیە. ئەمەش دەقی نامەکە:

بەڕێز برنس!

"دەوڵەتی ئەمریکا بە دانی مافی پەناهەندەگی بە تورکەکانی مەسقەتی دانیشتوی ئەیالەتی کراسنادار، هەنگاوێکی بەشەر دۆستانەی گرنگی هەڵگرتووە. بەڵام کردەوە و جیاوازی دانان لەلایەن کاربەدەستانی ناوچەکە بەرامبەر بە خەڵکی‌تر و هەروەها یەکێک لەوان واتە یەزیدییەکان، چی لەمە کەمتر نییە.

کاربەدەستانی ئەیالەتی کراسنادار دریژە دەدەن بە سیاسەتی جیاوازی دانان بەرامبەر بە کەمایەتییەکانی خاوەن ڕەگەزی‌تر و ئەوان بەردەوام تووشی جەریمە و باج و پیتاک دەکەن بە هزی نەبوونی بەڵگەی مانەوە کە بۆ خزیان پێشلی دەکەن و مافی ژیان و کاری یاساییان نادرێتێ و منداڵەکانیان بە هزی نەبوونی بەڵگەی پێویست و دەرەتانی خوێندەواری و مافی کارکردنیان پێنادرێتێ و بە تەواوی داماتوویان کەوتوتە بەر مەترسی.

ئەندامانی کۆمەڵی ئێمە بەردەوام تووشی سوکایەتی پێکردن و جیاوازی جوراوجور دەبن. داوامان لێت هەیە بەوردی لە گیروگرفتی ئێمە بکۆڵنەوە و ئیمکانی داڕژتنی پرۆگرامی دانی مافی پەنابەری لە ئەمریکا بە ئێمە، هەلسەنگنین."

لە کۆتایی نامەکە ئیمزای ئەندامانی ناوچە جۆربەجۆرەکان بەر چاو دەکەوێت.

پیرەژنێکی بەتەمەن لە دوای کۆتایی کوبونەوەکەدا، بۆ لام هات و گوتی: "ئەمن نامەوی ئێرە بەجێبهێڵم: ئاخو چۆن دوای چەندەها ساڵ کارکردن، من مافی لە کارکەوتوویی و چوونە لای پزیشک و ژیانی ئاسایی لە ماڵی خۆمدا نەبێت؟

من وەڵامی ئەم پرسیارەی نازانم و ئەویش هەروەها چاوەڕوانی وەڵام لە لایەن منەوە ناکات. تورکەکان لێرە دەژین، زوو یا درەنگ یەزیدییەکانیش ئێرە بەجێدەهێڵن... قەزاقەکانی کوبان شەڕی چی دەکەن؟ ■■■

سویتلانا گانوشکینا -
سەرۆکی کۆمیتەی "یارمەتییەکانی شاروەندی"
ڕۆژنامەی "ناوای" ئۆکتوبەری ٢٠٠٥
وەرگێڕ: نوری - ڕوسیا

بڕیاری ١٦٣٦

سەرەتای تونێلە درێژەکەی سوریا!



نزار جاف

دەرچوونی بڕیاری ئەنجومەنی ئاسایشی نێودەوڵەتی١٦٣٦ بە کۆی گشت دەنگەکان، دەسەڵاتدارییەتی بەعسی سوریای خستە بەرامبەر ڕووبەڕووبونەوەیەکی سەخت و مەترسیدار کە ئەگەرەکانی گۆڕینی سیستەمی سیاسی سوریا یەکێکە لەو پێشبینییانەی لێی دەکەوێتەوە. هەڵبەتە دەسەڵاتدارییەتی سوریا هەوڵێکی بێ وچانیدا تا ڕێبگرێت لە دەرچوونی بڕیارێکی لەم جۆرە و، هەر بۆ ئەو مەبەستەش هەوڵیدا لە ڕێگەی تەوەری "مۆسکۆ - بەکین"ەوە، بەربەستێک لە بەردەم هەوڵەکانی "واشنگتۆن - پاریس"دا دابنێت. گومان لەوەشدا نییە کە ڕوسیا هەمیشە لە هەوڵی ئەوەدایە کە جۆرە بوونێکی خۆی لەسەر گۆڕەپانی نێودەوڵەتی بسەلمێنێت بەڵام بە بێ ئەوەی توانای ئەوەی هەبێت کە بیسەپێنێت، چونکە باری ئابووری داتەپیوی ڕوسیای دوای داڕمانی یەکێتی سۆڤیەتی جاران، سەربارى بارودۆخى شڵەقاوى سیاسى، پێگەیەکى بەهێز بۆ ڕوسیا دابین ناکەن. هەر لێرەشەوە، ڕوسیا نەیتوانی هیچ کاریگەرییەکی ئەوتۆی لەسەر دەرچوونی ئەو بڕیارە بکات، بەڵکو توانی بە ڕادەیەگی دیاریکراو بڕگەیەکی هەڵپەسێرێت"نەک لایبەرێت"ی، بەو جۆرەش سوریا خرایە سەرەتای تونێلێکی درێژەوە کە کۆتاییەکەی هەگیز بە سوودی ئەو نابێت. هەرچەندە دەسەڵاتدارییەتی سوریا بەر لە دەرچوونی ئەو بڕیارە کۆمەڵە هەنگاوێکی بەناو ڕیفۆرمسازانەی نا و، ئاماژەی بەوەدا کە بەعسی سوریا دەخوازێت کێشەی کورد لە سوریا چارەسەربکات و، باس لە فراوانکردنی بنکەکانی دەسەڵات دەکرا، سەرەڕای ئەوەی کە سەرۆک بەشار ئەلئەسەد دوابەدوای سەردانەکەی سەرۆک حوسنی موبارەک بۆ دیمەشق، کۆمیتەیەکی لێکۆڵینەوەی سەبارەت بە تیرۆرکردنی ڕەفیق حەریری پێک هێنا. بەڵام هەموو ئەم هەوڵانەی سوریا نەیانتوانی کۆمەڵگەی نێودەوڵەتی قایل بکەن کە دەست لە فشار دژی دیمەشق هەڵبگرێت و، متمانە بکات بە نیازی پاکی سوریا سەبارەت بە چارەسەرکردنی کێشە جیاوازەکانی. لێرەشدا، دەکرێت باس لە ئاکامە چاوەڕوانکراوەکانی ئەو بڕیارە بکەین لەسەر داهاتووی سیاسی سوریا کە پەرەپێدانی کێشەی کورد لە سوریا خاڵێکی گرنگی پێک دەهێنێت و، هەر بۆ ئەو مەبەستەش حکومەتی سوریا و، حزبی بەعسی دەسەڵاتدار ناو بە ناو هەواڵیان دزە پێ دەدا کە گوایە بە نیازن چارەسەری کێشەی کورد لە سوریا بکەن. بایەخ پێدانی لە ناکاوی دیمەشق بە دۆزی کورد سەرباری ئەوەی کە سوریا مەترسییەکی گەورەی لەوە هەیە کە هەمان سیناریۆی کوردستانی باشوور لە کوردستانی ڕۆژاوادا دووبارە بێتەوە، کەچی لە هەمان کاتیشدا، ئەو ڕاپۆرتانەی کە باس لە ئەگەری پێشوازیکردنی کۆشکی سپی ئەمریکا لە هەندێ سیاسەتمەداری کوردی ڕۆژاوا دەکات، بە جدی وەردەگرێت و، کۆششی ئەوە دەکات کە وەک فێڵێکی سیاسی پاشقول لەو کارە بگرێت. ئەمە و، ئەگەر پێشوازییە شکۆدارەکەی سەرۆکی کوردستان لە خۆشکی سپی بهێنینەوە یادمان و، ئەو ڕاپۆرت و شرۆڤە سیاسییانەی کە قسەیان دەکرد لە ڕاوێژکردنی گەورە بەرپرسانی ئەمریکا بە کاک مەسعود بارزانی سەبارەت بە دۆزی کورد لە سوریا، گرنگی و بایەخی کوردی لە گەمە سیاسییەکەی سوریادا دەخاتەڕوو. گومان لەوەشدا نییە کە دەوڵەتەکانی ناوچەکە هەوڵێکی ئەوتۆیان داوە کە ڕۆڵی چاوەڕوانکراوی کورد لە ئایندەی سوریادا کەم بکەنەوە یان لانی کەم سنووردارى بکەن، بەتایبەتی دوای ئەو ڕۆڵ و پێگە نائاساییەی کە کورد لە کوردستانی باشووردا وەدەستیان هێنا. دەشکرێت ئاماژە بە نیگەرانی ئەنکەرە و تاران لە پێشهاتە سیاسییە چاوەڕوانکراوەکانی دوای پیادەکردنی بڕیاری١٦٣٦ بکەین و، کاریگەرییەکانی هەر گۆڕانکارییەک لە سوریا و بەرجەستەتربوونی ڕۆڵی کورد لە ئایندەی سیاسی ئەو وڵاتەدا، ئاکامەکانی لە ئاماەد و دەرسیم و مهاباد و مەریوان و کرماشان دەردەکەوێت. ■■■

باهۆزی گۆڕانی ناوچەکە هەڵیگرد



بارزانی لە ساڵی ١٩٩١یشدا، جۆن مێجەر و مەلیکەشی بینیبوو، بەڵام بە شێوەی ڕەسمی و لەم جۆرە، بۆ یەکەم جارە لە میژوودا ئەم دیمەنە دەبینێتا

مستەفا چوارتایی- سیاسییەکی عەرەبی بۆ کەناڵی "الجزیرة" دەیگوت: "هەر کە مەجلیسی ئەمن دانیشت، ئیمە لەرز دەمانگرێت." ئەم ساسییە دەزانێ لەگەڵ هەر کۆبوونەوەیەکی ئەنجوومەنی ئاسایشدا، بڕیارێکی چارەنووسساز بەڕێوەیە و، ئەو بڕیارەش دژ بە بەرژەوەندی باڵای عەرەبە، ئەوەی کە نایزانێ ئەوەیە، بۆ ڕژێمە عەرەبییەکان لە کەلی شەیتان نایەنە خوارەوە و ناتوانن لە ناو وڵاتەکانی خۆیاندا ریفۆرم بکەن و لەگەڵ گیانی سەردەم و دیموکراتی و مافەکانی مرۆڤدا، خۆیان ڕابێنن. سەرەڕای بەڵاڵای کەللەڕەقی سەرانی عەرەب و پێوەستبوونی تا ڕادەی شێتبوونیان بە کورسی فەرمانڕەوایەتییەوە، جەماوەری ڕەشۆکیشیان بە بەشێک لە بیرە چەقبەستووەکانی خۆیانەوە، سەرقاڵ کردووە.

لە دانیشتنی هەفتەی ڕابردووی ئەنجوومەنی ئاسایشدا، فاروق شەرع ی وەزیری دەرەوەی سووری بە جۆرێک پەشۆکابوو، نەیدەزانی چی دەڵێت، کاتێک بڕیاری ١٦٣٦یش دەرچوو، دیمەشق بە خراپترین پێشبینی وەسف کرد. لە کاتێکدا لە ئەنجوومەنی ئاسایش، گفتوگۆ و شەڕەوتار و وەڵامدانەوەی یەکتری بوو، لەو کاتەدا"٢٠٠٥/١٠/٣١" سەرۆکوەزیرانی بەریتانیا، تۆنی بلێر پێشوازی سەرۆکی کوردستان مەسعود بارزانی دەکرد، هەڵبەتە بارزانی لە ساڵی ١٩٩١یشدا، جۆن مێجەر و مەلیکەشی بینیبوو، بەڵام بە شێوەی ڕەسمی و لەم جۆرە، بۆ یەکەم جارە لە میژوودا ئەم پێشوازییە و یەکەم جاریشە سەرۆکوەزیری بەریتانیا ناوی "کوردستان" بهێنێت! ئەمە ئەگەر بێت و لە ساڵی هەشتاکاندا ڕووی بدایە ئەوا دەبووە موعجیزەی زەمانە، بارزانی چۆن لە سەردانەکەی ئەمریکایدا، زۆربەی گەورە بەرپرسانی ئەمریکی بینی و دواتریش ڕەوەندی کوردی بەسەر کردەوە، لە بەریتانیاش بە هەمان شێوە، سەرۆکوەزیر، وەزیری بەرگری، ووەزیری دەرەوەی بینێ و لە پەرلەمانیشدا کێشەی کوردی بۆ پەرلەمانتاران ڕوون کردەوە، بە بڕوای من سەردانەکەی بەریتانیا و پێشوازیکردنی بلێر، لە سەردانی ئەمریکا گرنگتر بوو، ڕاستە ئەمریکا تاکە هێزی دنیایە، بەڵام مەزنی و کاریگەریی سیاسەتی بەریتانیا لە سەر جیهان و خودی ئەمریکاش شتێکە ماندەڵ ناکرێت. دوای دیدارەکەی بلێریش بە هەمان شێوەی ئەمریکا، لەگەڵ ژمارەیەکی زۆر لە ڕەوەندی کورد، کۆبوونەوە کە لە نێوان میوانەکانیشدا، سەفیری عێراق و سوریا، دەبینران. بە ڕاشکاوی باسی لە ڕەوایەتی دروستکردنی دەوڵەتی کوردی کرد و ئاماژەی بۆ ئەوەش کرد کە کاری بەردەوام و هەنگاوی ستراتیژی دەوێ. ئەوەی جێی خۆشحاڵییە، لە کۆنجی وڵاتێکی گەورەی داگیرکراو و دابەشکراودا، خۆری زەردی هیوا و ئومێدی ڕزگاری، تیشک تیژتر دەهاوێژێ، لەو بەشەدا کە باشووری کوردستانە، لەگەڵ هەموو سەرنج و تێبینییەکانمان سەبارەت بە گەندەڵی و خۆدەوڵەمەندکردنی زۆرینەی بەرپرسان، لەگەڵ ئەمانەشدا، کاری بنیاتنان و ئاوەدانی و فێربوون و زانست بەردەوامە، هەوڵدان بۆ یەکگرتنەوەی دوو ئیدارەکەی حکومەت بە بنبەست نەگەیشتووە، سەردانی ئەرپرسانی کورد بۆ ئەورووپا و شوێنەکانی دیکەی جیهان بەردەوامە، خۆئامادەکردن بۆ بەشداری لە هەڵبژاردنەکانی داهاتوودا، هەیە، بە پێچەوانەی پشێوی ناوچەکانی دیکەی عێراق، کوردستان، ئاسایش و ئارامە. دەتوانین بڵێین ئومێد هەیە، ئاسۆ ڕوونە، دڵنیام دوای ئەم سەردانەی بارزانی بۆ ئەمریکا و بەریتانیا، زۆر درگای دیکەی داخراو لە کورد دەکرێتەوە، ئەوانەی تا ئێستا پێوەندی کوردیان ڕەت دەکردەوە یان هەر دانیان بە کوردا نەدەنا، خۆیان لەمەودوا دەستپێشخەری دەکەن و پردی پێوەندی هەڵدەبەستن، بۆیە سەردانی ئەم دواییەی بارزانی بۆ واشینگتۆن و لەندەن وەرچەرخانێکی مێژوویی گرنگە، هاوکات لەگەڵ هەوڵە دیپلۆماسییەکانی کورد، پشێوی ژوورە داخراوەکانی سەرانی عەرەب و ناوچەکەی داگرتوە؛ سوریا لە پەلەقاژەی مەرگدایە و پەنا بۆ هەموو لایەک دەبات، میسر هەوڵەکانی دەخاتە گەڕ بۆ ڕزگارکردنی سوریا، لوبنان و ئوردن خۆشحاڵن بەو گۆڕانکارییانە، تورکیا تەواو بێزارە و ناوبەناو هەڕەشەی هێرشبردنە سەر باشووری کوردستان دەکات، ڕووداوەکان بەو ئاراستەیە دەڕۆن، وڵاتە دروستکراوە نائارامەکان گۆڕانکاری لە نەخشەکانیاندا دەکرێت، خودی ئەو وڵاتانەش بیانووی دەستێوەردانی دەرەکی بە دەستەوە دەدەن و دەبنە هۆکاری نائارامی، بۆیە دەتوانین بڵێین؛ باگۆزی گۆڕانکاری ناوچەکە دەستپێ کرد. ■■■

ئەمریکا وەڵامێکی نەگەتیڤی دا، لایەنی تورکیش دانشتنەکەی بەجێهێشت!

. ڕۆژنامەی صەباحی تورکی٢٠٠٥/١٠/٣١- ئاڵای کوردستان کە لە خاڵی سنوری ئیبراهیم خەلیل بەرزکراوە، بووە جێگایی نیگەرانی لایەنی تورکی و هەمیشە تورکیا هەڵی ئەوە دەدات کە حکومەتی کوردستان ئاڵای عێراق لە جیاتی ئاڵای کوردستان دابنێت، بۆ ئەم مەبەستەش بەرپرسیارانی کورد، تورک و ئەمریکی کۆبوونەوەیەکیان سازکرد و لەم کۆبوونەوەدا لایەنی تورکی داوای کرد کە چیتر ئاڵای کوردستان نەمێنی و لە جیاتی ئەو ئاڵای عێراق دابنێن. دوایی کە بەرپرسیارانی کورد ئەم داواکارییەی تورکیایان ڕەتکردەوە، لایەنی تورکی داواکاری خۆیان خستە بەردەم لایەنی ئەمریکی بۆ ئەوەی ئەوان ئاڵایی کوردستان بێننەوە خوار و ئاڵایی عێراق بەرزبکەنەوە. بەرپرسیارانی ئەمەریکیش وەڵامی تورکەکانیان دا و گوتی؛ "ئەم کێشەیە کێشەی ئێمە نییە، ئەمە کێشەیەکە کە نێوان ئێوە و عێراقدا". ئەم وەڵامدانەوەی ئەمریکی بۆ جێی دڵتەنگی بەرپرسیارانی تورک، بۆیە بەتۆڕەیەوە کۆبوونەوەکەیان بەجێهێشت.■■■



لە ماوەی ئەمسااڵدا:

٣٦٠ کورد لە موسڵ تیرۆر کراون

لە ماوەی هەشت مانگی دواییدا، کۆچی خێزانانی کورد لە موسڵەوە بەرەو شارەکانی دیکەی کوردستان٦٠٪ زیادی کردووە. بە پێی سەرچاوەیەکی ئاگادار لەو هەشت مانگەی دواییدا ڕێژەی کۆچی خێزانانی کورد لە موسڵەوە بۆ سار و شارۆچکەکانی دیکە ٦٠٪ زیادی کردووە. بە گوێرەی ئەو سەرچاوانە تا ئێستا زیاتر لە ٥٠٠ خێزانی کورد شاری موسڵیان بەجێهێشتووە بە هۆی هەڕەشەی گرووپە تیرۆریستی و عەرەبە شۆڤێنییەکان کە شەوانە هەڕەشەنامە فڕێدەدەنە ماڵەکانیانەوە، هەروەها بە پێی سەرژمێرێکی لقی ١٤ی پارتی دیموکراتی کوردستان ٣٦٠ کورد لە ماوەی ئەمسااڵدا لە نێو شاری موسڵدا لە ئەنجامی هێرشی تیرۆریستی و شۆڤێنییەوە گیانیان لەدەستداوە. ■■■

وەزیری دەرەوەی تورکیا، بە PKK هەڕەشە لە باشووری کوردستان دەکات



وەزیری کاروباری دەرەوەی تورکیا عەبدوللا گول بە جۆرێک هەڕەشەی لە باشووری کوردستان کرد کە "پەکەکە" بیتە بڤەڵای سەری گرووپە کوردییەکان. عەبدوللا گول لە ٢٠٠٥/١١/٢دا، لە پریسکۆنفرانسێکدا گوتی: پەکەکە سبەینێ زیانی گەورە لە سەرانی کورد دەدات و ئە نەک هەر بەڵای سەری تورکیایە بەڵکو دەبێتە بەڵای سەری گرووپە کوردییەکانیش. لە پریسکۆنفرانسەکەیدا، گول لەسەر مژاری جۆراوجۆر ڕاوەستا و بیر وڕای حکومەتەی ڕوون کردەوە و، وەڵامی ڕۆژنامەوانانی دایەوە. لە وەڵامێکی سویکاستا هەریری، داوای لە سوریا کرد کە هاوکاری دادوەرە ئەڵمانییەکە بکات، کاتێکیش دواوای لێکرا کە ئاخۆ وتەکانی ئەحمەدی نەژاد دژ بە ئیسرائیل پرۆتستۆ دەکات، گول گوتی:"هەوڵ مەدەن ڕێ نیشانی ئێمە بدەن." گول لە دریژەی قسەکانیدا ئاماژەی بۆ سەردانەکەی بارزانی بۆ ئەمریکا کرد و گوتی:"مەسعود بارزانی وەک سەرۆکی بەرێمی کوردستان لەلایەن سەرۆکی ئەمریکاوە، پێشوازی لێ کرا." هەروەها ئیدعای ئەوەشی کرد کە بۆش پەیامێکی تورکیای سەبارەت بە هاوکاریکردن دژی پەکەکەی گەیاندووەتە بارزانی. گول لە وتەیەکی دیکەیدا گوتی:"تورک لەگەڵ کوردی باکووری عێراق، بران و تورک بایەخێکی زۆر بەو پەرلەمانە هەڵبژێردراوە دەدا، لە دریژەیدا گوتی: هەندێک دەیانەوێت نێوانی تورک و کورد تێک بدەن لەوانەش ڕێکخراوی تیرۆریستی پەکەکەیە. ئەم ڕێکخستنە ئەمڕۆ زیان بە تورکیا و سبەی بە باکووری عێراق دەگەیەنێت، بۆیە دەبێت ئەوانیش بایەخ بە شەڕی دژە تیرۆر بدەن، تیرۆر هەر بەڵای سەری ئێمە نییە و هی ئەوانیشە، لە بارەی گۆڕینی ڕژێمی سوری، گول گوتی؛ سوریە بە ڕەوشێکی ناسکدا تێپەڕ دەبێت، بەرەوپێشچوونی ئەو ڕەوشە بۆ ئێمە گرنگە. ■■■

ژمارەی تەلەفۆنەکانی هەولێر دەگۆڕدرێن

میدیا- هەولێر- ماوەی دوو هەفتەیە ژمارەکانی هێڵی تەلەفۆنی نۆرماڵ لە سەر تۆڕی بگۆڕی ناوەندی هەولێر بەبێ ئاگادارکردنەوەی بەشداربووان گۆڕدراوە و بەڕێوەبەری پۆستە و گەیاندنی هەولێر بە "میدیا"ی ڕاگەیاند کە ئەو گۆڕانە بە شێوەیەکی کاتییە.

ئەندازیار شەهاب عەزیز خدر بەڕێوەبەری پۆستە و گەیاندنی هەولێر لە پەیوەندییەکیدا لەگەڵ(میدیا)دا لە بارەی پرسی گۆڕانی ژمارەکان گوتی:"بە هۆی بگۆڕە کۆنەکەی ساری هەولێر بە بگۆڕێکی نوێی دیجیتاڵ ئەم مەسەلەیە دروست بووە". بەڕێوەبەری پۆستە و گەیاندن لە درێژەی ایدوانەکەیدا، ڕوونی کردەوە کە ئەو بگۆڕە نوێیە ٥٠ هەزار هێڵ لەخۆ دەگرێت، بەڵام لە سەرەتادا، "٢١" هەزار هێڵ بەکاردێت لە جیاتی بگۆڕە کۆنەکە کە حەڤدەهەزار هێڵ بوو، ئەندازیار شەهاب ئەوەشی گوت ئێستا تیمەکانی تۆڕی تەلەفۆن دەستیان بە گۆڕینی هێڵەکان کردووە و لە بارەی چۆنییەتی گۆڕانەکەش ڕایگەیاند کە ئەو هێلانەی بە ژمارە ٢٢٣دەستیانێی دەکرد، دەبنە "٢٢١" و ئەوانەی بە "٢٢٢" دەستیانێی دەکرد، دەبنە "٢٢٠"، بەڕێوەبەری پۆستە و گەیاندنی هەولێر گوتی:ئەو گۆڕانە بە شێوەیەکی کاتییە و هەرکاتێ بگۆڕە نوێیەکە دەستی بە کار کرد، ژمارەی نوێ بە هاوڵاتیان ڕادەگەیەنین. ■■■

PEYAMÎ kurd

Jimare 61 | Sallî 2 | 4.11.2005

Rojnameyekî heftaney gistiye

Cêgirî serokî sendîkay rojnamenûsanî Kurdistan:

Ême sendîkayekî serbexoyn



Laparey 6

Biryarî 1636 .. seretay tunêle dirêjekey Suriya!

Laparey 3

Qezaqekanî nawçey Kuban şerî çî deken?

Laparey 3

Bahozî goranî nawçeke helîkird



Laparey 2

قەزاقەکانی ناوچەی کوبان شەڕی چی دەکەن؟

لاپەڕەی ٣

لەبەرنامەیەکی سەتەلایتی کوردستاندا دووپات لەسەر دواکەوتویی ئاستی ژیانی گەنج لە کوردستان کرا و حکومەتیشی لێ بەرپرسیار کرا

لاپەڕەی ٤

ڤینۆس فایەق

ڕەهەندەکانی بێبەشکردنی کارمەندەکانی هەرێمی کوردستان لە جەژنانەکەی جەعفەری

لاپەڕەی ٤

لە ئەرشیفی هونەرمەندانی کوردستانەوە..

ناشتی گەرمیانی

ئەرکی وەزارەتی ڕۆشنبیری هەرێمی کوردستانە .. بە ئەرشیفکردن..

لاپەڕەی ٧

کورتەیەک لە ژیان و تێکۆشانی ٣ محەمەد شاپەسەندی

کە پێشەوایان ئیعدامکرد، من لە چوارچرا دوو سەعاتان ڕاوەستام، بۆ ئەوەی ئەو دیمەنەم قەت لەبیر نەچێتەوە!

لاپەڕەی ٨

www.peyamikurd.org